Rojeke reştarî ye bo min, rojeke ku tê de rojê ji hilatê şerm kir. Nola zarokekî sêwî li ber xeyalên xapînok xwe pal dabe, wisa li ber xatirxwestina te ya bêveger ketim. Belê te bi bedewiya giyanê xwe tevahî mest kiribûn. Tenê navê te gotin û piştre jî bi gotina xweda te bi bihuşta xwe şad bike, min dixeniqîne.

Di welatê agir û rojê de, yan tu yê hêviyên xwe bifetisînî û bê rûmet bijî yan jî tu yê mîna Bêrîvana xemrevîn bibî gulek ji gulên bihuştê.

# Xemrevîna min

**Di welatê agir û rojê de, yan tu yê hêviyên xwe bifetisînî û bê rûmet bijî yan jî tu yê mîna Bêrîvana xemrevîn bibî gulek ji gulên bihuştê.**



Mufîde Koto*



Ke kenok xwe kiriye mêvana gundê me. Dem bihar e. Hewa guhêrbar e. Carinan bohozeke har û dîn xwe li me dialîne, carinan jî taveke bişid rûyên me dişewitîne. Îro jî di bin rokê de hêviyên me govendê digirin.

Bêrîvan jî mîna rojên biharê, xwediya hişekî tevlihev e. Carinan

*Di sala 1995'an de li gundê Sêmala /Efrînê hatiye dunyayê. mamostetiya zimanê kurdî di dibistanên amadehî de. Helbestan dinivîse ji 2014'an û vir ve, dîwaneke wê a helbestan heye bi navê "Henasên Nîvçemayî" ye.

her kesê/a ku bi YPG/YPJ re kar dikir bidî me bi soz ez ê alîkariya te bikim, te ji vir zû rizgar bikim.

- Ne sezayî min e ku ez xwe erzan bikim û sîxoriyê li miletê xwe bikim. Ez li ber kesên xwedênenasan nagerim. Dema bavê min nav li min kir "Arîn" wî nizanî ku Arîn Mîrkan dê bi lehengiya xwe cîhanê bihejîne û bibe sembola azadiyê. Ya rast min berê ji navê xwe hez nedikir, lê niha ez bi vî navî serbilind im. Belê.. Navê min Arîn e. Navê min barekî giran li min bar dike û berpirsyariya pir tiştan ji min daxwaz dike. Bila tu zanibî ez tucarî serê xwe li ber teroristan natewînim.

Ebo Ilyas bi gavên aram li dor Arînê geriya, li bedena wê û li xwîna ku bi ser de diherikiya meyizand. Destê xwe di ser piyê wê yê nîvtazî re bir, Arînê bi hêrs ew veçengand.

- Ma ne guneh e ku ev canê ferişteyî ewqas birîn bibe?!

- Min xema birînên gewdê xwe nexwariye, ew ê bi demê re veterisin. Lê di dilê me kurdan de, Efrîn kula herî mezin û birîna xwînzê ye! Ew xema min a herî mezin e.

Hîn Sewlî û hevjînê xwe mijara zewaca Arînê gengeşe dikin, Arîn ber bi wan ve hat. Bi dengekî vîndar ji bavê xwe pirs kir:

- Bavo! Te ji berê de digot xak rûmeta mirov e. Îro destdirêjî li 366 gundên Efrînê tê kirin. Ne mirov ne jî dar û ber ji destdirêjiya tarîperestan nafilitin. Tu dixwazî min bi

pismamê min ê dîn re bizewicînî ku xwe bisitirînî. De ka ji min re bibêje xaka me ya ku ewqas destdirêjî lê tên kirin tê çawa bisitirînî?

Bavê Arînê keserek kûr kişand. Bi dijwarî êşa dilê xwe daqurtand. Arînê axaftina xwe berdewam kir:

- Ez ji nav lepên wan ên gemar xelas bûm, lê hîn bi hezaran jin, keçik, zarok û mêr di zindanên dagirkeran de hene. Jiyana wan dojeh bi xwe ye. Zordariya ku rojane dibînin mirov nikane bawer bike.

Bavo! Min hemû rengên êşkenceyan dîtin. Carekê min hewldana xwekuştinê jî kir. Dengê qêrîna jin û mêran dîwarên zindanê qul dikirin. Carekê sê çete bi zincîreke hesinî bi ser zarokekî dehsalî ketin. Zincîr li ku diket ne xema wan bû. Ew jê negerîn heya zarok di bin qamçiyên wan de pirpitî û jiyana xwe ji dest da. Dîmenek gelek bi êş bû heya ez xweş im ew ê ji bîra min neçe.

Bavê mino! Tiştê ku hûn pê diramin qet ne di bîr û baweriya min de ne. Roja ku destdirêjî li min û hevalên min hate kirin min bi xwîna pakrewanan sond xwar ku ez ê tola xwe ji wan kuçikbavan hilînim. Xuyaye îro dem hat ku soza xwe bi cih bînim.

- Ev çi gotin e keçê! Ma kesên sivîl wek me dê çawa tola xwe ji dewleta Osmaniyan hilînin.

- Ez ê tev li şoreşvanên kurd kar bikim. Ez ê xwîna xwe bo welatê xwe birjînim. Yan mirin yan jî jiyaneke birûmet.

Piştî hefteyekê, Arînê cilên YPJê li xwe kiribûn, keziyên xwe bi aliyekî de berdabûn, bi paçekî pemboyî û zêtê tivinga xwe paqij dikir û bi heval Darîn re digot: Efrîn li benda me ye. Em ê vegerin.. em ê vegerin.

derbasî hundir kir. Arînê yekser xwe avêt ser nivînê, di ber simfoniya girî re xwe di hembêza dayîkê de komî hev kir, weke mirovekî ku deh salan xew nekiribe, hertavilê bi xew ve çû.

Piştî serbestberdana Arînê nîvê qisawetên dê û bavê wê bi avê de çûn, lê qisaweteke din xew ji çavên wan direvand. Arîn ji zindanê rizgar bû, lê hiş û rewanê wê hîn dîlgirtî bûn. Derûniya wê pir kambax bûbû, gelek caran di xew de diqîriya weke dînan xwe di qozîkekê de komî hev dikir û çavên wê tim li derî bûn. Pey re dema li hişê xwe vedigerî ew hildigerî ser banê xanî, awirên xwe li gundên Çiyayê Kurmênc diçêrandin û keser dikişandin. Demjimêrekê Arîn li wir rûdinişt, bi ser xwe de diponijî, ramanek di serê wê de digeriya, kesekî nizanî ew çi ye.

Li sibeheke Înê bavê Arînê li ser kursiyeke textî li hewşê rûniştibû. Cixare bi cixarê vêdixist. Ramanên rengereng di hişê wî de di nakokiyê de bûn. Barekî giran li ser milên wî bû. Li aliyê din jî Sewlî li ser erdê rûniştibû, berê xwe dabû rojhilat, dest danîbûn ser sîngên xwe û nimêj dikir. Hevokên wê ne bi zimanê pêximber ne jî bi kurdî bûn. Tenê wê û Xwedayê wê ji lave û peyvên wê fêm dikirin. Di ber xwendina ayetên Quranê re rondikên wê diherikîn.

Piştî Sewliyê nimêja xwe bi dawî kir, ew li rex hevjînê xwe rûnişt. Ziq li çavên wî nêrî jê pirs kir: Tu bi çi diramî. Xuyaye gotinek li ser zimanê te heye.

- Jinê! Tiştê ku hatiye serê me ne hindik e. Zanim tu şaşîtiyên Arînê tune ne, lê tu zanî civak li me nayê rehmê. Dema jinek bi dest hovan dikeve, yekser destdirêjiya cinsî li bîra civakê tê. Lewre piştî vê bobelatê kesek keça me bo zewacê naxwaze. Keça me sal û nîvekê di bin destê tarîperestan de bû. Ne hewce ye ez bipirsim wan çi bi serê wê anîn ji ber terorîst gemar û bênamûs in. Ji ber wê jî min biryar stand ku ez wê bi biraziyê xwe Miho re bizewicînim. Barê namûsê pir giran e. Divê em xwe bisitirînin.

- Malşewitiyo! Miho remtelê Xwedê ye. Ew nîvdînî ye. Temenê wî çil sal hene û hîn ji sibehê heya êvarê li kolanên gund digere bi zarokan re dilîze.

- Ma ji bilî Miho kî wê razî bibe bi Arînê re bizewice?! Duh min ev mijar bi birayê xwe re gengeşe kir. Wî jî bêdudilî erê kir. Em deyndarê wî ne ku ew ê li namûsa me xwedî derkeve!

Li ber deriyê odê Arînê li wan guhdarî dikir. Gotinên bavê wê weke birûskê li dilê wê ketin. Gerdûn li derdora wê geriya. Hemû êşkenceyên di zindanê de dîtine ji lêdan, şewitandin, bidardekirin û gellek cureyên din li bîra wê hatin.. Lêpirsîna yekem ku çeteyan pê re kirine mîna kurtefîlmekê li pêş çavên wê dubare bû..

- Navê te çi ye?

- Arîn e!

Ebo Ilyas serê xwe xurand di ber xwe de navê wê du caran bilêv kir:

- Arîn.. Arîn.. Navê te ew dêlika Arîn Mîrkan a ku di şer de fetisiye li bîra min tîne. Tu zanî ku ev nav bo me bes e ku em te di zindanê de bitixînin?! Ji ber wê yekê ez dixwazim şîretekê li te bikim. Eger tu li xwe mikûr werî, lîsteya navê

Por li serî hinc bûbû, çav di kortikê de çûbûn, rûyê wê mîna pelên payîzê zer bûbû û şopa birînên kûr li ser rû û bedena wê daxivîn, çîroka hovîtiya Osmaniyan eşkere dikirin.

Dê û bav û herdu birayên wê li dor Arînê civiyan. Dayîkê ji çavên xwe bawer nekir. Sal û nîvek e wê çavên xwe bi dîtina keça xwe kil nedane. Sal û nîvek e dîlgirtina Arînê jiyana wê miçiqandiye, giyanê wê di meşka êşan de keyandiye. Dayik li hember keça xwe rawestî, bi destên lerizî rûyê wê peland. Belê ne xewn bû, Arîn bi xwe li pêş wê sekinî bû.!

Dayîka kezebşewitî bi hemû hêza xwe kire qêrîn, keça xwe bêhn kir, dest û çavên wê maç kirin. Bi girî û şîn Arîna birîndar hembêz kir. Her weha girîyekî bi şewat ji gewriya mêran rizgar bû. Birînên vê malbatê pir giran bûn.

Piştî dagirkirina Efrînê bi çend mehan çeteyên koma El Hemzat-hevalbendên Tirk ên dagirker- êrîşî malê kirin, bi bihaneya têkiliya wê bi YPJê re Arîn dîl girtin. Hingê dayîka wê Sewlî bi mêrantî li pêş wan rawestî. Wê xwe da pêşiya keça nûgihîştî û got: Ez nahêlim hûn keça min bibin. Arîna min tiştekî nebaş nekiriye.

Gotin û hawarên Sewliyê bê sûde bûn. Çeteyekî gopala pîrejinê ji dest girt, bi hêz ew têveda. Pîrejin li dîwêr ket, xwîn bi ser de herikî, mejiyê wê celq bû. Herdu kurên wê li pîrê heyirîn. Çeteyan gef li jin û mêrên beşdar kirin. Yekî tivinga xwe berve wan nîşan kir bi zimanekî tûj got: Yê ku li pêş xwesteka me bisekine dê ji guleya min re bibe armanc.

Çeteyên çekdar Arîn li pêş çavên hemûyan li tirumbêlê siwar kirin û bi cihekî nediyar de birin. Ji wê rojê ve kesekî ti agahî li ser Arînê nebihîstin. Çiqas bavê wê lê geriya kesekî jê re negot ew li ku ye. Kesekî negot ew sax e yan na. Sal û nîvek e malbata Arînê di nav agirekî gur de dijî. Kêlîk bi kîlîk ew di gola êşan de noq dibûn. Berî deh rojan bavê Arînê sê hezar dolar dan çeteyekî ku alîkariya wî bike û Arîna dîlgirtî li malê vegerîne.

Dayîkê bi dengekî bişewat nefret dikirin: Arîna min tu baş î? Keça min wan teresbavan çi bi serê te kirin? Wey Xwedê wan talan bike.. Xwedê koka wan ji zemînê rake.. Xwedê zarokên wan li pêş çavên wan bi çil perçe ke.. Xwedê….

Birayê Arînê destê xwe danî ser devê dayîkê, bi nermî gotê: Dayê bila ji yekê nebe dudu. Ma tu nizanî dîwar bi guh in. Spas ji Xwedê re ku xwîşka min sax e.

- Belê dayê! Ma tu nabînî tenduristiya Arînê gelek xerab e. Divê em wê derbas hinder bikin ku vehese.

Arîn bê deng bû, zimanê wê nedigeriya ku gotinekê bibêje. Tenê lehiya hêstiran ji çavên wê diherikî. Gewdê nazik weke ku di destarekî kevirî de hatibe hêran ji hev ketibû, hestiyên wê di tûrekî çermî de li ber xwe didan, lingan nema karîn wê hilgirin. Birînek li ser rûyê wê hîn teze bû, xwîn jê diherikî. Diranê wê yê pêşiyê şikesti bû lewre lêvên wê mîna yên pîrejinan hatibûn hev. Arîn têra xwe westiya bû…

Dayîkê bi destekî bi gopala xwe girt, bi destê din jî bi piyên Arînê girt

# Verger

**Arînê cilên YPJê li xwe kiribûn, keziyên xwe bi aliyekî de berdabûn, bi paçekî pemboyî û zêtê tivinga xwe paqij dikir û bi heval Darîn re digot: Efrîn li benda me ye.**

Vejîna Kurd*



"Arîn vegerî.. Arîn vegerî.."

Bi vê mizgîniyê du zarokan bang li malbata Arînê kirin. Herkesê di malê de bi lez ji hundir derket rastiya wê nûçeyê vebîne. Li ber deriyê hewşê keçikek bîstsalî mîna pûtan sekinîbû. Keçik tenê çerm û hestî mabû, ji toz û gemarê rengên cilên wê xuya nedibûn.

*Nivîskareke ji bajarê Efrînê ye, di sala 1975an de dayîk bûye, ji peymangeha amadekirina mamostan derçû ye. yek ji damezrînerên komeleya Rewşen Bedirxan a Jinên Kurd a Efrînê ye, her weha berpisyara rojnameya Rewşen bû, heta niha 3 xelat di warê wêjeyê de wergitine. Behemên wê yên çapkirî: Xewnên Elendê (komehelbest, 2016), Hawarine Efrînî (roman, 2018), Pencereyên Êşê (kurteçîrok 2019), Gulistan Pîr Nabin (komehelbest, li 2019), Rûmet (roman 2020).

Dugirê tirba min dikole!

Gewdê wî, ku wek gewdê dêwekî ye, bi himeta xwe ku wek himeta gayekî ye, her qazmeyekî li erda gora min dide, du bostan kûr diçe!

Dema ku Evdo li ba cîranê xwe kar dikir, û ji bo kerpîçan erd dikola, qazimeyê wî du tiliyan bi erdê de nediçû!

Lê binaxkirina min lezgîn e!…Û ya rastî, ne ew bi tenê bi binaxkirina min lazgîn e. Lê belê, bi dehan kesiê dî, ku tîrêja rojê di vê havînê de patik li wan kelandiye, êdî li bendî vegera ber siheke hînik in.

-Hêt ne rast e Evdo, aliyê bakur hinkî di hundir de ye!

Baş e Evdo bira, her tu libinaxkirina min bilez ketî yî!

Êdî bo Xwedê, hinkî gora min fireh bik!…Hinkî cih ji liva gewdê min re berde!

Evdo, bi kûrkirna gorina min qayil nebû, heya dest bi bergornê jî kir!

Ev dêw, ku hewqas qazimeyê wî kûr di erdê de diçû, ji bextê min ê reş, ku dest bibergorinê kir, êdî wilo teng teng wek kewara dayika xwe da kolan, ku hîn ew sax, bêhna wî tê de diçikiya! Lê nexeme Evdo, êdî bêyî bêhin jî, mirin tê derbas kirin!

Mirina min û jiyana Evdo, gelo çi cudebûn di navbera wan de heye?...Ew gorkolanker û ez nivîskarekî kurd!

Ya rast, ku mirov vê pirsê ji miriyan nake!

Termê min, çend xortan hêdî hêdî û bi qedir daqulî tirbê kirin, û bibergorinê ve tehvandin, êdî bi yezdan ku hîn ez sax, ev qedir û rûmet ji min re bigirta, ez nedimirim!

Gewdê min, bi bergorinê ve birin û li ser rexekî danîm, çend qehfikên pehin di bin serê min de rast kirin!

De bi Xwedan, hîn ez sax, çend qehfikên wisa pehin di bin serê min rakirba, qet êş bi serê min nediket!

Ez bi tenê hiştim, piştî kesên alîkar bibanî ve hilkişiyan jor!….Êdî her kesekî, ji dehma xwe ve kulmek ax avête ser termê min!

Bi rastî, hin ji wan, hîn ez sax ev bû daxwaza wan, aniha jî serbest in û bêminet in!

Melayê Nissran, di xwendina terqêniya xwe de, ket dabaşa Ezrayîl û Melayîketan de!...Lê bi rastî, min Ezrayîl û Melayîket li ser banê tirba xwe re didîtin!

Hin ji wan Ezrayîl in û hin jî Melayîket, lê kî ji wan kî ye êdî ev ne derdê min e!

Taqên tirbê, pir sar û cemîdî ne, Evdo malxirab, te pir kûr kola, ku êdî qet bêhna hilma biharê nama dikim!… Lê ne xem e Evdo, wê roja te jî bê.

Kêl, di ber serê min de rakir û bi xetek qalind ev li ser hatibû nivîsandin (Nivîskarê kurd ê nemir(!

Belê ku ez mirim, nû têgihiştin ku niviskarekî nemir im.

Bila êdî duniya ji Evdo re be!… Tirbkolanker.

Lê mixabin, ku ne Evdo bi tena xwe gorkolanker e, pir in

gorkolanker, lê hin qazmeyên wan pênûs in!

# KÊL

**Kêl, di ber serê min de rakir û bi xetek qalind ev li ser hatibû nivîsandin (Nivîskarê kurd ê nemir!)..**



**Abbas Abbas***



Ewqas mirov li ser termê min civiyane, ku wilo di roja şahiya min de, ne civiya bûn!

Şînê, hin bigirî û hin bi çend ronakên hûr û hin jî, bo xaka li ser gora min bi piyên xwe bidin dewsandin!

Ev tev jî, ji min re ne wek sextekariya karê Evdo dikir! Evdo li goristana gundê

*Nivîskar e, sala 1946an de li gundê Nissran yê herêma Qamişlo ji dayîk bûye, du salan li Zanîngeha Şamê beşa Felsefe xwendiye, paşê koçeberî Almanyayê bûye. Çend pirtûkên wî (Kurteçîrok, şano, roman) bi zimanên Kurdî û Erebî hatine çapkirin.

Silo got:

-Belê, ez im Bilo.

Bilo got:

-Silo tu gelekî xweşik bûyî û bejna te dirêj bûye tu weke keleşêran xuya dike.

- Wisa min te winda kir.

- ez nizam çawa bûm ji dengê lawiran me hevdu winda kir.

Lê Silo çîroka xwe ji destpêkê heya dawiyê ji Bilo re got:

-Birayê min ji berê û paşê de dibêjin: Hevalê rêkê kurê dêkê û ez jî hatim van zêran bi te re parve bikim.

Bilo got:

-Na ez razî nebim, xwedê tu dîtî û da te, ez ê herim ji nû ve di wê şopê kevim, ez jî rastî daweta cinan werim û wek te dakevim nava govend û dîlana wan û weke te kirî ez ê jî bikim û wê biqasî zêrên te bidin min.

Silo pir li ber Bilo gerî ku neçe wir. Neçe ez ê para xwe jî bidim te.

Bilo serhişk e, razî nebû bi ya xwe kir û ji nû ve berê xwe da wî çiyayî.

Piştî hefteyekê digihêje wî cihî, dengê dahol û zirnê tê guhê wî, xwe li wî dengî digre û diçe. Dîsa dawet dibe û strana xwe ya ji peyvekê dibêjin:

-Sêşem sêşem sêşem e .

Bilo baş li wan guhdar dike û ji xwe re dibêje:

-Îro duşem e çima ev dibêjin Sêşem e, niha ez ê xwe bidim nava govenda wan û ez ê jî ya rast bibêjim: Duşem duşem duşem e.

De Bilo di aliyekî re xwe di taldê zinarekî re xwe berda nava wan û ket dîlanê, ew jî weke wan di cih de hikdipeke lê ew bi giştî dibêjim: Sêşem sêşem sêşem e.

Lê Bilo bi tena xwe dibêje:

-Duşem duşem duşem e.

Tevliheviyek di nava ahenga wan de derket û dîlan li nav hev ket, qêrîn bi padîşahê cinan ket rûyê xwe tirş kir û çav sor bûn û got:

-Kî ye ev bi nava me ketîye? Daweta me bi giştî li ber zikê hev xist.

Wî got ez nizanim û wî got ez nizanim di encamê de kesekî ew nas nekir.

Ew girtin anîn pêşiya padîşah, padîşah got:

-Tu kî yî? Û tu ji ku ve bi nav me ketî.

Bilo jê re got:

-Padîşahê min ez mirovekî rêwî me, dengê dahol û zirnê hat guhê min û ez hatim û li xweşiya min hat, ez vegeriyam min li daweta we temaşe kir ji geşbûna dilê xwe ez tevlî we bûm.

Padîşah got:

-Em bi giştî dibêjin: Sêşem û çima tu bi tena xwe dibêjî: Duşem?

Bilo got:

-Ji ber ku îro duşem e ne sêşem e.

Padîşah:

-Yanê em bi giştî derewan dikin a te bi tenê rast e?

Bilo bê bersiv ma, wan li Bilo dan ew xiş kirin, tu derên wî sax nehêştin bi giştî şikandin, ew xûzbûna Silo dan ser pişta Bilo û ew weke Silo bû û qewitandin.

Di hin deman de rastî dibe bela serê mirovan û ezezî çi tîne serê mirovan.

kiribûn. Lewra jî soz dabû xwe, ger Gulfiroş bi destgirtî bibe dê diyarî wê bike. Lê neçar dibe li roja berî cejna Çarşema sor cotê guharan bifroşe. Ji herdu keçên xwe Gulfiroş û Nêrgizê re ciline nû dikire û vedigera kampa Serdemê.

-Ev ne tu jiyan e, ma rewşa me dê tim wisa be, de ka em serê xwe rakin bi welatekî de biçin, em ê bi pey qedera xwe kevin û rastî karekî werin, em ê demekê biborînin çend qurişan bi xwe re bînin.

Bi ber bayê hevdu ketin ji gundê xwe derketin, hefteyekê bi rê de çûn bi çiyayekî asê ketin, dunya êvar e şev tarî ye, ji dengê ajalan tirs dikeve dilê wan hevdu winda dikin.

Silo tim li Bilo digere, lê nabîne bi nav daristanê de diçe ji dûr de dengê dahol û zirnê tê guhê wî û ber ve wî dengî diçe di taltê zinar û keleman de xwe diqelizîne û li wê meydanê dinêre daweta cinan e, dahol û zirne lêdikevin, dîlan digere padîşahê wan rûniştiye di ber dîlanê re stranekê dibêjin, stran ji peyvekê ye stran wisa ye sêşem sêşem sêşem e.

Ev stran û gevend li xweşiya Silo hat, Silo jî di quncekî re derfet dît xwe berda nava dîlanê, ew jî weke wan di cih de hildipeke xwe radike û li erdê dixe û dibêje: Sêşem sêşem sêşem e

Padîşahê cinan çav li wî dikeve ji nişka ve qîr dike, di cih de her kes radiweste û ew der ker dibe.

Padîşah dibêje:

-Ev kî ye bi nav me ketiye?

-Her kesek dibêje ku em vî nas nakin.

Bi çeplên Silo digrin dibin pêşiya padîşah, padîşah dibêje:

-Tu kî yî û tu ji ku ve bi vir ketiye?

Silo dibêje:

-Ezbenî ez mirovekî rêwî me, min dengê dahol û zirneyê bihîst û wî dengî ez ber bi xwe ve kişandim û ez hatim, min li govenda we meyze kir dilê min geş bû, ez gelekî bi we re şad bûm û ez tevlî we bûm.

Padîşah got:

-Kurê min ji vir û pê ve tu yekî ji me yî, lê çima pişta te xûz e?

Silo dibêje:

-Ji xwedê de ez wisa me.

Padîşah dibêje:

-Were li pêş min rûne pişta xwe daxîne.

Silo xwe xwar dike, padişahê cinan bi hêzeke mezin û qêrînî vêdikeve lepê xwe li xûzbûna wî dixe û xûzbûnê ji ser pişta wî radike

Silo radibe ser xwe bejna wî weke tayê qamûşê rast dibe û pencek zêr dide Silo û dibêje:

-Ev jî para te ye û kengê bixwazî biçî û bê tu yekî ji me yî.

Silo xatir ji wan dixwaze û vedigere warê xwe, piştî demekê gihîşt mal û xwediyên xwe, lê xwediyên wî matmayî man ji ber ku teşeyê wî bi giştî hatiye guhartin û ew xûzbûna pişta wî jî çûye, weke keleşêran xwe venaye li hevalê xwe Bilo pirsî û Bilo bi cih kir çû cem Bilo, lê Bilo jî destpêkê ew nas nekir, Bilo tim li wî nêrî û got:

-Ez ne şaş bim tu Silo yî?

■ Ji kampa Serdemê - ku koçberên herêma Efrînê dijîn



Gulfiroş: Ez gulan difroşim, ne navê xwe!

Xebat: Ez ê van çar gulan bikirim delalê.

Gulfiroş dibêje: Navê min Gulfiroş e, ne Delal e.

Herçar gulan ji ser sendoqê radike, dide dest Xebêt û dibêje: Bila ev çar gulan jî, ji bo birayê we yê birîndar bin. Hêvîdar im birîna wî zû çê bibe û vegere nav we. Xebat hewl dide pereyan pêde, lê Gulfiroş dimeşe û diçe kampê.

Berî bigihe konê xwe, xwîşka wê Nêrgiz li pêş deriyê kon bû. Dema ku Gulfiroşê dibîne, bangî dayîka xwe dike û dibêje: Dayê, dayê, lê dayê! Gulfiroşê hemû gul firotine. Em ê niha biçin ciline xweşik ji xwe re bikirin.

Meyane ji kon derdikeve û ji keça xwe Gulfiroşê re dibêje: Xuya ye te hemû gul firotine. Lê çima aliyekî fîstanê te bi herî ye? Xem nîne, ez ê niha ji te re bişom.

Gulfiroş çend kêlîkan bêdeng dimîne û piştre çîroka gulan ji dayîka xwe re dibêje. Meyane wê hemêz dike, dêmên wê maç dike û dibêje: Te îro karekî pir û pir baş kiriye Gulfiroşa min. Ez bi te serbilind û şanaz im. Soz û sond bi Melekî Tawûs û Êzîdxanê, ez ê ciline nû ji te û Nêrgizê re bikirim. Li roja Çarşema Sor ez ê xwerinine xweş ji we re çê bikim.

Tenê cotek guharên Meyanê yên zêrî hebûn. Ew cotê guharan jî, hevjînê wê li cejneke Çarşema Sor diyarî wê

rê da ku wan bifroşe. Berî ku ji kampê derkeve, lingê wê yê rastê vedilîze û li ser kêleka xwe dikeve erdê. Aliyek ji fîstanê wê yê kevnar bi herî dibe. Lê nahêle herdu gurzên gulan bigihin erdê û bi herî bibin. Hêza xwe dike û bi heman coş û meraqê ji kampê derdikeve. Li pêş deriyê kampê sendoqeke textî ya kevnar dibîne. Sendoqê radike û diçe li tenişt rêya giştî ya çûn û hatinê ku di nêzîkî kampê re derbas dibe datîne. Herdu gurzên gulan datîne ser sendoqê û hêviyên xwe yên zaroktiyê di firotana wan gulan de dibîne.

Royê tîrêjên xwe di nav ewrên tenik re berdidan ser dêmên erdê. Carina jî baraneke hûr û xunavî ji memikên wan ewrên tenik dibarî. Li tenişt rê Gulfiroşê nihrînên xwe resteçep digerîne. Eger tirumbêlek dihat, gulek ji ser sendoqa textî radikir û destên xwe berve wê dirêj dikirin. Lê piraniya tirumbêlan ranediwestîn û hin jî qaserî bi lez bûn, bayê wan bi porê Gulfiroşê dilîst û hinc dikir.

Du jin ji kampê derdikevin û tên ba Gulfiroşê. Her yek ji wan sê gulan sor, spî û zer dikirin. Diçin li aliyê din ê rê disekinin. Gulfiroş ji xwe dipirse: Gelo ji bo çi van herdu jinan gul kirîn? Bi lez diçe ba wan dipirse: Ma hûn dayîkên pakrewanan in?!

- Belê. Em ê biçin goristana pakrewanan a li gundê Ehrezê.

Gulfiroş bi lez vedigere sê gulan ji ser sendoqê tîne û dibêje: Van gulan jî dînin ser gora pakrewanekî bênav. Piştre pereyên ku herdu jinan pê gul kirîbûn, li wan vedigerîne û dibêje: Biborînin, ji bo gorên pakrewanan ez mafê gulan nastînim. Herdu jin dikin û nakin ku pereyan bibe, lê Gulfiroş razî nabe.

Li wê sibeha Çarşemê, bêtirî deh malbatên ku keç û xortên wan şehîd bûne, ji kampê dihatin ser rê da ku biçin goristana pakrewanan. Gulfiroşê gul bê pere didan wan. Piştî du demjimêr derbas dibin, tenê çar gul li ser sendoqa textî dimînin.

Ji destpêka ku Gulfiroşê li tenişt rê gul danîne ser sendoqa textî ya kevnar û hewl dida wan bifroşe, li aliyê din ê rê teksiyeke spî û camreş rawestî bû. Kesê di teksiyê de cama derî daxistibû û hemû şivlivên Gulfiroşê dibîne, her weha axaftinên wê bi malbatên pakrewanan re dibihîze. Ji xwe re dibêje: Ev keça porzer xuya ye duzdeh-sÊzîdehsalî ye. Cilên wê kevnar in. Diyar e ku rewşa malbata wê ne baş e. Wê gul anîn li tenişt rê danîn da ku bifroşe. Lê tev bêpere dane malbatên pakrewanan. Ya baş ew e ku ez biçin wan çar gulan jê bikirim, bila destvala venegere konê xwe. Dema ku ji teksiyê peya dibe, jinek ji kampê tê û jê re dibêje: Bira Xebat! Bijîşk dê bihêlin em derbasî beşê birîndaran bibin û birayê xwe bibînin?

- Em ê hewl bidin wî bibînin. Ji duh ve rewşa wî baş e. Bila meta me Nazo jî were, em ê biçin.

Gulfiroş axaftina wan dibihîze. Xebat diçe ba wê û jê dipirse: Tu van gulan nafroşî min?

Gulfiroş: Belê xalo, çima na?!

Xebat: Navê te çi ye?

de Meyanê bi daxwezên Gulfiroşê diponije û ji xwe re dibêje: Gelo ez ê çawa karibim ji van herdu keçên xwe re ciline nû bikirim? Ma gunehê zarokan çi ye ku bi zaroktiya xwe şad nebin?! Bêyî ku hestiyar bibe, du rondik ji çavan diherikin û dêman gerim dikin.

Gulfiroş betaniyê bi aliyekî ve têve dide û dibêje: Li danê sibehê ez ê hin gulan ji gulistana li dor konê me berhev bikim û bibim li ser riya ku di nêzîkî kampê re derbas dibe bifroşim.

Meyane jê dipirse: Çima?

Gulfiroş: Da ku bi wan pereyan du fîstanên xweşik û du berbiskan ji xwe û Nêrgizê re bikirim. Tu dizanî çend gul di gulistana me de bişkivîne dayê?!

Meyane: Na. Ma qey min jimartine?!

Gulfiroş: Ez dizanim. Berî ku ro biçe ava min jimartin.

Meyane: Çend gul in keça min?!

Gulfiroş: Gulên sor pêncî û heyşt in. Gulên Spî bîst û yek in û yên zer sÊzîdeh in.

Meyane: Wey, wey Gulfiroşa min, te gupik jî nejimartine?!

Gulfiroş: Belê dayê, min ew jî jimartin. Sêsed û şêst û şeş gupik in.

Meyane seyr dimîne û di bêdengiya xwe de dibêje: Ev çi hejmar in Gulfiroşê gotin! Pêncî û heyşt rojan keç û xortên Efrînê ligel şervanên azadiyê li hember dewleta Turk a faşist û çeteyên wê li ber xwe dan. Hejmara bîst û yekê, cejna Newrozê nîşan dide. Her weha nîşana bîst û yek tîrêjên roya li ser alaya rengîn e. Hejmar sÊzîdeh jî, salên temenê Gulfiroşê nîşan dide. Vêca hejmara gupikan jî, ya gundên Çiyayê Kurmênc e!

Gulfiroş û Nêrgizê hin hêviyên xwe yên zaroktiyê hemêz dikin û hêdî hêdî derbasî jiyana xewê dibin. Lê xew nakeve çavên dayîka wan Meyanê. Hin lavêjan ji Qewlê Êvarê dike:

**Ey Xweda, bidî bona xwetirê mîrê rohilat û rojava**

**Bidî xwetirê dotê, dayê û çel eynil beyzayê**

**Ey Xweda! Me û sinetxanê xelas bikî ji qeda û belayê**

**Ey Xweda! Bidî xwetirê erş û kursî, ga û masî**

**Ey Xweda! Tu li rewşa me û sinetxanê bipirsî**

**Ey Xweda! Li bangîna me û sinetxanê werî hemû deman**

**Ey Xweda! Li pêş me û sitexanê vekî deriyekî xêrê**

**Ey xweda! Bi qedrê kasê kî**

**Bi qedrê durê kî**

**Bi qedrê Îxtiyarê Mixfî sira binê deryayê kî**

**Bi nefesa heq, sira Siltan Êzîd kî**

**Bi hêvî û mehdere kî, li ber me û sinetxanê li ba xwe ciyekî**

**Ey Xweda! Li pêş me vekî deriyekî xêrê.**

Li danê sibehê, berî ku tîrêjên royê ramûsanên xwe diyarî dêmên xwezayê bikin, Gulfiroş ji xewê hişyar dibe û du gurz ji gulên sor, spî û zer berhev dike. Bi coş û meraq di nav konan re diçe ser

keçên xwe Gulfiroş a sÊzîdehsalî û Nêrgiz a dehsalî li dawiya kampê, di konekî rengşîn de roj û şevên wan pir bi dijwarî û perîşanî derbas dibin. Ji ber ku konê wan tenêcih e, berî du salan li hawîrdora wî nêrgiz û gul çandibûn. Her ku li danê sibehê ji kon derdikevin, çend kêlîkan li wan gul û nêrgizan dinihêrin û mala xwe ya li gundê Qestela Eliyê Cindo li bîra xwe tînin. Carina rondikên Meyanê mîna yên sêwiyan bi ser dêmên gulî de diherikîn. Piştre berê xwe dida royê û ji Qewlê Sibehê hin lavêj dikirin:

Sibeh e ro zeriqî

Nûr bi nûrê şifiqî

Melek Şêşem li ber tifiqî

Sibeh ji te xaliq î

Sibe ye rohilat e

Ey Xweda! Me yek sidiq, heya dîn û îman ji te divê ye.

Li sibehên sayî yên bêmij û bêewir, Meyane nihrînên xwe ber bi aliyê bakur de difirîne û li pozê çiyayê Parsê radiwestîne. Piştre keça xwe Nêrgizê radike, tiliya xwe berve çiyayê Parsê dirêj dike û jê re dibêje: Tu pozê wî çiyayî dibînî? Gundê me Qestela Eliyê Cindo li wir e. Her carê ku ji keça xwe re wisa dibêje, Nêrgiz jê dipirse: Çima em naçin gundê xwe dayê?!

Meyane kezeba xwe ji bayê kesereke bêdeng tijî dike, piştre bi şewat vala dike û dibêje: Em ê vegerin kaça min. Em ê vegerin gund û mala xwe.

Li şeva Çarşema yekê ji meha Avrêlê, bayekî sar bi dawa konên penagehê dilîst. Hin dilopên baranê mîna rondikên sêwiyan ji ewrên tenik dibarîn û carina jenîna birûskan hindurê konan ronî dikir. Li wê şevê, Gulfiroş ji dayîka xwe dipirse: Hîn çend roj ji cejna Çarşema Sor re mane?

Bi wê pirsa keça xwe Gulfiroşê re, Meyane dikeve nav gulistana bîranînên xwe yên berî dagîrkirina Çiyayê Kurmênc. Li bîra xwe tîne ku çawa sal bi sal, li sibeha cejna Çarşema Sor diçûn çiyayê Parsê û ta danê êvarê li wir diman? Dixwerin, vedixwerin û govend digerandin. Çawa diketin qubeya mezargehê ya Parse Xatûnê û lavêj dikirin da ku hêviyên wan bibin rastî.

Gulfiroş seyr dimîne ku çima dayîka wê çavên xwe girtin û pirsa wê bêbersiv hişt?! Lewra dîsa pirsa xwe dubare dike. Tavilê Meyane çavên xwe vedike û jê re dibêje: Ne Çarşema sibe, ya piştî wê cejna Çarşema Sor e. Çima tu ewqas bi meraq dipirsî keça min?!

Gulfiroş dibêje: Ji bo tu xwerinine xweş ji me re çêkî. Ciline nû û xweşik ji min û Nêrgizê re bikirî, da ku em pê biçin mala xalê xwe Şemo.

Di sîngê Meyanê de kela girî pêl dide, lê bi vîna dêyîtiyê zora girî dibe. Da ku herdu keçên xwe hîs nebin ku nikare daxwezên wan bi cih bîne. Lê hin rondikan xwe ji çavan vedidizîn û mijang şil dikirin. Ji Gulfiroşê re dibêje: Ta roja Çarşema Sor were, Xwedê heye keça min. Îşev sar e, ya baş ew e ku em têkevin nav nivînên xwe.

Nivînên wan tenê du doşek, çar betanî û sê balgiyên ku rêvebiriya kampê dabûn wan. Di nav nivînê

# Gulfiroş

Merwan Berekat*

**Bila ev çar gulan jî, ji bo birayê we yê birîndar bin. Hêvîdar im birîna wî zû çê bibe û vegere nav we. Xebat hewl dide pereyan pêde, lê Gulfiroş dimeşe û diçe kampê.**



Di her konekî kampê de bêtirî çîrokeke ji êş, xem û janan jiyana biçûk û mezinan dicûtin. ``Em ê kengê vegerin cih û warên xwe?`` Rojane vê pirsê bêtirî carekê li ser zimanê her kesê di kampê de çîk dida, lê bê bersiv dima!

Meyane jineke jinebî ligel herdu

*Wêjevanekî kurd e, di sala 1964 de li navçeya Şêrewa ya girêdayî Herêma Efrînê dayîk bûye. Navbera 1993 - 2018an de weke endamê komîteya sernivîser di kovarên (Xunav, Buhar, Pirs) û rojnameya Newroz de dixebite. Di 2006an de li gel komek xemxwerên zimanê kurdî Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li bajarê Helebê dadimezirînin. Û Navbera 2013-2018an de mihrecana Roja Helbesta Kurdî li Efrînê rêve dibe. di 2014an de li bajarê Efrînê Siya Wêje ava dike. heya niha 31 berhemên wî hatine çapkirin bi herdu zimanên Kurdî û Erebî di warê roman, cîrok, Zargotin, Ziman, dîrok û helbestan de. Gotar û berhemên wî yên siyasî û wêjeyî di gelek rojname, kovar û malperan de hatine weşandin.

yên me dikujin, yên me direvînin, bê sincî û mirovayetî. Wele em ji Ruhayê dan ber xwe heya em gihiştin Mêrdînê, ji heft hezar kes em sêsed kes tenê man, ez û diya xwe jî di nav wan de ne. Lewra bi wî halî roja dîtir em derbasî orteya bajarê Mêrdînê kirin. Bi xwedê piştî em gihan hundirê bajêr, me dît ku carekê qesabên Mêrdînî bi satoreyan hatin û êrîşî me kirin û bû repîna wan bi satoreyan û dest bi kuştina keç û jin û wan zarokên mayîn kirin, li pêş çavên min diya min bi satoreyan kuştin û yekî qesab berê xwe da min û heya jê hat satoreyê xwe bilind kir û anî histûyê min, lê qey hîn nan û avê min li dinyayê hebû, lewra zilamekî efendî bi kumê fînoyê sor hate destê xwe da ber satoriyê wî qesabê xwedênenas, dema satore hate histûye min ne bi xurtî hat, lê dîsa ev birîna dijwar li min kir. Bi xwedê wî zilamê efendî ez tev birînê birim mala xwe û di dews de ez derman kirim û histûyê min bi paçan girêda û şidand û herro herro dihat li birîna min dinêrî û vedikir û ji nû ve derman dikir, heya çend mehekî birîna min bere bere dihat hev û sax dibû. Wî Ciwamêrî ez salekê li mala xwe xwedî kirim û baş li min miqateyî dikir û xanima wî jî ez weke yekî ji zarokên xwe dihejmartim. Lewra ew ciwamêr navê wî Salih Beg bû, Axayê eşîra kurdê Dayşa bû. Bi xwedê piştî salekê mêvanekî wî hat û jê re got: Axa ez dixwazim tu vî lawikê Ermenî bide min, ez ê wî ji xwe re bibim gundê Heremcimo devera Amûdê pê kar marê xwe bikim. Ew zilam jî navê wî Xelefê Elîkê bû ji mezinên eşîra Domiziyan bû. Lewra dema ez ji Salih Beg xwestim bê dilê xanima wî bû, ji ber kêfa wê pir ji min re dihat, lê axir Salih Beg ez bi wî re şandim gundê Heremcimo, dema ez giham gund di dews de ez kirim xulam û şivan û berxvan û çi karê zehmet, dijwar û xerab heba bi min dikirin, û razana min jî tune bû, ez tim di kadînên kayê û axurên dewaran de radizam û kêç û sipiyan jî ez xwaribûm, zikek têr û deh birçî, ew xwarin jî kurtêl bûn û cilên min yên serma zivistanê jî tune bûn. ji ber ez sêwiyekî Ermenî bûm, ne dê, ne bav, ne xuşk, ne bira û ne jî kes û kûs. Dema di havînan de bîrê xwe vedidan şerît li newqa min digerrandin û ez dadihiştim bîrê nav wê çirav û hemîreşk û berateyên genî. Lewra min bi wî halê xerab çend salekî derbas kir heya ez bûm xort, min ji Herimcimo da rê û ez çûm gundê Tilarûs min ji xwe re cotkarî û rêncberiya Silîvan dikir, piştî wê ez hatim gundê Tilcihaş û min li wê derê jî cotkarî dikir û di wî gundî de jî erd nedane min. Min gelek karên dijwar û giran kir heya çend qurûşên min çêbûn û dawiyê ez hatim vî gundê xwe sîha û min ji xwe re sê hezar donim erd kirrî û gund bû li ser navê min (Sîha Hecî Hisênê Bafille). Îro ez Hecî Hisênê Bafille me û misilman im, lê ez bi xwe Ermenî me û navê min Hovanês Teteryan e, ez bi saya wî Begê Kurd ji kuştinê filitîm. Lewra neyarên me herdu gelan yek bûn.

li derdora wî jî ev in: Bellê, Girsor, Nayif, Şêx Emîn û Sîha Hemê Durrê. Carekê di havîna sala 1969'an de ji bo paleyiya cehan çend keç û xortên me ji Hesê Ûso çûn çinîna cehê wan ku bi dasan biçinin, wele ez jî bi wan re çûm paleyîyê. Bi xwedê me ji serê sibehê de dest bi çinîna ceh kir heya danê nîvro yê, lewra dema firavînê em hemî derbasî hundirê hêwanê kirin û malî û kufletên wan ji me re firavîna me anîn û me dest bi xwarina xwe kir, bêhnekê em rûniştin me çaya xwe jî vexwar, bala min ket Hecî Hisên dema rabû ser cilika limêjê ku limêja nîvroyê bike, min dît dewsa birîna çekek tûj di kêleka histûyê wî de ye, lewra ji min re bû kullek ku divê ez nas bikim çima ev birîn li histoyê wî ye!

Hecî Hisên jî zilamekî girs, bi dar û ber bû, çavên wî mezin û navmilên wî pehin û stûr bûn, her wiha zilamekî kêm peyv û gotin bû, lê di tîpên wî û nerîna çavên wî de gelek veşartiyên xemgîniyê hebûn. Lewra di wê hingî de ez zarok bûm, hîn şagirtê seretayî bûm, min şerm dikir ku ez bipirsim ka ev çi birîn e?!.

Lê ji ber ku nasî û mervontiyek wan ji hêla jinan de bi hin meriv û gundiyên me re hebû, min hişt heya carekê ez bi rihetî çîrokê nas bikim. Carekê min kurê wî Silêman dît li mala merovekî xwe li gund û em ketin tarîxa Kurd û Ermeniyan û zilm û zora ku bi ser herdu milletên cîran de hatiye. Me gelek pirs û pirsyar di vê der barê de ji hev kirin, heya min pirsa birîna histûyê bavê wî jê pirsî da ez bi hûrgilî jê bibihîzim. Bi xwedê Silêman li min vegerrand û got: Bi xwedê bavê min ne dixwest ku ji me re pir tiştan bibêje ji ber kul û xeman û tiştên ku dîtine, lê axir carinan jê heger me dajot ser tiştin digotin, pê re kelogirî û dilbixem dibû. Lewra ez dixwazim ji te re bibêjim ji bo ku di dilê te de jî nebe xem. Ji ber ku tu tiştan dinvîsîne ji bo tarîxê. Bi xwedê di wê civatê de Silêman dest pê kir û li ser zimanê bavê xwe tiştin balkêş û xemgîn anîn zimên dema got: Navê bavê min Hovanêsê Teteryan e, ji Bajarê Ruhayê bû, bi meriv û pismam bû, bi dê û bav bû, çar bira û sê xweh bûn. Lewra di sala 1915'an de temenê wî 7 sal bû dema êrîşa qirkirina reş li ser Ermeniyan ji hêla eskerên Osmaniyan de pêk hat. Di wê roja reş de eskerên Osmaniyan dora bajêr hemî zeft kirin û êrîşên dijwar anîne ser Ermeniyên, sivîl û ji çarhawîr de çek û gulle barandin û derbasî bajêr bûn. Jin, zarok, mêr û kuflet dane ber gulle û şûr û xenceran, nema kesî ji me kesek dît. Bi xwedê diya min destek cilê keçikan li min kirin û em ketin nav qefil û karwanên Ermeniyan de û hey dengê qirçîna gulleyan û qaje-qaja zarok û jinan tê, hema roja heşir û mehşerê ye, bi xwedê bi hezaran ji Ermeniyan kuştin û serjêkirin û heft hezar ji zarok û keç û jinan jî dane ber xwe û ew ajotin ber bi bajarê Mêrdînê de. Lewra bi rê de pêxwas, keleş, merovnenas talanker, diz, rêbirr û kujer weke gurên êrîşê bînin ser keriyê pezê bê şivan û bê xwedî û xwedan, bi tivingan, bi balteyan, bi xenceran, bi şûran û riman

# Navê min Hovanês e

**"gund bû li ser navê min (Sîha Hecî Hisênê Bafille). Îro ez Hecî Hisênê Bafille me û misilman im, lê ez bi xwe Ermenî me û navê min Hovanês Teteryan e, ez bi saya wî Begê Kurd ji kuştinê filitîm. Lewra neyarên me herdu gelan yek bûn.**



Salihê Heydo*



Gundek li devera me heye navê wî Sîha Hecî Hisênê Bafille ye. Ev gund ne mezin e tenê sê-car mal lê hene, ew jî malên wan bi tenê ne di gel maleke dîtir, lewra bi navê Sîha Hecî Hisên tê naskirinê. Her wiha gundê

*Lêkolîner û folklornas, di sala 1956'an de li gundê Hesê Oso yê girêdayî herêma Amûdê hatiye dunyayê, xwendina xwe ya seretayî li gund û ya navendî li bajarê Hesekê qedandiye, bi demekdirêj di warê berhevkirina folklor û wêjeya gelêrî de bi kar kirye û bi dehan pirtûk çapkirin. Niha li bajarê Hesekê dijî û li zanîngeha Rojava di beşa ziman û Wêjeya Kurdî de wanederê waneya folklor û wêjeya klasîk e.




Navê pirtûkê: **Xeleka Xeyalên bê Ezman**

Nivîskar: Gula Almastê

Naverok: Roman

Nivîskar, dilê xwe berdaye navenda hişê xwe û hişê xwe tev li hev kom kiriye, berdaye dilê xwe, wisa her duyan bi hev re, li nav hev hevdayî bi hev re diherikîne. Loma, peyv, nola çilkên cihokan dipekin, dikevine ser kaxezê, ne bi zimanekî hişk, ne bi zimanekî nerm û ne jî bi zimanekî maskûlen çîrokê vedibêje.

Nivîskar vegotina çîrokeke bi kronolojîyekê, bi teşeyekê ve grêdayî ji xwe re nekirîye xem sereleheng, bûyer, dem û dewran neafirandiye, eynikeke neşkestî danîye pêşberî civaka xwe û bi realîzmeke realist çîroka "keçikeke dê û bavekî bê kur" bi dêwilan ji bîrê kişandiye û berdide çemê nivîsbêjîya kurdî.

Roman, her çi qasî gelek teybetmendiyan bihewîne jî li ser wan teybetmendiyan gêre nake. Hêmayên klasîzmê, yên modern û heta yên postmodern digire dest. Ji bikaranîna biwêjan heya gotinên pêşîyan, termînolojîya gund û bajêr bi hev re dustir e û nane romanê li tenûreke dadayî, wî hevîrê bi haveyn tirş dike, dipêje. Belkî çîrok xwendeyan zû nekêşe nava xwe, lê belê çirok xwe bi hesanî berdide hiş û dilê xwendeyan.

Hejmara Rûpelan: 254

Cih û Dîroka Weşanê: weşanxaneya NA'yê / kanûna 2021/

Navê Pirtûkê: **Tiliya Qereqûçkê**

Nivîskar: Roza Metîna

Naverok: Helbest




Pirtûka helbestê ya bi navê Tiliya Qereqûçkê ya Roza Metîna di 2019'an de ji aliyê Weşanxaneya J&J'yê ve hat çapkirin. Çapa duyem jî di 2020'i de dîsa ji aliyê Weşanxaneya J&J'yê ve hat kirin. wêneyê bergê yê pirtûkê jî ji aliyê Wênesazê Kurd Zuhair Hassib ve hatiye çêkirin.

Di naveroka helbestên di pirtûka Tilîya Qereqûçkê de cih digirin mijarên cuda hatine vehewandin. Di helbestên vê pirtûkê de Roza Metîna bal kişandiye ser welat, êş, evîn, xweza, talankirina cihên dîrokî yên Kurdistanê. Di hinek helbestên xwe de behsa dewlemendiyên bajarên Kurdistanê kiriye. Rozayê bi honandina peyvan hest û hunera helbestê raxistiye pêş çavan.

Di berga dawiyê ya pirtûkê de ev helbest cih digire:

bêhawe ne galegal û gotinên
li welatekî nenas talana bi dizî dikin
gustîlkên bûk û zavayê xêr ji xwe nedîtine
di kozikeke tarî de bi stûyên xwe dialiqînin
di cihokên av tê de genî bûye
duayên berî li rojê dixeniqînin

Hejmara Rûpelan: 72

Cih û Dîroka Weşanê: Weşanxaneya J&J /2020

---

Navê Pirtûkê: **Rik**

Nivîskar: Bahoz Baran

Naverok: Çîrok




Di vê pirtûkê da neh çîrok hene (Meqes, Xewn, Cezayê Ezraîlî, Hundir, Meraq û Mikurîyek, Du Rêwî, Kevirên Serhişk, Rik û Daxwaza Dawî). Ev çîrok ji alîyê hûnak, ziman û mijarê ve deriyê asoyên nû li çîroknivisiyê vedikin.

Çîroknûs Bahoz Baran ku weke zimanzan jî tê naskirin bi berhemeke nû ya kurteçîrokan derkete pêşberî xwînerên kurdî. Ev çaremîn pirtûka kurteçîrokan e ku ji aliyê Baran ve hatiye nivîsandin.

Hejmara Rûpelan: 119

Cih û Dîroka Weşanê: Weşanên Wardozê /2022




Navê Pirtûkê: **Hest û Dîdar li Gerra War bi War**

Nivîskar: Salihê Heydo

Naverok:

Wêje li ser du beşan tê parvekirin. Wêjeya devkî û wêjeya nivîskî. Lewra wêjeya devkî bi giştî bi navê zargotinê tê naskirin, yanî hemî tiştên ku li ser zimanan hatiye gotin û ji nifşekî heya nifşekî dîtir hatiye werguhastinê, li gor zaravayên xwecihî yên herêmî û êl û eşîrên cuda cuda û bi demê re hin guhertinên biçûk û mezin di mijarên wê de hatine kirin, bê ku naveroka mijarê winda bibe. Her wiha zargotin ji van bendên jêrîn pêk tê, weke: Çîrok, çîvanok, serpêhatî, stran, dûrik, mamik, zûgotinok, efsane, qelîbotik, pêkenok, gotinên pêşiyan, pend û şar û sirûd û gotinên lîstokan. Lewra afrînerê van mijaran ne diyar û naskiriye, lewra arzîbendê temamiya gel, milet û civakê ye. Ji bona vê yekê navê wêjeya gelêrî, yan wêjeya devkî û zargotinê lê dibe. Her wiha wêjeya nivîskî jî gelek beşan û cureyan bi xwe ve hiltîne û himêz dike, weke: Roman, kurteçîrok, çîrok, şano, helbest bi her çureyên xwe ve, gotar, rexne, tarîx û bîrhatin. Ev celeb ji wêjeyê xwedî û afrênerê wê diyar û naskiriye ji ber navê wî û sala nivîsîna berhemê li ser hatiye danîn. Çi destnivîs be û çi jî çapnivîs be. Lewra wêjeya bîrhatin û bîrnivîsan ciyawaziyeke wê ya taybet heye, ji ber gelekî hizir û nîgaş tê de nayên bikaranîn û xebitandin, lê tenê wekî dîdevaniyeke bi dîtin û gotinan tê romalkirin, her wiha pirtir ji dîtin û bîrhatin û peywendiyên rasterast bi civakê re, yan jî ji helewestên ku rojane, salane, mehane û demdirêjiya kar û xebateke dûdirêj pêk tê û tê nivîsandin, çi pozîtîv be û çi jî nîgativ be. lewra wêjeya bîrnivîsê dikeve beşa dîrokê de û xwendin û bûyerên ku tê de hatine nivîsîn û qewimîne xwêner gelekî bi aliyê xwe ve dikişîne. Her wiha rabûn û rûniştina civakê û kar û xebat, yan gerr û lêkolîna bîrnivîs bi xwe derdibirre û tîne kifşê. Ev pirtûka bi navê: HEST Û DÎDAR LI GERRA WAR BI WAR di der barê van mijaran de ye ku hemî bi Nivîskar re derbasbûne û wî ew bi roj, dem û sal nivîsandine, di çax û demên ku wî ger û lêkolîn li ser çanda kurdî dikir ji bo belgekirina wê û danûstendina xwe û civakê bi hev re bi awayekî ron û zelal aniye zimên di hundirê vê pirtûkê de û ruhê kesayetiya kesê/kesa kurd bi duristî û riyalîstî aniye derbirrîn û kifşê di çarçûveya kar û xebata xwe de.

Cih û Dîroka Weşanê: Çapxaneya Dilav/ Hesekê/ 2022

# Pirtûkên Derketî

Navê Pirtûkê: **Gustîlka Pencereyê**
Nivîskar: Nêrgiz Ismaîl
Naverok: çîrok

Pirtûk ji hejdeh çîrokên şoreşê pêk tê. Nêrgiz Ismaîl di van çîrokan de behsa rastiya berxwedan, evîn, tekoşîn û şoreşa azadiyê dike. Bi taybetî jî balê dikşîne ser berxwedan û êşa xelkên me yên Efrînê û şêwaza dagirkirina artêşa tirkan jê re. Her wiha behsa Serê Kaniyê û rastiya bûyerên ku hatine jiyîn dike. Beriya nuha Nêrgizê çîrokên wêjeya devokî du cild bi navê Rûpelên Jînê çap kiribûn, di wan çîrokan de behsa jiyana dayikan û dîroka veşartî di hest û serpêhatiyên wan de dike. Lê belê di pirtûka Gustîlka Pencereyê de cudahî heye ku Nêrgiz Ismaîl bal kişandiye ser rastiya çîzrokên rasteqînî ku di hinavên şoreşa azadiyê afirîne, dike.

çîroka herî bala merev dikîşne ew e ya ku bi navê Gustîlka Pnecereyê ye. Ew çîrok bi xwe jî çîroka nameyekê ye. Di wê nameyê de rastiya hezkirin û evîna du kesan ku bi rastiya evîna welat û tekoşînê re bûye yek, radixîne ber çavan. Di wê nameyê de wefadariya hevjîna şehîd bi bîra mirovan dixîne. Di wê çîrokê de peyama şervanê YPG'ê ku hem di evîna xwe ya biçûk, hem jî bi evîna mezin û eşqa welat re wefadar e, dike. Bi zimanekî şêrîn û delal çîrok hatine hûnandin. Bi pêlê her çîrokekê re merev kûr û dûr diçe û cîhana mirov a lêgerîna li rûpelên şoreşa Rojavayê Kurdistanê bedewtir dike.

Hejmara Rûpelan: 100
Cih û Dîroka Weşanê: Weşanxaneya Şilêrê /2021/

■ Radyoya Êrîvanê, 1964; Porsora Sebrî, Nûra Cewarî, Seva Bayloz, Cemîla Celîl, Aslîka Qadir

dibin jûrî, berhemên biyanî werdigerînin kurdî yan jî yên kurdî werdigerînin biyanî. Ji bo ku wêjeya kurdan ji aliyê cîhanê ve bê naskirin, lewma werger jî mijareke girîng e. Her wiha jinên li derveyî welêt dijîn jî vê peywirê digirin ser milên xwe û di nava saziyan de roleke çalak dilîzin. Ev rol û mîsyon dê di heman demê de ji nifşên siberojê re jî wekî mîrateyekê bimîne. Çawa jinên dengbêj ji nifşên siberojê re mîrateyeke mezin hiştin dê jinên niha jî ji bo wêjeyê kedê didin mîrateyeke giranbuha bihêlin û bibin çirûsk.

Di warê wêjeyê de arşîvkirin jî gelekî girîng e. Îro jin li her çar parçeyên Kurdistanê berhemên folklora kurdî kom dikin. Çîrokên gelêrî dikin pirtûk û çap dikin. Li berhemên xwe xwedî derdikevin û dikarin li ser berhemên hevdu binivîsin û nirxandinê bikin. Ji ber ku gellek berhemên kurdî yên wêjeyî nehatine arşîvkirin, winda bûne. Lewma xwedîderketina li çîrokên gelêrî hêviyeke mezin di qada wêjeyê de dide afirandin. Jinên kurd bi vêya jî namînin antolojiyên wêjeyî yên jinên kurd jî çap dikin û ji bo vê yekê jî bi dildarî tev digerin. Ev di heman demê de rêzgirtina ji bo nirxên taybet ên civaka kurd e jî. Jin bi vî rengî hêzê didin hevdu. Tevî hemû zextên dewletan hêzeke berbiçav a jinê ya di qada wêjeya kurdî de heye. Yek jê ya herî girîng jî wêrektiya jinê ye. Jinên kurd bi wêrektî û baweriya bi xwe re hêviyeke cuda dide wêjeya kurdî. Li dijî qalibên zayendperest, zihniyeta baviksalarî, êrişên li ser wekheviyê li ber xwe didin. Çongê danînin û bi hêza pênûsa xwe tovên pêşketina wêjeyî direşînin. Li dijî hiqûqa serdestan a li ser gelê kurd tê sepandin û êrişên li ser ziman û wêjeya kurdî jinên kurd ji têkoşînê re pêşengiyê dikin.

zordestiya zihniyeta baviksalarî hinek jinên nivîskar berhemên xwe yên hêja bi mahlasa mêr derxistine. Jinan dema di qada wêjeyê de têkoşîna berhemên hêja didan di heman demê de jî têkoşîna li dijî zihniyeta yekperest û baviksalarî jî didan. Ev yek heta niha jî didome. Li ser axa Mezopotamyayê jî jinên kurd pêşengiya wêjeyê kirine û gellek berhemên hebûna gelê kurd diparêzin anîne heta roja îro. Jinên mîna Cemîla Celîl gund bi gund geriyane û gelek berhemên hêja yên folklora kurdî ji tunebûnê rizgar kirine. Li gor hinek çavkaniyên berbiçav li ser axa Mezopotamyayê cara ewil strana eşqê ya ewil, pêşgotinên ewil, reformên civakî yên ewil her wiha mîna van gellek tiştên giranbuha û yên ewil pêk hatine. Jinên kurd ên mîna Cemîla Celîl, Dayê Tewrêza Hewramî, Eyşe Şan, Mestûre Kurdistanî, Rihan Xanima Loristanî û gellekên din li ser vê axa dewlemend ku gellek tiştên ewil di dîrokê de li ser pêk hatiye, bi rola parastina nirxên civakî rabûne.

Mirov dema parastina nirxên civakî dike, di heman demê de parastina hemû dewlemendiyên li ser erdnîgariya xwe jî dikin. Bi taybet di vî warî de em dikarin balê bikşînin ser wêje û çanda devkî; ango dengbêjiyê. Bi saya çanda dengbêjiyê ku dîsa jinan pêşengiya vê çandê kirine hafizeya civakî ya gelê kurd hatiye parastin. Di vir de dîsa em dikarin balê bikşînin ser rola jinê ya di qada wêjeyê de. Bi saya dengbêjiyê çîrokên bi sedan salan heta roja me ya îro hatine. Jixwe çîrok beşeke girîng a wêjeya devkî ye. Bi saya çîrokê ziman jî pêş dikeve û bandoreke erênî li ser pêşketina wêjeyê dike. Li gel vêya gellek berhemên wêjeyî yên bi saya çanda dengbêjiyê hatine parastin, hene. Her wiha kilamên dengbêjiyê yên hatine gotin wekî belgeyên dîrokî ne. Di radyoya Êrîvanê de jinên mîna Fatma Îsa, Sûsika Simo, Aslîka Qadir û... hwd, kilamên rastiya civaka kurd radigihînin gotine û bûne dengê gelê kurd. Kurdan êş û evîna xwe, rastiyên civakî, hêvî, daxwaz û gelek tiştên din bi saya vê çandê anîne ziman. Dîsa di radyoya Ûrmiyê ya beşa kurdî de wekî jin cara yekem di 1917'an de Îran Mucerd (Îran Xanim) derdikeve û kilaman dibêje. Li gor hinek çavkaniyan tê gotin stranên wê bi xwe jî hebûne lê ji ber nehatine tomarkirin winda bûne. Gellek jinên dengbêj bi vî rengî stranên wan nehatine tomarkirin û winda bûne. Ev hunera jinên dengêj bandoreke erênî li ser pêşketina zimanê ku amûra wêjeyê ye jî dike. Tevî zext û pêkûtiyên ku hatine kirin jinên kurd dîsa jî li ber xwe dane û di qada wêjeyê de roleke giranbuha lîstine.

Jinên ku ji dîrokê heta niha rih dane ziman û wêjeya kurdî îro jî bi rêxistinbûyina xwe ya hêjayî pesindayinê ye di nava xebatên saziyên ziman û wêjeyê de dixebitin. Bi sekin, helwest, jêhatîbûn û hunera xwe kedeke mezin didin û ji civakê re dibin mînak. Li ser her çar parçeyên Kurdistanê jin di qada wêjeyê de xwe pêş dixin. Dinivîsin, dixebitin, di pêşbirkan de

# Rol û mîsyona jinê ya di qada wêjeyê de



Roza Metîna*

**"Jinên kurd bi wêrektî û baweriya bi xwe re hêviyeke cuda dide wêjeya kurdî. Li dijî qalibên zayendperest, zihniyeta baviksalarî, êrişên li ser wekheviyê li ber xwe didin...**



Dema em li cîhanê dinêrin em dibînin ku li her aliyê cîhanê jin xwedî roleke taybet û girîng e. Di qada wêjeyê de jî jinan kedeke giranbuha dane û mohra xwe li bin berhemên gellekî hêja xistine. Lê ji ber zext û

*Rojnameger û nivîskar e. Di sala 1985'an de li gundê Fitnê yê Dêrika çiyayê Mazî ya Mêrdînê ji dayîk bûye. Li Zanîngeha Stanbolê û Dîcleyê beşa Gihaştina zarokan qedand. Di çend kanalên TV yên Kurdî de bername pêşkêş kirine. Di rêveberiya Komeleya Wêjekarên Kurd, Komeleya Rojnamegeran a Dicle û Firatê û PENa Kurd de cihê xwe digire, di heman demê de endama Koma Helbestê ya Amedê ye. Berhemên wê: "Bilindahiyên Xwedanwend (Helbest) (2014), Hêviyên Dilazad (Helbest) (2015), Sêgoşe û Çargoşe (çîroka Zarokan) (2016), Tilîya Qereqûçkê (Helbest) (2019).

■ fermana li dijî Kurdên Êzîdî yên Şengalê -2014

■ Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ)

kerîdoreke ewle ew gihandin Rojavayê Kurdistanê û li wir hemû pêwîstiyên wan ji cih, xwarin û vexwarin û.. hwd dabîn kirin.

Ruxmî ku 7 sal di ser komkujiyê re derbas bûn, lê birîna Şengalê hîna nehatiye pêçandin û xelkê wê li benda pêkanîna edaletê ne.

Belê, bidawîkirina azarên Êzidiyan, bi taybet yên jinan bi xebateke bêhempa ji bo rizgarkirina wan ji koletiyê, bi dawîkirina azarên wan di bazar û firotina wan wekî sebiye de pêkan e. Heta roja me ya îro çarenûsa bi dehan jin û zarokên Êzîdî nayê zanîn ji malbatên xwe re bûne êş û kul.

Jinên Êzîdî yên Şengalê ji ber êrîş û komkujiyên hovane yên çeteyan gelek êş û zehmetî dîtin û li dijî wan her cure binpêkirinên nemirovî hatin meşandin.

Ji vê yekê zêdetir, çeteyên DAIŞ'ê mal, dibistanên Êzidiyan û cihên wan ên olî şewtiandin û jinên ciwan di bazaran de kirîn û firotin. Gelek jin û zarokên ku ji destên wan hatin rizgarkirin pirsgirêkên derûnî bi wan re derketin.

Êrîşa çeteyên DAIŞ'ê ya li ser Şengalê ne wekî êrişeke ji rêzê bû. Lê fermaneke mîna fermanên ku Osmaniyan pêk tanîn bû.

Ev ji bo civaka Êzidî ya Şengalê bû dersek, ji bo rê li ber van fermanan bigire, xwe di hemû qadan de bi rêxistin kir. Civaka Êzîdî ya Şengalê piştî ku hate rizgarkirin, pergala xwe ya xweparatinê ava kir ku ji Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ), Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) û Asayîşa Êzîdxanê pêk tê. YJŞ'ê di pêngava rizgarkirina bajarê Reqayê de ku çeteyên DAIŞ'ê wekî paytexta xîlafetê îlan kiribû de, cih girt û bi dehan jinên Êzîdî ji çeteyan rizgar kirin. Her wiha civaka Êzîdî ya Şengalê rêveberiya xweser ava kir ku jin di hemû sazî, meclis û desteyên wê û di tevahî qadên siyasî û civakê de cih digire.

Di vê pêvajoya dîrokî ya hestiyar de, gelek xebat li pêşiya jinên Êzîdî heye, da ku birînên xwe derman bikin, ev yek ancex bi xurtkirina têkoşînê û pêşxistina rola jinan di hemû qadan de, her wiha di rola wan a daxwaza mafên xwe yên binpêkirî û hesabxwestina ji aliyên ku destên wan di fermanê de

Êzîdiyan, bi taybet a jinan nehatiya pêçandin û li benda edaletê ne.

Keriyên çeteyên DAIŞê bi armanca qirkirin, tunekirina civaka Êzîdî û jiholê rakirina baweriya wan ya ku di cîhanê de ji baweriyên herî kevnar e. di 3'yê Tebaxa 2014'an de êrîşên giran birin ser Şengalê. Artêşa Iraq û hêzên pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ku bi navê parastinê li Şengalê bûn, bi êrişên DAIŞ'ê re reviyan û erka xwe ya parastina Êzîdiyan bi cih neanîn. Li pêşberî çav û guhê tevahî cîhanê, zarok, jin, ciwan û kesên tememezin ên Êzîdî hatin qetilkirin, revandin, malên wan hatin talankirin, şewitandin, mezar û cihên wan ên pîroz hatin xirabkirin. Her wiha bi sedan jin û zarok li bazaran hatin firotin û çarenûsa gellekan jî heta niha nediyar e. Tevî van hemuyan, cîhanê xwe kerr û lal kiriye. Wekî her car şervanên YPG û YPJ, gerîlayên azadiyê bi hawarê ve çûn. Van hêzan bi hezaran Êzîdî ji pençên qirkirinê xilas kir, heta ku civaka Êzîdî xwe bi rêxistin kir, rêveberiya xwe û hêzên xwe yên parastinê ava kirin.

Dîmen û wêneyên ku azarên Êzîdiyan parve kiriye, di hişê min de maye, ji wê zêdetir mîna ku careke din li ber çavên min çêdibin ku yek kêlîyên ku ji bîr naçin.

Di wêneyên ku kamereyên rojnamevanan kişandine de dijwariya kareseta ku jinan di rêya lêgerîna li jiyanê de dîtine û ji mirinê direvin nîşan dide. Her wiha revandina jinan, qetilkirina zarokan û mezinan û dûrxistina ji warê wan û şewitandina milkên wan parve dike.

Fermaneke nû li dijî civaka Êzîdî bû ku di sedsala 21'ê de li pêşberî çav û guhên cîhanê hate kirin ku li hemberî wê xwe û kerr û lal kiriye.

Di wan dîmenan de, qêrîna dayîkan, qêrîna zarokên birçî yên pêxwas û perîşan di rêyên xelasiya ji mirinê de tê rave kirin. Qirik û çav ji girî, germa havînî, ji westandin û dijwariyê rê zûha bûne ku bi piyan dirêj meşiyan heta ku xwe gihandin Rojava. Rewşeke wisa hêsan nebû, hinek jin û zarok di rê de jiyana xwe ji dest dan.

Azarên wan li Rojava bi dawî nebû, lê zêde kir. Ji ber ku birîna Şengalê, warê xwe û çarenûsa xizmên xwe û mal û milkên xwe ji bîr nekir. Çeteyên DAIŞê ku warê wan dagir kir komkujî li dijî şêniyên ku mane û nedikarîn xwe xilas bikin pêk anîn, tundiya fîzîkî û derûnî li dijî jinan pêk anîn, her wiha ew wekî kole dikirîn û difrotin. Li hemberî jinên Êzidî her cure zulm, tundî û êrişên zayendî hatin kirin. Hinekan ji bo nekevin destê çeteyan dawî li jiyana xwe anîn.

Rêxistina terorîst a DAIŞ'ê ku tu têkiliyên wê bi çanda mirovahî û exlaqê civakî û ola îslamê re nîne, bi dehan mezar, sembol û pîroziyên civaka Êzidî rûxandin. Heman demê ji ber dorpêça ku çeteyên DAIŞ'ê bi rojan li ser Êzîdiyên ku xwe spartibûn çiyayên Şengalê ferz kiribû, hejmarek zarok û kesên temenmezin ji tîbûn û birçînê, mirin, heta ku şervanên YPG û YPJê bi hawara wan ve hatin û bi vekirina

# Şengal; Birîna ku nayê pêçandin

**Di vê pêvajoya dîrokî ya hestiyar de, gelek xebat li pêşiya jinên Êzîdî heye, da ku birînên xwe derman bikin, ev yek ancex bi xurtkirina têkoşînê û pêşxistina rola jinan di hemû qadan de.**

**Hêvîdar Xalid***



Heft sal di ser fermana li dijî Kurdên Êzîdî yên Şengalê re derbas bûn, ku ji aliyê komên terorîst ên DAIŞê ve pêk hatibû. Di sedsala 21ê de fermana herî hovane û mezin bû. Tevî ku ewqas sal di ser re derbas bûne jî, lê hîna birîna

*Rojnameger e, ev 15 sal in di ragihandina nivîskî û dîtbarî de li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kar dike. Di rojnameya Ronahî de heftane quncika bi serenavê "Neynika jinan" dinivîse.

■ jinên Êzîdî

bersiv' yekem konferansa xwe li çiyayê Şengalê lidarxistin. Avabûna Meclisa Jinên Şengalê destpêkê ji bo jinên Êzîdî û hemû jinên Rojhilata Navîn bû moralek mezin.

Bi van gavên pîroz Yekinêyen Parastina Jin a Şengal (YPJ-Şengal) di 2021ê de li çiyayê Şengalê yekemîn konferansa xwe lidarxist.

Jinên Êzîdî hêza xwe ya leşkerî YJŞ'ê ava kirin, bi xwe dest bi parastina xaka xwe ji êrîşên DAIŞ'ê kirin. Di hemleya rizgarkirina Reqa û Dêrazorê de cih girtin û bi dehan jinên Êzîdî rizgar kirin .

Îro hemû jinên Êzîdî di bin sîwana TAJÊ'yê de xwe bi rêxistin dikin, hem di nav rêvebirina meclisa Rêvebiriya Xweser a Şengalê de wek hevserokatî û endam cihê xwe digirin, hem jî di hemû sazî û dezgehan xwedî rol in.

Li Rojavayê Kurdistanê jî jinên Êzîdî di nava saziyên Rêveberiya Xweser de cih girtine, û dikarin ol û çanda civaka Êzîdî û tiştên ku şaş li ser wan hatine naskirin bi derdorê bidin fêmkirin û nasîn. Hem rola xwe di Mala Êzîdiyan a ku li Rojava hate vekirin de dilîzin û xwe birêxistin dikin, her wiha ji jinên ku ji destê DAIŞ'ê rizgar dibin re dibin alîkar, heya digihêjin malbatên xwe.

Bi gavek din a serkeftî di hizêrana 2021ê de bi tevlibûna 300 jinên Êzîdî ji Şengal û derve û hundirê Rojava Konferansa Damezrîner a Yekîtiya Jinên Êzîdî li herêma Şehbayê hat lidarxistin, da ku hîn bêtir jinên Êzîdî rêxistina xwe li her deverî xurtir bikin, ji hemû êrîşên heyî re bibin bersiv di serî de yên ferman kirine û heta niha nehatine darizandin. Ji ber jinên Êzîdî wê îxanet û êşa ku li Şengalê bûye, tu carî ji bîr nekin û dê tolê hilînin.

Ev hemû jî nîşan dide ku di avakirina civaka Êzîdî de hîn jî jinên Êzîdî hêmaneke girîng in, mîrasa bav û kalên xwe heya roja îro vedijînin û çanda xwe di nava keziyên xwe yên hûnandî de diparêzin.

## Jinên Êzîdî xwe li her deverî birêxistin kirine

Eger em vegerin nava dîrokê, li dijî ferman, qirkirin û sirgûniyê, jinên Êzîdî hebûna xwe her parastine, gelek jinên berxwedêr, lîder, nivîskar û hunermend derketine pêş. Di têkoşîna azadiyê û parastina çanda kurdan de rola wan girîng e. Binefş Agel, Cemîle Celîl, Dayê Zero ku weke şêwirmenda eşîra xwe dihate nasîn û Zerîfe Oso û... hwd, pêşeng bûn. Ev bingeh bû ku îro bi pêşngiya YPJ û YJA –STAR'ê Jinên Êzîdî xwe li her deverî birêxistin kirine da ku bibin bersiv ji hemû êrîşên heyî re û di serî de yên ferman kirine û heta niha nehatine darezandin.

di şoreşa Rojava de, ya riya wan meşand Silava Cindo, Borista Efrîn û gelek jinên din ku di nav refên YJŞ'ê de li dijî çeteyên DAIŞ'ê li ber xwe dan heta şehadetê pêşeng bûn.

## Li Çiyayên Şengalê Meclisa Jinên Êzîdî hate damezrandin

Di tîrmeha sala 2015'an de bi durişmeya 'Dê jinên Êzîdî bi rêxistinbûna xwe li hemberî hemû fermanan bibin

■ Jinên Êzîdî kevneşopiyên xwe mîras girtine



## Jinên Êzîdî kevneşopiyên xwe mîras girtine

Jinên Êzîdî heya roja me ya îro kevneşopiyên ku ji xwe re mîras girtine, di pîrozkirina cejin û şahiyên olî û vejandina rêûresmên xwe de diparêzin.

Li aliyekî din jî jinên Êzîdî wek pêşenga baweriyan dihatin nasîn, hemû tişt ji aliyê jinan ve dihat birêvebirin ku di civaka Êzîdî de hinek jin hene zewac ji bo xwe qedexe kirine û jiyana xwe xistine xizmeta parastin û paqijkirina mezargehan.

Di Cejnan de jî çanda xwe heya roja îro parastine mînaka vê jî cejnên wan " Batzmi, Êzî , Çarşema sor û... hwd. Her jina Êzîdî pêşenge di hemû amadekariyan de ku min bi çavên xwe dîtiye dema ku min bernameya Çilkezî ye ku di her xelekekê de çîroka jineke Êzîdî dihate hûnandin.

Wekî din heya roja îro jinên Êzîdî roja pêncşemê, berî roj biçe ava çirayan vêdixin û bi hêviya ku xwedê wan biparêze dua dikin û dibêjin "ya xwedê û pîrê arî tu me û zarok û tebayî gelê me li hemû deverên dunyayê ji qeda û bela bistrînî, ya xwedê û Melekê Tawis tu bikî çira me her ronî be li dinê ya reb elalemîn".

Li aliyê din jî girêdana jina Êzîdî bi rojê re ku her weke ronahiya jiyanê pîroz e, berê xwe didinê û dua û nimêja û cejin, şîn, xêr û hwd jî bi ´qawl´ û ´beytan´ her anîne li ser ziman û xwe pê dane naskirin.

■ bernameya taybet bi jinên Êzîdî li Rojava bi navê "Çilkezî "

di aliyê pîrozî û nirxdayîna jinên Êzîdî de bi dest bixim û ji temeşevanan re pêşkêş bikin.

çîrokên ku min ji devê jinên Êzîdî guhdarkirin ji devê dayik, bav û kalan herikîbûn. Di dîroka civaka Êzîdî de jinên Êzîdî li hemberî gelek ferman, dijwarî û perîşaniyên ku di warê kuştin, êsîr û koçberiyê de rû bi rû man, serî li şikeftên çiyayan dan ku xwe û zarokên xwe biparêzin. Serî hildaye ku gellek jinên berxwedêr jî di oxira xweparastinê de destanên qehremaniyê nivîsandine.

Dikarim mînaka gellek jinan bidim ku ji wan jinên parêzvan Meyan Xatûn, jina hunermend Sûsika Simo xwediya stranên pir xweş ku dikaribû li ser civaka xwe vebêje. Dayîka Zero ya ku bi berxwedana xwe di civaka Êzîdî de tê naskirin, di aliyê eşîrtî de weke jineke xwedî qîmet dihat nasîn û her şêwra wê di her tiştî de dihat kirin. Her wiha bi dehan jinên wekî van jinan hene û di serdema me ya niha de destanên têkoşînê li dijî dijminan nivîsandine, mînaka wê jî jinên (YJŞ) yên ku li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer kirin û careke din têkoşna jinên Êzîdî ya dîrokî domandin. Dayîka Gulê ya ku li hember DAIŞê têkoşîn kir ji bo nekeve destên wan û weke sembola jinên Êzîdî niha peykerê wê li Şengalê hatiye çêkirin.

Bi vê yekê dikarim bibêjim ku Jina Êzîdî di Aliyê berxwedanê de ji dîroka kevnar heya îro di nava berxwedanê de ji alîyekî û jî yên çandî, kevneşopî û resenî de her xwe parast û daye parastin.

bo xwe biparêze, bi cih bibe û jiyana xwe bidomîne her tim di nava lêgerîn û hewldanê de ye. Têkoşîna hebûnê hatiye dayîn, di encama vê têkoşînê de çand pêş ketiye û civak ava bûye.

Li vir dikarim behsa yek ji civakên herî kevnar bikim ku jinê çand, dîrok û hebûna xwe di nava keziyên xwe yê hûnandî de her parastiye. Ev civaka qedîm û resen; civaka Êzîdî ye, bingeh û kok e, hêlîn û dergûşa mirovahiyê ye.

Ev civak bi fermanan re her rû bi rû maye, gelek nirxên wê ji jiyanê hatina dûrxistin, lê heta dawiyê civakeke berxwedêr û esîl e, ku hest û exleqê jinê ev rih timî parastiye û zindî hiştiye. Girêdana jinê bi çiya, erda û xaka xwe ve, ev girêdana bê hempa hebûna vê çandê heya roja îro bi xwe re aniye.

Jina xwediya vê çanda pîroz her çiqas ne rêxistinkirî û bê perwerde be jî, ji bo nekeve destê dijmin de, xwe ji lat û zinaran de avêt. Jinên ciwan ji bo xwedîderketina li rûmeta xwe, parastina çanda xwe ya kevnar û pîroz; keziyên xwe bihev ve girêdan, destên hev girtin û di oxira parastina hebûna xwe de canê xwe feda kirine. Bi vê seknê carek din bermahiya çanda kevnar a Êzîdî zindî kirin. Dawî li jiyana xwe anîn û koletî qebûl nekirin. Dayika şengalî Yadê Gulê mînaka vê ya herî berbiçav e.

Me hemûyan dizanîbû Êzîdî hene, lê civakeke çawa ye, baweriyên wê çi ne û nirxên jinan çiqasî tê de li pêş in, bi rastî lêkolîn û parvekirinek di van aliyan de pêwîst bû.

Ji ber ew jî bi heman şêwazê ku em ji aliyê rêcîma Baas ve têre derbas bûbûn bê deng kiribûn, heta ji me xerabtir hatibû serê wan.

Piştî fermana 3'ê Tebaxa 2014'an a ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve bi ser civaka Êzîdî de hat, pêwîstiyek hebû em vê civaka ku her bi fermanan hatiye helandin ji nû ve zindî bikin û bi cîhanê bidin naskirin.

Bi xebata rojnemegeriyê re, ez yek ji jinên bi şans bûm ku min piştî karê 10 salan di nava xebatên ragihandinê de cih girtibû, lêkolînên min bi taybetî li ser jinê dihatin meşandin, vê yekê jî hişt êdi dest bi xebateke taybet ji bo jinên Êzîdî bikim.

Ev xebat bi çêkirina bernameyekî taybet bi jinên Êzîdî li Rojava bi navê "Çilkezî" hate destpêkirin.

Di gera min a di nava bajar, gund û herêman de gelek civatên min bi civaka Êzîdî re çêbûn, ev civak gellek şaş hatibû fêmkirin bi navên derveyî rêzê ew didan nasîn, gellek mirovan cîrantiya wan qebûl nedikirin, mafên wan di nava civakên din de dihate xwarin, ya herî balkêş jî gelek mirovan heya nanê destên dayikên Êzîdî nedixwarin. Me xwest van şaşîtiyan rast bikin û civaka Êzîdî weke hemû civakên li ser vê axê dijîn ku xwedî maf in, bidin naskirin. Pêwîstî hebû em lêkolînên berfireh bikin û di dîroka vê civakê de kûr bibin, heya em van hemû rastiyan ji tevahî cîhanê re raxin ber çavan.

Bi riya bernameya Çilkezî min karîbû van tiştan û destkeftiyên pir mezin

# Jinên Êzîdî.. hêmaneke girîng in di vejandina çanda xwe ya resen de

**Jinên ciwan ji bo xwedîderketina li rûmeta xwe, parastina çanda xwe ya kevnar û pîroz; keziyên xwe bihev ve girêdan, destên hev girtin û di oxira parastina hebûna xwe de canê xwe feda kirine.**

Şînda Ekrem*



Jina xwedî çanda pîroz her çiqas ne rêxistinkirî û bê perwerde be jî, ji bo nekeve destê dijmin de, xwe ji lat û zinaran de avêt, lewma ji kûrahiya dîrokê heta roja me ya îro di xwezayê de mirov û bi taybet jin ji

*Rojnamevan e. Di sala 1988an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye. Ji sala 2011an ve di warê ragihandinê de wek nûçegihan û çêkerê bername û raportan (Ajansa Nûçeyan Hawar, Ronahî û çira TV..) de kar kiriye. Niha li Araratê ji bo weşana TV û hilberîna medyayê – Beşa Rojnamegeriya Zarokan "Ara Zarok" dixebite.

mijar û nivîs di kovar û rojnameyên Erebî de parvekirin.

Di sala 2000î de mıin bi alîkariya hin rewşebîrên welatparêz kovara YEZDAN bi derfetên herî kêm derxist 3 hejmar hatin çapkirin û weşandin bi rengekê dizî, lê mixabin piştî ku hejmara çaremîn di çapxanê de dihat amadekirin, hêzên ewlekariya rêjîmê çapxane û xebatkarên wê û hemû alav û amûrên li wir xistin bin çavan.

Di sala 2007'an de min pitûkek nivîsand li ser ola Êzîdî, ew jî tenê ji bo şagirtên Êzîdî, lê li ser xwesteka gellek dostan min di 2011'an de ew pirtûk bi rengekî sîstematîk çap kir.

Di sala 2017'an (piştî xebateke 30 salî) pirtûkek amade kir, di wê pirtûkê de 130 qewlên ola Êzîdî hene bi tîpên latînî, ez dikarim bibêjim ku ev pirtûka yekemîn e di dîroka Êzîdiyan de bi vê rengê ye, hin nivîskar dedora 60 – 70 qewl kom kirin û weke pirtûk çap kirin, lê ew bi tîpên Erebî ne.

Di sala 2011'an de me pirtûkên perwerdeya seretayî û navendê (ji refê 1 heya 9) ji komîteya perwerdê ya Şêxan (herêma kurdistanê) anî, me li Efrînê ew pirtûk ji tîpên erebî wergerandin tîpên kurdî û heya îro şagirtên Êzîdî ji wan pirtûkan perwerdeya xwe didomînin.

**_Hun weke çîna ronakbîr di nava civaka Êzîdî de, ji bo rastkirina civakê çiqas hewildanên we hene, ango di vê der barê de çalakî û projeyên we çi ne?**

Dema ku tu bixwazî nifşekî ji welat û ola xwe hez bikin derxî holê, divê tu dest bi perwerdeya zarokan bikî, lê berya wê divê mamoste hebin bi rengekî zanistî perwerdekariyê bikin, lewma me dest bi perwerdeya mamosteyan kir. Yanê me perwerdeyên vekirî ji hinek mamosteyan ra vekirin, û her ku pêwîstî çêbibe em ê mamosteyan fêr bikin. Ya din pirojeyên me ji bo şagirtan hene, em pirogramekî zanistî û dagirtî amede dikin.

**_RÊzîdar Cafer, dubare em spasiya te dikin, heger gotinek te ya dawîn hebe, kerem bike bibêje.**

Ez jî we spas dikim ku we ev derfet da me, ji bo rewşenbîr û xwendevanên me bi çavekî biratî li birayên xwe yên Êzîdî meyze bikin, ne weke xwesteka dijmin ew bi çavekî dijminatî li kurdên Êzîdî binêrin. Êzîdî kurdên resen in, bi serbilindî wan çand û zinamê kurdî parastiye, bila em ji dijminên xwe re nebin alîkar. Bila hemû rewşenbîr zanibin eger kurdiyatî xwîn e, Êzîdiyatî damarên ku ew xwîn têde diherike.

Bi hezaran rewşenbîr û nivîskarên biyanî xwestin çanda kurdên Êzîdî ji rastiya wê vala bikin, bila rewşenbîr, siyastmedarên ku heya niha li rex dijminên Êzîdiyan êrîşî ola Êzîdî dikin da ku ew dijmin ji wan razî bibin, carekê li xwe vegerin, û bighin wê baweriyê ku kurdên Êzîdî birayên wan in, û Êzîdiyatî parêzvana çand û kelepûr û kultûra kurdan e.

Zerdeşt ne pêxember e, ew sihirbaz e.

Zerdeşt neçar bû ku Urmiye warê bav û kalan berde û berê xwe bide rojhilat heya gihîşte Belxê.

Li Belxê imperetor Keştaseb û hevjîna wî bawerî bi Zerdeşt û ramana wî kirin.

Nivîskarê Hindî Behmen Soracî Banacî li ser zimanê Zerdeşt dibêje:

Ez ne hatime oleke nû damezrînim, ez hatime ola bav û kalan nûjen bikim.

Keştaseb destûr da Zerdeşt da ku fikr û ramana xwe ya paqijkirin û sererastkirina ola Êzîdî bê astengî bi kar bîne. Zerdeşt careke din berê xwe da Kurdistanê, lê mixabin dema li ber agir nimêja xwe dikir, Arcas ê Toranî çend kêr li pişta Zerdrşt dan û ew şehîd xist.

Ji Belxê heya Îranê ( derên ku fikra Zerdeşt gihîştê) jêre gotin: Zerdeştî, û derên ku Zerdeşt negihîştê, man Êzîdî.

Bi kurtî: Zerdeşt bi xwe Êzîdî bû, ne wek tê gotin: Êzîdî Zerdeştî ne, Êzîdiyatî bingeh e.

**- Ji mere hinekî behsa berhem û lêkolînên xwe bike, û bêhtir tu di kîjan waran de dixebitî?**

Di salên 60'î yên sedsala 20î de, min di dibistana seretayî li bajarokê Ezazê dixwend, hejmara me şagirtên Êzîdî ne gelek bûn, di her kombûnekde hevalên me yên misilman( kurd, ereb) henekên xwe bi me dikirin, digotin hun kafir in, hun xwedênenas in, hun rojiyan nagrin û nimêjan nakin, li dora me re xêz çêdikirin û li pêşiya me bazdidan û dibeziyan û digotin: De ka ji vê xêzê derkevin!!!.

Ez mat dimam, min ji xwe re digot eger hebe (sirek) rastiyke veşartî heye, dijminên kurdan naxwezin derkeve, eger na ji bo çi li me halo dikin? Em Êzîdî xwedênas in berî ku ew xwedê nas bikin, em rojiyan digrin, nimêjê dikin berî ola wan derkeve, gelo ev çi ji me dixwezin?

Min ji Êzîdiyan bersivçn van pirsan dipirsî, wan nizanîbûn an ditirsîn bersivê bidin.

Her ku ez mezin dibûm di her kêliyê de ew gotinên hevalên min yên misilman di dibistana seretayî ya bajarokê Ezazê li ser ola me dihatin bîra min, ez her tim li bersiva wan digeriyam, ez diketim pirtûkxaneya her bajarekî ku min serdana wî dikir (wê demê enternêt.. google.. Facebook… hwd tune bûn), ez xizan bûm min nedikarî pirtûkan bikirim, carnan min xwe birçî dikir û pereyên (yên bi xwe hindik) didan ser hev ji bo ez kovar an pirtûkeke li ser Êzîdiya nivîsek belav kiriya bistînim, û dibe ku ew mijar li dijî Êzîdiyan be lê min ji her mijarekê sûd digirt.

Di salên 90'î de ez gihîştim gelek rastiyan, min dixwest wan rastiyan belav bikim, lê astengî gelek bûn. Lê piştî min pirtûka bi navê "Kurtebira dîroka kurd" ya birêz C.P.B bi zimanê kurdî xwend, û piştgiriya ku birêz Abdullah Ocalan da min, min bê tirs dest bi perwerde û nivîsandina li ser ola xwe kir, min gelek lêkolîn, semîner,

dixebite, lê min negot ew siyasetmedar kî ye, min di dilê xwe de got: Ez ê vî siyasetmedarî jî bibînim ka ew ê ji bo me çi bike.

Li cihê soz sorpirîzek ji min re çê bû, ji ber ku ew siyasetmedar bi xwe birêz Abdullah Ocelan bû, û bêy ku derfetê bide ku ez va sopirîzê bînim ziman, ji min re got: ji me dûrkeve û biçe xebata xwe ji bo Êzîdiyan xorttir bike, pêwîstiya Êzîdiya bi perwerde û nasbûna ola Êzîdî heye, li ser vê kar bike û em we destek dikin.

Piştî ku hinekî ji wê sorpirîzê şiyar bûm, min gotê: Min ji şêwaz û îdyolojiya ku hun belav dikin hez kiriye, ew rûken bû û got: Temam, lê giraniya xebata xwe bide pêşketina Êzîdiyan, wan pir zor û zehmetî dîtin, Êzîdî kurdê resen in, û eger ew ji holê rabin demek ne dirêj kurdiyatî wê ji holê rabe!.

**-Êzîdî bi perestiya Îblîs tên tawanbarkirin, tevî ku ev neraste, lê ji ber kêm zaniyariyan di vê der barê de di civakê de û bi taybet di nava misilmanan de wisa hatiye fêmkirin, tu dikarî vê mijarê bêhtie zelal bike?**

Eger mirov aqilê xwe veke wê bi xwe zanibe ev nerast e, wê ji xwe bipirse: Gelo di sedsala 20 û 21ê de kî Îblîs diperese, ma ew kî ye?

Tabî ev gotin bê bingeh e, û qet pêwîst nake ku em bînin ser ziman, lê ew kesê ev gotin derxiste holê armanceke wî hebû, ew jî da ku Êzîdî werine nefretkirin. Piştî ewqas êrîş û ewqas kuştin, Êzîdî li ser ola xwe man, wê demê wan êrîşkeran gotin: Êzîdî xwedê nenas in, ew Îblîsperest in, dema Êzîdiyan bi dilsarî li vê gotinê meyze kirin û berevaniya xwe nekirin, rêflêksa wan derket, misilmanan ew gotin zêde bi kar anîn.

Ez wek lêkolînerekî Êzîdî dibêjim: Ev gotin derew e û bê esas e. Êzîdî xwedê diperesin.

**-Her wekî din jî, ji ber nehêniya li ser baweriyên Êzîdiyan, gelek nêrînên şaş derdikevin holê û Êzîdiyatiyê bi Zerdeşt ve girêdidin, û tê gotin ku ew perestiya rojê jî dikin. Li vir em dixwazin tu bêhtir zelal bikî, roj ji bo Êzîdiyan tê çi wateyê û çi girêdan di navbera zerdeştî û Êzîdiyatiyê de heye?**

Bi kurtasî ez ê bibêjim: Êzîdiyatî ol e, Zerdeşt mirov e… pêxember e… rêber e…û hwd. Wek cihû û Mûsa… xiristiyan û Îsa… Îslam û Mihemed.

Zerdeşt, Mûsa, Îsa û Mihemed mirov in… pêxember in… rêvebir in.

Êzîdiyatî, Cihûtî, Xirîstiyantî, Misilmantî ol in.

Zerdeşt bi xwe Êzîdî bû, wî xwest ola xwe ji wan çewtiyên ku ketine nav Êzîdiyatiyê ( bi zanabûn û ne bi zanabûn) sererast bike, û hin erkên oldaran xuya bike da ku ew oldar sînoran û rêûrismên olî zanibin.

Û ji ber ku her desthilatdarek (împeretor, qiral, pirens, …) oldarekî wek şêwirmend li rex xwe datîne, wan oldaran perspektîfên Zerdeşt çewt ji qiral an pirens re şîrove dikirin, digotin

Êzîdî dibû, û mijarên reşkirina Êzîdiyan diweşand, her wiha weke pêkenok û henek li ser ola Êzîdî diaxivî.

**_Tê gotin ku carnan Êzîdî bi xwe jî zerarê dighînin xwe, ji ber ku beşek ji Êzîdiyan heye dibêjin ku eslê me ne kurd e, eslê xwe înkar dikin û gava li eslê wan tê pirsîn dibjin: 'Em gelê Êzîdî ne' Em hemû jî dizanin ku Êzîdiyatî ne netewe ye, ol e. Li gor we ev helwest bingha wê ji ku tê û encama çiye?**

Rast e, carnan zerara ku mirov li xwe dike ji ya dijmin bêtir e, lê dema tu sedemê zanibî tu yê wî mirovî bibexşînî. Eger em ji wan Êzîdiyên ku dibêjin "em Êzîdî ne… ne kurd in", sedemên ku ew vê gotinê dibêjin çi ne, nas bikin, em ê wan efû bikin.

Dema ku desthilatdar bi çavekî dij û şil li te binêre, yanê te di nav xwe de nepejrîne, te wek mirov nebîne, nanê te naxwe, nekeve xwarnigeha ku tu lê dixebitî yan dixwî, serbira (qurbana) ku bi destê te hatiye serjêkirin nexwe, peyala ku te av pê vexwaribe bişkêne, tû yê çi bi kî? Tu yê wê jiyanê nefret bikî, û tu yê wê neteweya (ku ew kesê desthilatdar jî, ji wê netewê ye) nepejirînî.

Li Başûrê Kurdistanê rewşa kurdên Êzîdî wisa ye. Ji ber vê carnan ew qêrîn dikin, lê tu kes qêrîna wan nabihîze.

Di sala 2011'an de ez li Laleşa pîroz beşdarî cejna "Cumayê" bûm, me suhbet bi Êzîdiyên Şengalê re çê di kir, hinekan ji wan digotin: Em Êzîdî ne û hinekan digotin: Em ne kurd in. Min jî digot: Netewe û zimanê me kurdî ye, ola me Êzîdî ye, lê belê wan gotina min qebûl nedikir.

Di nav wan de kalekî 84 salî hebû got: Şêxê min ( ji ber ku ez bi xwe ji çîna Şêxan im) bi xwedê û Tawisê Melek em Kurd in û Kurdên resen in, lê eger tu salekê li ba me bî, û tu rewşa me bişopînî, tu jî wek me kurdatiya xwe nefret bikî, wî kalî berdewam kir û got: Ez ê bi tenê mînakekê ji te re bibêjim: Berî ez werim vê derê bi 20 roja min 3 feraq (satil) mastê miyan yê pak û teze, û qufek hêkên mirîşka birin sûkê da ez bifroşim, û bi wan pereyan hinek pêdviyên mala xwe bînim, min dît serbazek hat û ji xudiyê dikanê ra got: Wa Xidro mastê helal ma ye?

Li rex mastê min, satilek mastê tirş hebû, xudiyê dikanê bersiv da û gotê: Bi tenê ev mast ma ye, wî serbazî got: Ez neçar im ku ez vî mastê tirş bibim.

Piştî ku heqê mastê tirş da, gotê: Ma hêkê mirîşkan jî hene? Xudiyê dikanê got: Na welleh !!!

Kalê me yê Êzîdî berdewam kir û got: Wê demê min ji wî serbazî re got ( tabî ew min nas dike, û dizane ez Êzîdî me): Dema ku tu mastê pezê me nakrî, dibe ku ez te efû bikim ji ber ku hun xwarina ji ber destên me Êzîdiyan naxwin, lê gelo ma va hêkên di qufê de qey min kirine tu nakirî, ma mirîşk jî Êzîdî ne?

li sala 1990'î ez li Helebê dijiyam, mirovek hat gel min û got: Îro siyasetmedarek dixweze te bibîne wek zanyarekî Êzîdî û ji bo gelê Êzîdî

Ola Êzîdî yekemîn ol e li Rojhilat ku yekbûna xweda naskiriye, û dema kurdên Êzîdî digotin xweda yek e, dema di nimêja xwe de berê xwe didane rojê, ne ku ew rojperest in, ew dibêjin: Roj ronahiya xweda ye, cînarên wan di wê demê de pûtperest bûn.

Ji ber vê kurdan dev ji ola xwe bernedan heya sala 634z dema xelîfeya duyemîn ê Îslamê Omer bin Xettab derbasî axa Kurdistanê bû, hin kurd bi darê zorê, hinan jî bi rengên cûrbecûr ola xwe ya Êzîdî berdan û bûn misilman.

Ji bo parastina ola xwe ya resen, Êzîdî rastî gelek şer û kareset, talan û fermanan hatin, Êzîdî dibêjin: (em rastî 72 fermanan hatine, rast e, lê ev tenê di dema Osmaniyan de bû), lê Êzîdiyan ola xwe bernedan û ew her tim dibêjin:

Em Êzîdî ne
Cil spî ne
Bi ola xwe razî ne

**- Li gor we raghandina kurdî bi rola xwe di pênaskirina ola Êzîdiyatî de baş dilîze ya na? yanê gelo ne gereke ku bernameyên taybet ji bo danasîna vê olê bêne organîzekirin, da ku ola Êzîdiyatiyê ya kurdan bi şiklê xwe yê rast û resen bê nas kirin. nemaze di encama tehrîfkirin û êrîşên ku li ser vê olê têne meşandin?**

Sed mixabin raghandina kurdî heya demekê bi erkên xwe yên neteweyî û mirovî ji bo ola Êzîdî ranedibû, tersî vê, weke xwesteka dijmin nêzî kurdên

**- RÊzîdar Silêman Cafer, em bi xêrhatina te dikin û te spas dikin ku te derfeta vê hevpeyvîna da me.**

Saps, ez jî kêfxweş im ku we ev derfet da min, da ku ez hinek agahî li ser ola Êzîdî bi xwînerên Şermola re parve bikim, ji bo ku hin rastiyan ji devê lêkolînvanekî ji vê ola kevnar a kurdan bibhîzin.

**- Ji kerema xwe bi kurtî be jî, xwe bi xwînerên Şermolayê bide nasîn.**

.

Ez di sala 1954'an de li gundê Basûfanê yê girêdayî navçeya Şêrewa - Efrîn ji dayik bûme, piştî qedandina qonaxa amadeyî, min li zanîngeha Helbê navê xwe tomar kir, lê ji ber hin sedeman ez ji xwendinê qut bûm.

Min ji sala 1990'î ve dest bi perwerdeya ola Êzîdî û zimanê kurdî (li gorî zanabûna xwe), ji bo Êzîdiyan kiriye,her wiha min xizmeta gelê xwe dikir.

Di destpêka şoreşa Rojavayê de min xebata xwe ji bo gelê xwe zêde kir, ji ber ku min dît derfet ji me kurdan bi gîştî û kurdên Êzîdî bi taybet hatiye, û pêwîst e ku em sûdê ji vê defretê bigrin, me di her gundekî Êzîdiyan li Efrînê dibistana ola Êzîdî û zimanê kurdî vekir.

Me di rêveberiya xweser de cih girt, û erka desteya karê derve ya kantona Efrînê da ser milê xwe. Niha ez penaber im û li Şehbayê dimînim.

**- Herêmên Êzîdiyan rastî gelek şer, kareset û wêrankirinê hatine û şop û şûnwarên wan jî rastî tunekirinê hatine, ev jî bû sedema ku gelek lêkolîn û nirxwendinên şaş di der barê vê olê û rêûrismên wê de werin berevajîkirin. Êzîdî kî ne û ola Êzîdiyatî çiye?**

Ola Êzîdî ola kurdan e, yanê bi tenê kurd Êzîdî ne. di baweriya Êzîdiyan de gellek rê hene da ku mirov fermanên xweda pêk bîne, xweda ji bo her ezbet yan neteweyekê oleke cuda û pêxemberek şandiye, ji bo me kurdan ola Êzîdî şand, em perspektîf û fermanên xweda dipejrînin û em bi ola xwe razî ne, gunehên me tune ne, eger xweda em li vê herêmê ji dayîk kirine û anîne dunyayê û zimanê kurdî xistiye devê me, wî (xweda) dikarîbû me li Efrîkayê yan li Ewrûpayê ji dayîk bikraye û dikarîbû zimanê wan û çanda wan bida me. Em Êzîdî bi tu kesî re nabêjin were bibe Êzîdî, tersî wê em dibêjin ka em bi hev re, bi biratî û wekhevî jiyana xwe berdewam bikin, tu bi zimanê dayîka xwe, bi ola xwe û ez bi zimanê dayîka xwe û bi ola xwe.

Li tu deveran an di tu pirtûkan de xweda negotiye ev ol ji ya din baştir e, xweda negotiye ola xwe berde û here oleke din. Em dibêjin hemû ol baş in, em hemû pêxember û pirtûkên olî pîroz dibînin, tu kes ji kesî nebaştir û zanatir e, yê baş ew e yê ji kîn û nefteran û zikreşiyan dûrdikeve û jiyaneke aştiyane bi cînarên xwe re dijî.

Hevpeyvîna Hejmarê

# Nivîskar Silêman Cafer ji "Şermola" re:

## "Bila hemû rewşenbîr zanibin eger kurdiyatî xwîn e, Êzîdiyatî damarên ku ew xwîn têde diherike.

Hevpeyvîner: Aram Hesen

## Çavkanî û Perawêz

1- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 1).

2- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43).

3- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43).

4- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rup 46).

5- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rup 48).

6- Weha hate bîra min ku peyva (takil) beramberî peyva (element) a Englîzî baş dît. Peyva (takil) li nik Mesûd Mihemed diyar dibe wek tiştekî biçûk ji nav gelek tiştan, bê ku watayeke taybet jêre diyar dike.

7- Ez naçar bûm ku du têrimên Kurdî beramberî herdû têrimên Englîzî danim ku bapekî beramberî (aspiration) tê, û babirrkî bermaberî (non-aspiration) tê, ku ev herdû têrim ligor pirose û mîkanîzima dengkirina dengan hatine drustkirin. Wilo jî hin têrimên dîtir wek paş-esmankîbûn beramberî (Velarization), û pêş-esmankîbûn beramberî (palatalization), herweha hawdengkirin beramberî (coarticulation), tengbûna sazgeha deng beramberî (glottalization), û kodengsazî beramberî (sociophonetics) tê.

8- David Crystal's Cambridge Encyclopedia of Language and Frederick J.Newmeyer's Cambridge Survey of Linguistics, published in 1987.

9- W.Bright's four-volume International Encyclopedia of Linguistics (Oxford University Press).

10- Hadumod Bussmann Routledge Dictionary of Language and Linguistics translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and New York, First published in paperback 1998 © 1996 Routledge.

11- Mihemed Mesud 1987, zarawesazî pêwane, Bexdad.

12- مسعود محمد، زاراوەسازیی پێوانە، ژمارەی سپاردنی بە کتێبخانەی میللی، 380 بەغدا: باڵو کردنەوەی لە ئینتەرنێتدا سایتی وەشانی سێیەم1988 ساڵی 2010-.2004.

| sazgeha | | lêvkî | lêvd | diran | Pidûkî | pêş | paş | zimanokeyî | gewrî | jêyî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Kospek Plosive | girr | b | | D<br>ḍ | | | g | | | |
| | kip | p<br>ṗ | | t<br>ṭ | | | k<br>ḳ | q | | |
| şkestî affricate | girr | | | | c | | | | | |
| | kip | | | | ç č | | | | | |
| xişok fricative | girr | | v | | z ź | j | ĝ | | ч | |
| | kip | | f | | s<br>ś | ş | x | | Ĥ | ə<br>h |
| bêvilok (nasal stops) | girr | m | | n<br>ŋ | | | | | | |
| rexkî/layî / انزلاقي | girr | | | | l | ļ | | | | |

jî encama hin piroseyên fîzyolojî û kodengsazî (sociophonetics) (7), durist dibe, weke: Hawdengkirin

Tengbûna sazgeha deng: A) Paş-esmankîbûn, B) Pêş-esmankîbûn

Bapekî û babirrkî, Berbêvildan.

Em ê bi kurtî van piroseyên dengsaziyê bidin naskirin, da ku em bikevin mijara xwe ya ku pabendî diyardeya stûrbûna dengan di zaraveyê Kurmancî de:

1. **Hawdengkirin** (coarticulation), ango dengkirineke hevalê ya normal e, û di ferhenga zimanvanî de weha dide naskirin: "the occurrences of sounds that correspond to speech sounds are not discrete units"(8). Ev bi xwe di baweriya min de şêweguhartineke awarte ye ku di piroseya axaftina hin dengan de di hin ziman de peyda dibe"

2. Piroseya **tengbûna sazgeha dengan** (glottalization) weha ye ku tengbûneke taybet, çi hindik û çi gelek, bi awakî ku hin guhartin dikeve deng de (irregular total or partial glottal closures, ku dengên **stûr** wek [p], [t], [k] drust dibe. Di hin ziman de dengdarin dikevin barê ku jêre (tengbûyî, glottalized) dibêjin, ango sazgeha pêş-esmank yan paş-esmank teng dibe. Li encamê, du bar têne holê: Barek heye ku jê re **(pêş-esmankîbûn)** dibêjin ango pêşîka zar bilind dibe bi aliyê pêş-esmank ve. Barê dîtir **paş-esmankîbûn** e, ango (velarization) paşîka zar bilind dibe bi awakî nêzîkî li paş-esmank dike. Bi vî awayê dengsazî, deng piçîskî tê guhartin û wek stûrbûnekê tê de çê dibe.

### 3. Xiştexaneya dabeşkirina dengên konsonatên Kurmancî

Li ber roniya şîrovekirina dengsazî ya bûrî, min jî 37 dengdarên Kurmancî di vê cedwela xwarê de dabeş kirin ku ew jî ev e:

(7)- Ez naçar bûm ku du têrimên Kurdî beramberî herdû têrimên Englîzî danim ku bapekî beramberî (aspiration) tê, û babirrkî bermaberî (non-aspiration) tê, ku ev herdû têrim ligor pirose û mîkanîzima dengkirina dengan hatine drustkirin. Wilo jî hin têrimên dîtir wek paş-esmankîbûn beramberî (Velarization), û pêş-esmankîbûn beramberî (palatalization), herweha hawdengkirin beramberî (coarticulation), tengbûna sazgeha deng beramberî (glottalization), û kodengsazî beramberî (sociophonetics) tê.

(8)- Ferhenga Roultdge.

wan re dibêjin: Dengdêr û dengdar.

Dengên ziman, weke hatiye zanîn, şêweyeke taybetî ye ji wê hewaya ku ji sîpelka mirovan derdikeve û di boriya hewayê re derbas dibe, lê ev hewaya han bi awakî fîzîkî derdikeve û li encamê şêwedengekê durist dibe, û durvekî xwe yê taybetî distênê. Ev deng dema ji qirikê tê der bi rê de pêrgî hin keleman dibe, ku ew jî: yan du deste masûlkeyên …. ku jê re (dengejê - têlên dengî) dibêjin, yan jî hewa dema ku di qirikê de derbas dibe pêrgî zimanbiçûk dibe, yan jî rexek ji zar (dawî, navîk, serî) digihê esmankê dev (pêş-esmank, nav-esmank, paş-esmank), yan zar ligel pidûwan, yan zar ligel diran, yan lêv ligel diran, yan jî tiştek ji van endaman nagihin hev, ango hewa bi hesanî ji pişikê derdikeve û derbasî dev dibe, lê berî ku ji dev derkevê, herdu lêv şêweyeke taybet durist dikin, ku ji hev vedibin, lê belê vekirina van lêvan, heye lêva jor û jêr nêzîkî hev bin, wek nîvvekirin bê, û heye dûrî hev bin. Ev şêwevekirin dengekî xwe yê taybet dirust dike, wek em bibêjin dirustkirina dengê [î] vekirina herdu lêvan ne wek ya barê dengê [a] ye. Weha jî dengên dîtir yên dengdêr, weke: û, u, e, i. ê, o. Înca, dirustkirin û dabeşkirina dengên ziman bi awayekî gîştî li ser çend fakterên corawcor radiweste ku ew jî ev in:

A) Li pêka sazgeha ku deng jê derdikeve: ji nav lêvan, yan ji bêvilê, yan ji nav diran û lêvan, yan ji gewriyê, ji zengelorê, ji dev bi gihaştina dawiya zar li gel zimanok, ji zar û esmankê nerim (paş-esmank), yan esmankê hişk (pêş-esmank), ji zar û diranan derdikeve ta ku pê tê axaftin.

B) Li pêka fîzîk û awayê derketina hewayê, ango awayê derbirrîna van dengan, ka çilo ji sazgeha xwe derdikeve: çiqas fire ye, çiqas teng e, çiqas vekirî ye. Ya dîtir jî gelo tewjima hewa ji dereke hişk dertê, yan ji dereke nerim derdikeve? Gelo hatina hewayê çiqasî xurt û bihêz e, û çiqasî bilez û sivik tê, yan giran tê?

C) Ev kartêkirinên han hemî jî şêweya deng destnîşan dikin, bo nimûne dengên ku ji teqîna bumbeyê derdikeve ne wek dengê ku ji teqîna şûşekê yan fincanekê der tê, dengê ku ji birrîna caw tê, ne weke dengê ku ji birrîna dareke hişk tê, yan dareke terr tê, ka ev hewa ji sîpelkan der tê û di dev re, yan di bêvilê re, derbas dibe ku tengbûn û girtina riya hewayê bi awayekî westaw yan teqandî/teqîw yan xişokî yan zirîngok, yan bêvilok durist dibe..htd. Ev hemî jî dibine fekterên sazkirina deng û dabeşkirina wan ku ji hev cuda dibin, her wilo jî wek fonêm têne jimartin ku her fonêmek tîpeke taybet dide, wek dengê [b], [p], [s], [v] … htd.

## Piroseyên Awartebûna Hin Dengdarên Kurdî

Dervî taybetiyên sîstîmrew, hin taybetiyên awarte di sîstîma dengsaziya ziman de kar dikin, ku hin deng şêweyeke bîjok digire, ev

Wek ku gelek zimanzanan berî niha jî dane xuyakirin ku danûstandin û hevgihaştin di navbera mirovan de bi riya ziman pêk tê, û di vê pêwendiyê de sê alî rola xwe dibînin ta ku ev pêwendî pêk were, ew jî ev in: 1. axêver, 2. kenala gihaştinê: ziman, 3. bihîzer (bîser)

## Erkên deng

Mebest ji şîrovekirina dengsazî her ew e ku takilên (element) (6) dengî di gote û riste û bêjeyên ziman de hişkere bike, van takilan li gor erkên wan dabeş bike. Eger me du goteyên Kurdî gotin: (1. Kuro, here. 2. Kuro, were. 3. Kuro, mere. 4. Kuro, dere) wa diyar dibe ku yek deng di yek tevinê de û di yek cihî de tê guhartin (h, w, m, d) û ew jî dibe sedema guhartina wate û erk û mebesta axêver, wek çawa dengê /h/ di Inglîzî de bi heman rolê radibe ku jê re rola cudakerî (distinctive function) وظيفة تمييزية dibêjin,

Di ziman de wa heye ku hin diyardeyên dengsazî hene ku pêwendî bi devok û zaravên hemecor re heye, û bi hîç awayî nabe sedema guhartina têgehiştinê yan wateya peyvê wek: hin Kurd dibêjin (mar) û hinên dîtir heman peyv dibêjin: me'er).

Weha jî (tal /te'el), (jeher / jeĥer), (jar / hejar).

Zimanvan weha dibînin ku lêkolîn di dengên ziman de pêwîstiyeke zimanevanî ye. Bo nimûne, peyva (nîne) di devoka serhedî de dibe wek (ninne) tê gotin ku dengê [î]ya dirêj hinekî kurt dibe, û hewa pirtir ji bêvilê der tê herçende ku tekez (strês) di vê peyvê de li ser birrgeya pêşî tê. Mebesta ew e ku her dengek di ziman de kirasekî taybet li xwe dike ku ji zimanên dîtir ciyawaz e.

Endamên axaftinê roleke girîng di drustkirin û sazkirina dengên ziman de dibînin. Di dengsaziyê de, sazgeha dengdaran (the point of articulation) ew cih e, ku hingaftina endamên laş ji sîstima dengkirinê bi awakî tên ser hev, û deng tê de saz dibe, ev jî navbera endamekî bizoz (active) wek zarê mirovan û endamekî rawestiyayî û pasîv wek hin deverên asmankê dev. Dengên dengdar bi alîkariya organên nerim wek zar û organên hişk wek esmankê dev, ligel awayên dengkirinê dengdar bi taybetiya xwe der tê.

Di polênkirina dengên ziman de çend pîverên dengsazî hene ku her yek bi xalekê ji ya dîtir ciyawaz e, çi bi hoya sazgeha dengkirinê, û çi bi hoya awayê dengkirinê, û çi jî bi pestin û hêza tewjima hewayê, ev hersê bar dibin hokarê hemecoriya van dengan, bo nimûne du core dengên ziman hene, ji

(6)- Weha hate bîra min ku peyva (takil) beramberî peyva (element)a Englîzî baş dît. Peyva (takil) li nik Mesûd Mihemed diyar dibe wek tiştekî biçûk ji nav gelek tiştan, bê ku watayeke taybet jêre diyar dike.

di dîrokê de ku hem dawî bi dîroka heywanî û hem jî bû despêka dîroka mirovayetiyê(1). Ev wê yekê diyar dike ku ziman e yê ku mirov ji heywan cuda dike. Inca ziman yek ji wan dahênanên herî girîng e di dîrokê de, lewra miletên dinyayê pûtedan û guhdan li zimanê xwe kirine, ku eva han jî di warê nivîsîna pirtûk û ferheng û rêziman û lêkolînan de diyar e.

Dengsazî weke zanist di sê aliyan de dabeş dibe: 1. Aliyê berhemhênana deng (phonation), 2. Aliyê ku deng tê de tê guhastin, 3. Aliyê ku deng tê de tê wergirtin (Vindris rûp 43)(2). İnca, em dikarin bibêjin ku bikarhênana ziman sê fakter tê de peyda dibin: (axêver û gote û bihîser) bi awakî dîtir (nivîser û name û xwêner).

Vindrîs pûte daye aliyê guhastina deng û lereyên ku di deng de peyda dibin wek takerekî saykolojî li nik bihîser didê(3). Zar û lêv di drustkirina zingêniya deng de roleke xwe ya karîger heye, bo nimûne awayên bilêvkirina dengên ziman li nik xelkên Cizîra Botan û Koçerên devera Silopî, bo nimûne, risteya (were, em biçin molê) ku dengkirina peyva (malê) bûye (molê), ango dengê [a] bi awakî weha derdikevê wek tu du rengan, em bibêjin, sor û şîn, li nav hev bixin, ew jî wilo piçek ji dengê [o] bi ser [a]de dikin, ku deng ne [a]ya zelal e, û ne [o] ya zelal e, heme tev li hev e, lê heman dengê [a] li nik axêverên devera Hezex ta bigihê Nisêbînê zelal derdikevê; ango ciyawazî di nav wan de diyar e, û hin caran axaftina Cizîriyan li nik xelkên dîtir dibe cihê qerf û galteyan. Her wekî Vindrîs li ser vê mijarê axiviye di awayên derkirina dengan de ku şêweya giroverkirina lêvê roleke girîng tê de dibînê, her ev jî di şanogeriya Xanedanê Bircuwazî (Bourgeois Gentil homme) de ya şanonivîsê Firansî, Moliyêr, diyar dibe ka akter çilo lêvên xwe bi awakî weha çê bike ku deng şêweyeke taybet bistêne(4). Dengên gerûyî wek [k] tê te guhartin li gor ku pişta ziman bighê paş-asmank yan pêş-asmank wek dengê [k] ya paş-asmankî ya Almanî di peyva (kub) de(5) û heman deng di Kurmancî de di peyva (ko) de.

(1)- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 1).

(2)- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43).

(3)- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43).

(4)- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rup 46).

(5)- C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rup 48).

# Dengên Zimanê Kurdî (Kurmancî) di Proseyên Dengsaziyê de

**Di polênkirina dengên ziman de çend pîverên dengsazî hene ku her yek bi xalekê ji ya dîtir ciyawaz e, çi bi hoya sazgeha dengkirinê, û çi bi hoya awayê dengkirinê, û çi jî bi pestin û hêza tewjima hewayê..**

Berzo Mehmûd*

Lêkolîn

Zana û ronakbîr û bîrmendên cîhanê bi tewawî û bi giştî giringî dane rola ziman di dîroka mirovahiyê de, weke çawa Vindrîs weha wesf dike ku dahênan û afirandina ziman bû sedema ji hev cudakirina du qunaxan

*Zimanzan Û Lêkolîner, Di sala 1956an de li Qamişloya- Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê, beşa Ziman û Wêjeya Ingilîzî li Zanîngeha Helebê xwendiye. Master di zimannasiya kurdî de li Zanîngeha Artuklo ya bajrê Mêrdînê- Bakurê Kurdistanê bi dawî kiriye, niha li swer teza xwe ya Doktora dixebite, û li zanîngeh Rojava perwerdekar e.

## Helbest 83
## Muhbeta sûrî du qism e qufl û miftah û tilism e
## Hin ji rûh in hin ji cism e nar û nûr e hin hewa ye

**Wateya peyvan: Muhbet:** Heskirin, evîn, evîndarî, dildarî. **Sûrî:** Şiklî, xeyalî, wêneyî. **Qism:** Beş, par, nifş, cure. **Qufl:** Kilît. **Miftah:** Mifte, kilîl. **Tilism:** Sêhrkirî, efsûnkirî, tişta veşartî û biraz ku her kes nikare fêm bike û bizane. **Rûh:** Giyan, can. **Cism:** Gewde, laş, beden. **Nar:** Agir. **Nûr:** Ronahî. **Hewa:** Li vir mebest dilbijîna nefsê ya zayendî ye.

**Kurtewateya malikê:** *"Ew evîna ku di dil de weke şiklekî xeyalî ye du beş e. Lê naskirina wê ne hêsan e, lewre kilîtkirî ye, bitilism e û bê kilîl jî venabe. Beşa pêşî rûhî, giyanî û nûranî ye, beşa din bedenî, madî û mecazî ye. Beşa yekê agirek e di dil de pê ketî û dil ronahî û zelal dike. Beşa duduyan hewaya nefsê ya heywanî ye ku ji dilbijîna (şehwet) ajelî tê meydanê."*

**Şîrove:** Mela, bi nîvmalika, **"Muhbeta sûrî du qism e qufl û miftah û tilism e"**, di mijara pênaseya evînê de balê dikişîne ser du xalên pir girîng. Ya yekê, evînê dike du beş, ya duduyan, bi têgîna **qufl, miftah û tilism'**ê peyama ku fêmkirin, têgihîştin, naskirin û xwegihandina rastî û kûrayiya evînê ne karekî hêsan e, dide. Kurt û cewher wiha dibêje: Pirtûka ravekirina evînê li devereke veşartî ye, deriyê wê hatiye kilîtkirin û kilîla wê jî hatiye efsûnkirin. Cî bê dîtin jî kilîl nayê dîtin, kilîl jî bê dîtin dîsa hûn nikarin xwe bigihînînê, lewre bitilism e û ji aliyê pisporan ve hatiye efsûnkirin. Bi nîvmalika, **"Hin ji rûh in hin ji cism e nar û nûr e hin hewa ye"**, bi awayekî balkêş naveroka her du beşan jî wiha rave dike: Beşa yekê ya evînê giyanî ye û li ber çavan nayê dîtin. Lewre agirekî di hundirê dil de ye û ew agir wî dilî wisa paqij dike, ronahiyeke wisa lê belav dike, ku tiştên ti çav nebînin ew dibîne. Beşa duduyan jî evîneke bedenî û dilbijîneke heywanî ye. Wê bidome.

**Çavkanî**

- Mele Ehmedê Zivingî, Gerdeniya Gewherî, Stenbol: Avesta (2013).

**“Min ji ewwel qet nezanî agirek sûzan e ‘işq**
**Ateş û pêt û şerar e agir û nîran e ‘işq**

**Gîr û Tersa û Yehûd e kafir e ateşperest**
**Hem Mecûs e hem wesen bêdîn û bêîman e ‘işq”**

Mela di malika li jêrê de jî hem behsa zehmetiya evînê dike, hem dermanê wê destnîşan dike:

**Helbest 83**
**‘Işq-i derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e**
**Kuştime cewra reqîb e pur le’înê rûsiya ye**

**Wateya peyvan: Tebîb:** Bijîşk, doktor. **Mufa:** Mifa, derman, çare, sûd. **Wesl:** Gihîştin. Hebîb: Dildar, heskirî. **Cewr:** Zor, zordarî. **Reqîb:** Hember, dijber, çavdêr, çavnebar. **Pur:** Pir, gelek, zehf. **Le’în:** Kesê Xwedê jê hêrs bûyî, şeytan. **Rûsiya:** Rûreş. Ji rû û siya (reş) çêbûye.

**Kurtewateya malikê:** *“Evîn derdekî wisa ye ku ne bijîşkê wê ne jî dermanê wê heye. Ji bilî gihîştina deldarê/dildarî riyeke din nîne. Lê ji ber xirabî, neqencî û zordariyê dijberê min ku rûreşekî Xwedêjêxeyidî ye, ew gihîştin jî pêk nayê û vê rewşê ez kuştime.”*

**Şîrove:** Mela, bi nîvmalika, **‘Işq-i derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e”** careke din behsa zehmetiya evînê dike û dibêje, evîn derdekî wisa ye ku bijîşk jî nikarin derman jê re peyda bikin, lewre ji gihîştina dildarê pêve heta niha ti çare nehatine dîtin. Bi nîvmalika, **“Kuştime cewra reqîb e pur le’înê rûsiya ye”** behsa zehmetiya dîdara dildarê dike û dibêje, dijberê min yê Xwedê xezaba xwe lê kîrî û li vê dinyayê jî rûreş kirî, (yan şeytan e, yan jî kesekî taybetiyên wî yên şeytên in) ku nahêle bigihim dildara xwe pir serdest û pir zordar e, ji ber wê hêza min lê nabire. Piştî ravekirina zehmetiyên evînê, di malika li jêrê de pênaseya evînê dike û dabeş dike:

rût ya dildarê ranabin. Lewre derman di şerbeta lêvên wê de ye. Mirov dikare vê malikê bi du rengan şîrove bike. Eger mebest jê dildara mecazî (ango mirov) be wate wiha dibe: Heta ku evîndar û dildar negihin hev û şîraniya lêvan ya weke şerebetê neyê vexwarin, ew derd û kul naqedin. Eger mebest ji evînê evîna heqîqî be (ango evîna afirînerê hebûnê) wê demê wate wiha dibe: Heta evîndar ji wê ava jiyanê ya her heyî û wê her hebe venexwe ne pêkan e ku birînên wî baş bibin. Heman nêrîna xwe di malika li jêrê de jî didomîne:

**Helbest 83**
**Her dilê sotî bi ulfê yar ne derman kit bi zulfê**
**Ta ebed ew bend di qulfê 'işqi derdek bêdewa ye**

**Wateya peyvan: Sotî:** Yê şewitî. **Ulf:** Evîn, heskirin, meylkirin, evîndarî. **Yar:** Dildar, heskirî. **Kit:** Bike. **Zulf:** Bisk, mûyên pora ser. **Ta:** Heta. **Ebed:** Her û her, heta hetayê. **Bend:** Bende, benî, kole, dîlê girêdayî. **Qulf:** Kilît. Mebest jê yan qulfa qeyda lingan yan ya zindanê ye. **Dewa:** Derman.

**Kurtewateya malikê:** *"Çi dilê ji ber evînê şewitî heta ku dildar bi bisk û temeriyên xwe wan birînan derman neke û bi ser birînan ve nebe neyne, wê heta hetayê di wê zindana evînê ya kilîtkirî de, yan di wê kilîta qeyda evînê de û di nava wî agirî de wisa Bêderman bimîne. Lewre evîn derdekî bêderman e. Eger zulf ji Erebî hatibe girtin, ku tê wateya nêzîkbûn û nêzîkkirinê, wê demê wate wiha dibe: Heta ku dildar evîndarê xwe bi nêzîkkirina cem xwe derman neke wê her tim wisa girtî û girêdayî bimîne."*

**Şîrove:** Di vê malikê de jî Mela têgîna **dil, sotin, ulf** (heskirin)**, derman, zulf, qulf, ebed, bend** (dîl) û **dewa** (derman) li pey hev bi kar anîne. Mirov dikare van têgînan bike sê beş. Beşek (dil, 'işq, ulf, zulf, yar) li ber çavan erênî û dilruba xuya dikin, lê dibin sedema encameke pir giran û xedar. Beşek (sotin, derd, qulf, ebed, bend, bêdewa) bi bihîstina wan lerz dikeve dilê mirovan, ku encama beşa yekê ne. Beşa din (derman) digel ku hêviyê dide lê di dawiyê de dibêje, ew derman jî peyda nabe. Dema mirov li naveroka van têgînan baş tê bigihe mirov wê baştir fêm bike ka Mela dixwaze li ser evînê çi bibêje û danasîneke çawa jê re dike. Çawa ku Perto/Pertew Begê Hekarî jî di helbesteke xwe de evînê wiha pênase dike:

**Helbest 83**
**Muhbetê mihnet di zor in hub dibêm bêşek bela ye**
**'Umr û jî pê xweş diborin sotin û derd û cefa ye**

**Wateya peyvan: Muhbet:** Heskirin, evîn, evîndarî, dildarî. **Mihnet:** Êş, zehmetî, derd, kul. **Hub:** Heskirin, evîn. **Dibêm:** Dibêjim. **Bêşek:** Bêguman. **Bela:** Tiştên ne baş, bûyerên xirab. **Umr:** Teman, jî. **Sotin:** Şewitîn. **Cefa:** Êş, azar, jan, zehmetî.

**Kurtewateya malikê:** "*Êş, azar û zehmetiyên evînê pir in û dibêjim bêguman tev bela ye. Lê digel wê, temenê mirovan jî pê xweş derbas dibe. Lewre ji ber şewat, derd û kulên wê, mirov pê nahese ka êş û zehmetiyên dinyayê çawa derbas dibin.*"

**Şîrove:** Mela, bi nîvmalika, **"Muhbetê mihnet di zor in hub dibêm bêşek bela ye"**, balê dikişîne ser zehmetî û pirsgirêka evînê. Bi gotina **'muhbetê mihnet di zor in,'** dibêje, mijara evînê çawa ku hûn texmîn dikin ne ewqas tenê ye, pir zor e û pir dijwar e. Bi gotina **'hub dibêm bêşek bela ye'** evînê ji mijara zor û zehmetiyê wirvetir dibe, dibêje, ez bêguman im ku evîn ne pirsgirêkeke ji pirsgirêkan e, **bela** bixwe ye. Têgîna **bela** bi taybetî neqandiye û bi kar aniye. Lewre di nava civakê de ji bo pirsgirêkên herî xedar, herî dijwar, çareseriya wan pir zehmet û mirov nikaribe ji navê derkeve têgîna bela bi kar tê. Vêca belaya bidohn jî heye. Xuya dike mebesta wî ew bela ye. Di malika li jêrê de jî behsa hem zehmetî hem çareseriya evînê dike:

**Helbest 83**
**Sotin û derdê evînê 'illetê dax û birînê**
**Xweş dibin ma ew bi dînê şerbeta lêvan mufa ye**

**Wateya peyvan: Sotin:** Şewitîn. **'Illet:** nexweşî, derd, êş. Dax: Birînên bi şewatê çêdibin. **Dîn:** Dîtin. **Mufa:** Mifa, derman, çare, sûd.

**Kurtewateya malikê:** *"Ew şewat û jana ji ber evînê çêdibin û derd û kulên ji ber dax û birînên wê di mirovan de peyda dibin, ma bi dîtina dildarê tenê derman dibin? Na, tişteke wisa ne bûye û ne jî dibe, lewre dermanê van êşan şerbeta lêvên dildarê ye."*

**Şîrove:** Mela di vê malikê de têgînên herî giran; **derd, 'illet, dax** û **birînê** ji bo evînê bi kar anîne. Piştre jî dibêje, ev êşên evqas giran bi dîtineke

Lêkolîn

*gihîştin birca kêvjalê.)* Weke din di jiyana civakan de ji dîrokê heta were roja îro mûzîk hêmaneke pir girîng e. Çawa ku tê zanîn di Şamanîzmê de -ku dînê herî kevnar e- mûzîk -bi taybetî dahol- bingehê wî dînî ye. Gelek mirovên feylesof û navdar jî girîngiyeke mezin dane mûzîkê. Konfûçyûs dibêje, mûzîk ahenga di navbera erd û ezmanan de ye. Luther: Tovê fezîletê yê di dil de bi mûzîkê şîn dibe. Cervantes: Ciyê mûzîk lê hebe li wir xirabî nabe. Di nîvmalika, "**Kê 'işq asan nimûd ewwel welî uftad-i muşkilha"**, bersiva pirsa xwe dide û dibêje, mûzîkê ev gotiye û vê dibêje: Destpêka evînê hêsan e, lê dawiya wê bi kul û derd e. Di malika li jêrê de jî behsa raz û sira evînê dike:

**Helbest 34**
**Tu j'Melayî her bipirs esrarê 'işqê hel dikit**
**Vê mu'emmayê çi zanin sed mela û mûste'îd**

**Wateya peyvan: Esrar:** Pirjmariya sir'ê, raz, veşartî, nihênî, tiştên bitilsim. **Hel:** Çareserkirin. **Dikit:** Dike. Mû'emma: Tiştên ku her kes nizane, tiştên zehmet û tevlîhev, **Mûsteîd:** Feqiyên li ber standina îcazeya (destûrnameya) melatiyê.

**Kurtewateya malikê:** *"Eger tu pirsa evînê bikî here ji Melayê Cizîrî bipirse. Lewre yê ku bikare raz û pirsgirêka evînê çareser bike ew e. Ku ne ew be tu sed mela û yên li ber îcazeyê bînî wê ji vê pirsgirêka evînê fêm nekin û nizanibin ka çi tişt e."*

**Şîrove:** Mela, di nîvmalika, **"Tu j'Melayî her bipirs esrarê 'işqê hel dikit"** de, balê dikişîne ser du mijaran. Ya yekê, ku dibêje **'esrarê 'işqê'** diyar dike ku evîn mijareke bi raz û pirsgirêk e, her kes nikare jê fêm bike û ji navê derkeve. Bi rastî jî gelek kesên zanyar hem evîn pênase, hem di warê sosyolojî, psîkolojî û çandî de şîroveyên dirêj kirine. Mînak, Sigmund Freud dibêje: Çavkaniya her rengê heskirin û evînê hestê zayendî (cinsî) ye. Lê ji ber vê şîroveya xwe pir hatiye rexnekirin. Psîkanalîst Erich From jî heskirinê wiha şîrove dike: Heskirin ji bo pirsgirêkên mirovahiyê bersiv, ji bo hêza afirîner enerjî û huner e. Herwiha heskirinê dike pênc beş. Heskirina xwîşk û biratiyê, heskirina dayîktiyê, heskirina zayendî, heskirina cewherî û heskirina afirînerê hebûnê. Bi gotina, tu ji Melê bipirse ew dikare çareser bike, bi awayekî jixwebawer dibêje, yê ku bikare vê pirsgirêkê çareser bike ez im. Ji bilî min tu sed mela û nîvmelayan bînî wê nikaribin bersiva te bidin. Di malika li jêrê de jî bi rengekî din pênaseya evînê dike:

ziman. Bi kurtayî, eger bê gotin Mela **teftezan** e û deryaya wateyan e, wê pir di cî de be. Hin nivîskar hene ku tu pirtûkên wan tevan biguvêşî dilopek ji wan nakeve. Lê di berhema Cizîrî de peyv û têgîn ewqas watebarkirî ne, ewqas watedar in, ku mirov hema serê tiliya xwe ya qilîçikê bide yekê wê bi dehan wateyên zêrîn jê biweşin. Çawa ku her herf têgîneke bi serê xwe be. Heta mirov dibêje qey dest, pê û guhên herfan hene û bi her tiliyekê, bi her guhekî ve wateyên bitilisim girê dane.

Melayê Cizîrî her çenda dîwana wî ya helbestan e, lê di helbestên xwe de ji bo gelek qadên jiyanê nêrîn û hişmendiya xwe anîne ziman û gelek xalên girîng destnîşan kirine. Ez dixwazim di vê jimarê de li ser nêrîna wî ya derbarê evînê de rawestim. Hin dibêjin ji yekê hes kiriye û bûye evîndarê wê, hin dibêjin evîna wî îlahî ye. Lê ya herî rast em li nêrîna wî bixwe binêrin. Lewre wî bixwe bersiva vê pirsê û ya gelek pirsên din jî daye. Di dîrokê de gelek kesan evîn pênase kiriye û dabeş jî kirine. Em binêrin ka seydayê Cizîrî bi kîjan çavî û kîjan hişmendiyê evîn nirxandiye, çawa pênase kiriye û bi çi rengî dabeş kiriye:

**Helbest 1**
**Dizanî rûd û ûd ewwel çi tavêtin surûd ewwel**
**Kê 'işq asan nimûd ewwel welî uftadi muşkilha**

**Wateya peyvan: Rûd, ûd:** Du amûrên mûzîkê ne. Mebest jê dengê mûzîkê tev e. **Ewwel:** Destpêkê, berî her tiştî. **Surûd:** Awaz, nexme, stiran, dengê mûzîkê. **Kê:** Ku. **'Işq:** Evîn, heskirin. **Asan:** Hêsan, rihet, bê pirsgirêk. **Nimûd:** Xuyakirin, diyarkirin. **Welî:** Lêbelê. **Uftad:** Ketin. **Muşkil:** Kêşe, pirsgirêk. **Ha:** An. Ji bo piraneyê ye.

**Kurtewateya malikê:** *"Tu dizanî ka rûd û ûdê destpêkê çi awaz derxistine û çi gotine? Ev gotine: Evîn pêşî bi hêsanî dest pê dike lêbelê piştre zor û zehmetiyên wê derdikevin."*

**Şîrove:** Cizîrî bi nîvmalika, **"Dizanî rûd û ûd ewwel çi tavêtin surûd ewwel"**, balê dikişîne ser girîngî û tilisma evînê. Dibêje, gelo we hîç mereq kiriye, yan hûn dizanin ka dengê destpêkê ji mûzîkê derketî û derdikeve çi ye? Li vir pirseke girîng derdikeve pêşiya me. Gelo çima ji her tiştî behsa dengê mûzîkê kiriye? Mirov dikare bi çend gotinan bersivê bide. Ya yekê, pir girîngî daye mûzîkê. Jixwe helbesta xwe ya destpêkê bi mûzîkê dest pê kiriye: **"Newaya mutrib û çengê fixan avête xerçengê"**. *(Deng û awazên stiranbêj bi çengê re bilind bûn heta*

bûye. Rojhilatnasê Almanî Martin Hartmann jî sala 1904'an dîwana wî li Berlînê daye çapkirin û bi zimanê Almanî pêşekek jî jê re nivîsiye. Balkêş e, yê destpêkê Cizîrî bala wî kişandî û lê xwedî derketî ne Kurd, kesekî biyanî ye. Ev jî rewşa mîr û serokên Kurdan ya derbarê xwedîderneketina li zana û rewşenbîrên Kurd de, radixe ber çavan. Jixwe feylesof, zanyar û rewşenbîrê mezin Ehmedê Xanî ev rewş pir baş dîtiye, ji ber wê derbarê mîrê Kurdan de -ku li zanayên Kurd xwedî derneketiye-, wiha dibêje: **"Lê 'hakimê weqtê me'rifetnak, mesmû'i nekir bi sem'ê idrak".** *(Lê mîrê serdemê yê xwedîzanyarî û xwedîtore bi guhê têgihîştinê guhdarî nekir. Yan jî nexwest têbigihîje.)* Ji bo berhema xwe Mem û Zînê dibêje.

Di kovara **Şermola** de min çend xelek li ser Ehmedê Xanî nivîsîn. Niha jî dixwazim bi heman rêbazê li ser Melayê Cizîrî binivîsim. Yek ji sedemên nivîsa min ew e ku me Kurdan hê Cizîrî baş nas nekiriye. Aliyê wî yê wêjeyî tenê hatiye naskirin, lê ew jî pir kêm. Aliyên wî yên din yan nayên zanîn yan jî pir kêm tên zanîn. Dema tê gotin **Melayê Cizîrî** helbestên wî tên bîra mirovan. Halbiku wêjevaniya wî beşek ji taybetî, huner û zanyariya wî ye. Mela rewşenbîrê dema xwe ye, zanyar e. Ku ew bixwe jî di helbesteke xwe de dibêje; **"Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand. 'Arifê weqt im û Me'rûfi bila bête ji Kerx."** *(Em ji rawestan û çavnêriya vekirina deriyê zanînê kerixîn, lê di dawiyê de me bi rastî û jidil perde çirandin û em bûn zanayê serdema xwe. Fermo bila şêx Me'rûfê Kerxî ji Kerxa xwe were da em zanîna xwe bidin ber hev.)* Feylesof e. Di helbesteke din de wiha dibêje: **"'Alem çi ye i'rab û hurûf û kelîmat in. Ew nuqte û di nefsa xwe me'na yim ez."** *{Ma cîhan çi ye, hereke (ser, ber, cir û cezm), herf û peyv in û tev jî ji xalekê peyda û zêde bûne. Wateya wan jî ez im.}* Ji astronomiyê fêm dike. Derbarê wêjevanî û helbestvaniyê de mohra xwe li dîrokê daye û di dilê Kurdan de navê xwe bi xetên zêrîn nivîsiye. Çawa ku di helbesteke xwe de dibêje, **"Ger lu'luê mensûr-i ji nezmê tu dixwazî, wer şi'rê Melê bîn, te bi Şîraz-i çi hacet".** *(Eger tu bixwazî helbestên weke mirariyên libolibo û ristekirî bibînî, fermo were helbestên Melê bibîne. çi hewceyî çûna Şîrazê ye.)* Welatperwerekî mezin e. Bi helbesta, **"Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin. Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî"**, *(Ne Tebrîz û Kurdistan tenê di binê desthilatiya te de bin, bila sed şahên weke yê herêma Xuresanê li ber fermanên te bin.)* hesreta xwe ya ji bo Kurdistana mezin diyar kiriye. Jixwe nivîsa Dîwaneyê berî çar sed salan bi zimanê Kurdî, ji welatperweriya wî ya kûr tê. Malê dinyayê daye aliyekî û li pey wate û rastiyê ketiye. Bi malika, **"Minnet ji Xudayê ku bi 'ebdê xwo Melayî, iksirê xemê 'işqê, ne dînar û direm da"**, *(Spasdar û minetdarê Xwedê me ku derd û kulên wê evîna weke iksirê dane bendeyê xwe Melê, ne diravên ji zûr û zîv.)* dilfirehiya xwe çi xweş aniye

■ Melayê Cizîrî



xwendiye û herî dawî li herêma Amedê îcazeya xwe (destûrnameya melatiyê) standiye. Piştî standina îcazeyê li Heskîfê pişt re jî li Cizîrê li Medreseya Sor dersa feqiyan dide. Her li wir koça dawî dike. Ji helbestên wî tê zanîn ku hevdemê mîrê Cizîrê Mîr Umadiddîn û helbestvanê navdar Feqiyê Teyran e. Derbarê wî de hin dibêjin dema li Heskîfê, bûye evîndarê keça mîr, hin jî dibêjin li Cizîrê bûye evîndarê keçeke mîran. Di helbestên wî de carekê navê Selma derbas dibe; silavan jê re dişîne lê ka kî ye diyar nekiriye. Lê gelek kes dibêjin evîndariya wî îlahî ye. Bûye evîndarê afirînerê hebûnê. Li gorî agahiyên li ber destan, di salên 1570-1640, yan jî 1589-1664'an de jiyaye.

Melayê Cizîrî li her çar parçeyên Kurdistanê ciyê heskirin, rÊzîdarî û serbilindiyê ye. Bi taybetî di qada wêjeyê de bûye çavkaniya sirûş û ilhamê. Lê ne li Kurdistanê tenê, bi berhema xwe ya bêhempa û bitilisim, bala biyaniyan jî kişandiye ser xwe. Rojhilatnasê Rûsî August Jaba di pirtûka xwe ya li ser Kurdan de behsa Cizîrî dike û dibêje, di navabera salên 1145-1160'î de sax

# Melayê Cizîrî û Pênaseya Evînê -1-



Diyar Bohtî*

**Beşa yekê ya evînê giyanî ye û li ber çavan nayê dîtin. Lewre agirekî di hundirê dil de ye û ew agir wî dilî wisa paqij dike, ronahiyeke wisa lê belav dike, ku tiştên ti çav nebînin ew dibîne...**

Lêkolîn

## Kurtejiyana Melayê Cizîrî

Navê wî Ehmed e. Li Cizîra Bohta hatiye dinyayê. Nasnavê wî yê navdar Melayê Cizîrî ye. Di dîwana xwe de nasnavekî din jî bi kar aniye ku ew jî Nîşanî ye. Navê bavê wî Mihemed e. Ji bilî Cizîrê li gelek medreseyên Kurdistanê

*Nivîskar û rojnamevan, sala 1958an li herêma Bohta ya bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Bi giştî ev 20 sal in li ser hev di karê ragihandin û çapemeniyê de dixebite. Herwiha di ber karê xwe re xebata ziman û wêjeya kurdî jî dike. Çend pirtûkên wî (roman, helbest, biwêj) hetine çapkirin.

li Çarşema serê Nîsanê
Melek Adî dikare
Înkara bînê ser rêya îmanê
41. Înkar dişikdarin
Xafil dikifarin
Li axretê di bêzar in
Ciyê bo wan vejawertî
Dojeya û nar in
42. Înkar çendî bi înkir e
Û xafil çendî bi kifir e
Li axretê cûr û cezaya wî zêdetire
43. Hûn binêrin li heqîqetê
yê tijiye ji îbadetê û marîfetê
mixabin hûn xwe bidine
alî ji ber navê we tê
44. Çarşem roja sulhetê
Hincî li xwe bibînê îdaretê
Çarşem roja şefaetê
45 . Heke te divê ji serê xwe rakê core
Zadekî li Çarşemê bide dore
Tawisî-Melek yê xefûr e
Ew nûr e li ser nûr e
46. Çarşem rojeke giran e
Hincî ruha bi ol û edeb û erkan e
Ew dê hola xwe bibe ber holan e
47. Dibêjime we gelî Êzîdiyane
xelata Tawisî-Melek bi gelek rengan e
xîreta dînî serê hemûwan e
temametî vî qewlî li navê Xwedê
û Tawisî-Melekê Mêran e

**(Yê temam xwedê ye)**

30. Ya Tawisî-Melek
Te ev dunya bi pîranî kir
Karê pîranî te qebûl kir
Karê bê pîranî te hinda kir
31. Hat Çarşema qere
Dûa ji Melekê Ekber e
Karê bi pîranî çeser e
32. Hat qira Çarşema ya qira
Hincî girîvanê heqiyê li ber e
Tawisî-Melek jê re mefer e
33. Hat Çarşema fere
Xelat ji Melekê faxir e
Bo riha bi îmanê gurî dike çire
34. Çarşem rojeke bi xwedan e
Dibêjim we gelî Êzîdiyan e
Tawisî-Melek ji mere şehde û îman e
35. Carçem rojeke pak e
Hincî farîq bû ji mak e
Xaliq hemûya dê wefak e
36. Çarşem rojeke bi nîşan e
Hincî bigire qedrê dayîk û baban e
merkeba wî li behrê giran her û her yê melevan e
37. Çarşem rojeke emîn e
Ezîz Tawisî-Melekê min navê şêrîn e
Bi navê Melek Şerfedîn bû dîn e
38. Dîn e û şek tê nîne
Kesê dibêjê we nîne
Melek Şerfedîn sirra eniya wî distîne
39. Ya Melek Şerfedînê min yê her û herî
Tu bide xatira Ered û ezman û dar û berî
Tu me nekî tengaviyê û zû li banga me werî
40. Tu li banga me werî û Lalişa Nûranî

Bihar xemilandibû
Ji kesik, sor, spî û zer e
Me pê xemilandibû ser dere
21. Hincî ser dera bixemilîne
Bila pirsiyar bike ev ji ber çîne
Ev xelata Tawisî-Melek û Siltan Êzîn e
22. Dibêjime we gelî sunniye
Hêviya li çarşemê zor hêvî ye
hincî ferzên heqîqetê bînê ciye
23. Dibêjim we gelî Sunetê
Li şeva Çarşemê
Nefsê nebin şehwetê
Ji ber xatira Axretê
24. Heke hûn digerin axretê
Li Çarşemê xwe dûr bikin ji xeletê
Da we bixwînin baxê Cinetê
25. Dibêjme we heqîqetê
Hûn sisit nebin li îbadat û marîfetê
Tawisî-Melek didê we qiwetê
26. Qiwet ji îman e
îman bi nîşan e
Tok, Meftûl, simbêl û girîvan e
Ev in nîşana me Êzîdiyan e
27. Hincî bi îmanê xwe nas kir
Li Çarşema serê nîsanê daxwaz kir
Tawisî-Melek ew riha xelat kir
28. Hat Çarşema ewilî
Dir bi renga xemilî
Ev dunya pê dikemilî
29. Hat Çarşema faxirî
Ya Tawisî-Melek tu yî qadir î,
Te pîranî dahir kir
Û kire rikin ji ewilî

Û her dozdeh mehayê
Tu me li fecrê ji xewê rakê
Ta bikin îbadetê û dûayê
11. Îbadet li me yê fere
Piris bikin ji Derwêşan û Qelendere
Ka Çarşem çendî bi xatire
12. Derwêş û Qelendir di safîne
Ji îmanê yê bi ronahî ne
Li Çarşeman di serdayî ne (Sewdayîne)
13. Hatin serdayîn  li Çarşeman
Daxwaz kirin ji Melekê Rehman
Rihê zalima bavêne  dojehê û devê maran
14. Hinciyê navê Tawisî-Melek bîne
Yê fere pîroziya Çarşemê yê bisediqîne
Tawisî-Melek ruha wî dê ji qeda û bela bisitrîne
15. Hincî wacibê Çarşemê bînê ciye
Borê xwe hefsarkê li hemû ciya
Êqîn Tawisî-Melek jê raziye
16. Wacibê Çarşemê yê li me fere
Nekin li Çarşemê çi ziyan û zerere
Da bi cehwer bin li dîwan û mehdere
17. Li mehdera deng bike
Çarşema serê Nîsanê reng bike
Emelê xwe safî bike
18. li Çarşemê emel xweş tê
Ji xêrê, ji xilmetê
Ji xîretê, ji îbadetê
Xwesika bi wî riha
Bi çî bînê nesîhetê
19. Hat Çarşema Sor e
Nîsan xemilandibû bi xwe re
Ji batinê dê yê bi Mor e
20. Hat Çarşema Sor û Zer e

Melek Fexredîn afrandibû ji eşiq û dil e
Nas nedikir rihê çi xafil e
2. Çarşem rojeke bi hesab e
Ji ba Meleka hatiya ev cewab e
Deriyê xêran vekirî ne
Ji Rojhilat heta Rojava
3. li Çarşemê birîbû kiras e
Ji me re dana ye ev esas e
Nabê li çarşemê xwe ji Tokê bikê xelas e
4. Çarşem rojeke Xas e
Hincî sê riknên îmanê bo xwe bikê esas e
Tawisî-Melek yê qadir e
Wî ji agirê dojê bikê xelas e
5 . Li Çarşemê xweş bû jiyan e
Kesek bûn deşt û çiya, zevî û zozan e
hemû bi kerema Petşê min yê Ezdan e
6. Çarşem ji me re gelek e
hindî hene siûd û felek e
Hemû yê bi destê Tawisî-Melek e
7. Dema li çarşemê dibe sibê de
îbadetê ji Xwedê re bike bi taqet û zêde
Tawisî-Melek li te dike fêde
8. Dema li Çarşemê roj hiltiye
Hincî Mêrê zû rabê
Ji xewa berê sibê ye
Medih û sena bike ji bo navê Xwedê ye
Dûaya Tawisî-Melek yê lê ye
9. Tawisî-Melek
Yê rêber e, yê serwer e,
Ew melekê her û her e
Ew dizanê li vê dinyayê çend qender
Ax û Av û Ba û Agir e
10. Ya Tawisî-Melek
Tu Melekê axretê û dinyayê
Tu bidê xatirê Çarşemê

# Qewlê Çarşemê

**Komkirin:**
**Şemo Qasim Dinanî**

**Tîpguhêzî:**
**Nesîm Şemo û Rojda Silo**



**Bi destûrî Xweda**

1. Çarşem rojeke fadil e

*__Şemo Qasim Dinanî:__ Lêkolînerê karûbarên Êzîdiyan û berpirsê beşa çandê li navenda Laliş ye.

*__Nesîm Şemo:__ Li Zanîngeha Rojava- Fakulteya Zanistên Olî; Perpirsê Beşa Ola Êzîdiyan e, her weha berpirsê komîteya amadekirina bernameya xwendinê ya Êzîdiyan e.

*__Rojda Silo:__ ji bajarê Tirbespiyê ye. Xwendekara Zanîngehê ye - Endazyariya avakirinê dixwîne.

Demokratîk?. Kê mafê rêvebirina civak û emlakên Êzidîyan daye destê Êzîdîyan wekî Civaka Demokratîk?.

Êzîdî niha li Rojava cihê xwe di nava sazî û dezgehên Xweseriyê de digrin. Ew ji bo mafên xwe gelek pêşinyaran didin. Ji bo bicihanîna mafên ku di warê teyorî de hatine erêkirin, rojane tekoşîneke demokratîk dikin.

Civaka Êzîdî xwe mîna beşeke ji projeya Xweseriyê nas dike. Her wiha hêzên YPG, YPJ û QSDê mîna hêzên parastina fermî qebûl dike. Ew xwe di projeya biratiya gelan û felsefeya civaka demokratîk de dibînin.

Li gorî tecrubeya salên derbasbûyî, civka Êzîdî dikarîbû xwe birêxsitin bike û yekîtiya hemû beşên xwe yên siyasî û fikirî ava bike. Ev xwe birêxistinkirin di avakirina Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê (YÊS) de bi encam bû. Niha YÊS wek mezintrîn sîwana Êzîdiyên Sûriyeyê tê nasîn. Di hemû dîroka Êzîdiyan li Sûriyeyê de, ev yekem care ku Êzîdî xwe di yek rêxistina siyasî de dicivînin ser hev û ji bo mafên xwe têdikoşin. YÊS nûnera Êzîdiyên Rojava û Sûriyeyê ye û ew xwe mîna beşekê ji Xweseriyê dibîne û destkeftiyên vê Xweseriyê yên xwe dibîne.

Îro Êzîdî xwe li hemberî berpirsyareke dîrokî dibînin. Li ser hebûna wan ya li Rojava û Sûriyeyê metrisiyeke mezin heye. Ew rastî êrîşa rêxistinên terorîst û dagirkeriya dewleta Tirk hatine. Di sala 2018'an de dewleta Tirk û hevalbendên wê yên terorîst êrîşî Efrîn û di sala 2019'an de êrîşî Serê kaniyê kirin. Ev herdu herêmên ku bi dehhezaran Êzîdî li wan dijyan û bi dehan gundên wan hebûn, ji aliyê dewleta Tirk a ku terora dewletê pêk tîne, hatine dagirkirin. Êzîdî hatin kuştin û derbiderkirin. Îroj, erka herî sereke li pêşiya Êzîdiyan, rizgarkirina van herêman e û vegera wan a bi ser xaka Rojava ve ye. Êzîdî hemû derfet û imkanên xwe dixin bin xizmeta Xweseriya Rojava ya ku rizgarkirina van herêman, mîna armanca xwe ya sereke dibîne.

Di têkoşîna ji bo damezrandina Sûriyeke demokratîk de, Êzîdî xwe xwedî rolek mezin dibînin. Ew dixwazin welatekî azad û demokrat bibînin, ku hemû pêkhate tê de xwedî heman maf bin. Divê nasname û taybetmendiyên Êzîdiyan bêne naskirin. Êzîdî xwe mîna hêzeke guhertinê ji bo avakirina sîstemeke demokrat û wekhev li Şamê, didin nasîn. Ew cihê xwe li gel hemû hêzên demokratîk dibînin û hemû şêweyên nijadperestî û mezehebî red dikin.

Êzîdî îro xwe komî ser hev dikin û xwe bi rêxsitin dikin. Ew rizgariya Êfrîn û Serê kaniyê, xurtkirina Rojava û bicihkirina mafên xwe esas digrin. Ew hêzeke guhertina demokratîk in û destê biratiyê dirêjî her hêzek demokrat dikin.

■ Xwepêşandana Êzîdiyên Helebê, ji bo redkirina fermanên li dijî Êzîdiyan, û dijî dagirkeriya Tirk.

hêzên civaka demokratîk, civak û gel li hemberî êrîşên terorîstan parastin û ji aliyekî din ve jî, saziyên civakî di bin siya Rêveberiya Xweser de hatin avakirin. Ev destkeftî li ser esasê felsefeya civaka demokratîk a ku birêz Abdullah Ocelan wek çareseriyeke dîrokî ji bo tevahiya gelên heremê daniye, hate pêşxistin.

Eger em li dîroka hebûna Êzîdyan li Sûriyeyê di sedsala derbasbûyî de ta destpêka aloziyên sala 2011'an de vegerin, em ê bibînin ku ji bilî dema dagirkeriya Fransa, tu carî nav û mafên Êzîdiyan nehatine ziman û hebûna wan nehatiye naskirin. Hemû hikûmetên hatine ser desthilatdariya Sûriyeyê, civak û ola Êzîdî ne ji aliyê neteweyî ve, ne jî ji aliyê olî ve, nasnekirine. Saziyên dewleta Sûriyeyê di gelek caran de ola Êzîdiyatiyê mîna "beşek ji Islamê" diyar kiriye an jî hin caran mîna "Xwedênenas" daye xuya kirin!.

Dema Xweseriya Rojava ava bû, rastiya civak û ola Êzîdiyan hat eşkerekirin. Saziyên Xweseriyê rastî û cewherê Êzîdiyatiyê lêkolîn kir û ji bo hemû cîhanê diyar kir. Êzîdî û Êzîdiyatî wek rastî û bi taybetmendiya xwe ya neteweyî û olî derketin pêşberî cîhanê. Civaka Êzîdî cara yekem li Sûriyeyê rastî rêvebieriyeke dadmend hat. Li ser bingeha felsefeya civaka demokratîk Êzîdiyan jiyaneke azad dîtin.

Êzîdiyên Rojava xwedî li Xweseriyê û hêzên parastina wê derketin. Xwe mîna xwediyê vê şoreşê dîtin û li gel hemû pêkhateyan kozika xweparastin û avakirinê girtin. Êzîdiyan xwîna xwe dan, ji bo xwe û birayên xwe yên din biparêzin. Êzîdiyan xwîna xwe ji bo avdan û geşpêdana Dara Hêviyan rijandin (Dara Hêvîyan an jî Dara Mirada, ku yek ji pîroziyên ola Êzîdiyatiyê ye ).

Ev gotinên ez rêz dikim, ne propaganda ne, lê rastiyên jiyana rojane ne. Ma gelo kê berî Civaka Demokratîk a Rojava ola Êzîdî wek oleke serbixwe û bingehîn naskiriye û di destûra xwe de bi cih kiriye?. Kê mafê kota di saziyan de bi fermî daye Êzîdîyan ji bilî Civaka

dijberên desthilatdariya Esed de, diyar bû. Her çiqas ku rêxsitina Birayên Misilman û hevalbendên wê xwestin rengê muxalefeta demokrat bidin xwe, lê nikarîbûn û vê yekê jî metersiyeke mezin li cem civaka Êzîdî peyda kir.

Civaka Êzîdî yek ji kevintrîn pêkhateyên Sûriyeyê ye. Şûnmayên wê bi hezarên salan kevin in û ev yek di dîtinên arkeolojîk de tekez dibe, lê mixabin bi destpêka aloziyên sala 2011'an, hijmara Êzîdiyan li Sûriyeyê kêmtir bû. Ji xwe berê jî bi dehan ferman bi ser Êzîdiyan de hatibûn û di encamên êrîşên tundrewên misilman ên ku Kurdistan dagirkir bûn de, bi sedehzaran Êzîdî hatin qirkirin.

Dema ku şoreşa Sûriyeyê veguherî şerê çekdarî, Êzîdî careke din bi fermanan re rû bi rû man. Komên çekdar ên Islamî mîna El Nusra û Daiş û êrîşên hovane li ser gundên Êzîdiyan li Efrîn û Serêkaniyê pêk anîn. Ev êrîş bûn sedema kuştin û talankirina Êzîdiyan. Mixabin wê demê hêzên dewleta Sûriyeyê herêmên Êzîdiyan bêparastin hiştibûn û bi paş ve vekişiyabûn.

Ev êrîş bûn sedema koçberiyeke mezin. Êzîdiyên mayî jî hewldan xwe bi rêya erka parastina civakî biparêzin. Lê ev yek têra xweparastineke tekûz nekir. Lerwa pêwîstî bi avakirina Yekîneyên Parastina Gel (YPG) hate dîtin. Di vê pêngava dîrokî de, Êzîdiyan çirûsek û ronahî di paşeroja xwe de dîtin û li ser xaka xwe man. Êzîdiyan bi hemû derfet û imkanên xwe destek dan YPGê û dikarîbûn biryara mana ser xaka xwe bistînin. Êzîdiyan xwe bi rêxistin kirin û di parastin û avakirina civaka nû de (Rojava) cihê xwe girtin.

Em dikarin bibêjin ku avabûna hêzên YPG û YPJê bû sedema parstina Êzîdiyan û rê li ber qirkirina ol û civaka Êzîdî li Sûriyeyê, girt. Êrîşên komên çekdar ranewestiyan, lê li hemberî vê yekê jî, berxwedana gelê me mezin, berfireh û bi bandortir bû. Hêzên li ser xaka Sûriyeyê şer dikirin pir bûn, lê mirov dikare wan di bin sê sîwanan de rêz bike:

1- Artêşa dewleta Sûriyeyê ya fermî û hevalbendên wê: Van hêzan, weke me diyarkiribû, Êzîdî bi tunekirinê re rû bi rû hîştibûn û vekişya bûn .

2- Hêza dijberî dewleta Sûriyeyê: Ji hemû komên çekdar ên islama radîkal pêk dihat û hewildanên mezin kirin ku Êzîdiyan ji kokê ve rakin û wan li Sûriyeyê tune bikin (Ev rastî di raporên Saziyên Navnetewî yên Mafên Mirovan de tesbît bû ).

3- Hêza sêyemîn: Ew jî hêza civaka demokrat bû. Hêza bi navê YPG / YPJ û piştre hêza QSD bû. Van hêzan qurbaniyên mezin ji bo parastina civaka Êzîdî li Sûriyeyê dan û bi israreke mezin xwestin ku Êzîdî li Sûriyeyê bimînin û rê li ber tunekirin û derbiderkirina wan bigirin.

Salên di navbera 2013 û 2018'an de bi hêviyên mezin derbas bûn. Li aliyekî

# Êzîdiyên Sûriyeyê û Guhertinên Siyasî

Fawaz Ayo*

**"Êzîdiyan xwe bi rêxistin kirin û di parastin û avakirina civaka nû de (Rojava) cihê xwe girtin.. û li ser bingeha felsefeya civaka demokratîk Êzîdiyan jiyaneke azad dîtin..**



Di destpêka derketina aloziyên li Sûriyeyê de, diyar bû, ku islamiyên radîkal dê roleke sereke di van aloziyan de bilîzin, her wiha dê hewl bidin desthilatdariyê bi dest bixin. Ev yek di lez û beza rêxsitina Birayên Misilman, avakirina Encûmena Nişţîmanî ya Sûriyeyê û hewldana komkirina hemû

*Nivîskar û rojnamevan e, di sala 1973an de li Hesekê ji dayîk bûye, di navbera 2012-2019 berdevkê malpera (Xeber 24) bû. Di sala 2018an de bû endamê Rêveberiya Hevbendiya Êzîdiyên Sûriyeyê, yek ji endamên damezrîner yê Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyeyê ye(2020). Niha li Almaniyayê dijî.

beriya Islamê bû" pirtûka Êzîdayetî, Tosinê Reşîd- r88

Qewl û deqên Êzîdiyan ên Olî
Berê ne erd hebû, ne ezman e,
Ne behr hebû, ne binyan e,
Ne çiya hebû, ne sikan e.

Rê hebû terîqet e,
Îman hebû merîfet e,
Ew ê rojê kanya spî kir qublet e.

Çendî medeha jê didem e,
Ji berî Îsa bin meyrem e,
Ji berî lewh û qelem e.
Ya siltan Êzî,
Ji berî hingê not hezar salî,
Ez li ba te me.
.....
Dirozgeha Şems2 pirtûkaÊzîdayetî tosinê Reşî-r233
Şemsê Êzîdiyan, milkê mêrano!

Ez wê kim ro hilatî,
Ez wê kim ro hilatî,
Berî manga tu der hatî,
Berî nûra şêşims e, pira dojê Seratê.
.....
Şemsê Êzîdiyano milkê mêrano!

Ez wêkim ro hatiye avan e,
Ez wê kim ro hatiye avan e,
Şêşims sekiniye li ber dereng e,
Şêşims dide maş û beratê mêran e.

## Encam:

Bi vê derbasbûna bilez di ser pirtûkên pîroz û berhemên der barê bîr û baweriyên olî de, ji me ve diyar dibe ku hêmanên çîrokê, efsane û gotin û pendên civaka pêşî bi qonaxên xwe ve, di ayet û bendên wan de morkirî ne çi bi şêwazê helbestî çi bi pexşanî, di pêvajoya baweriyên olî de roleke mezin di ciwankarî û aferandina ziman û wêjeyê de çêkiriye, weke tê zanîn ku wêjeya Girîkan di himbêza rêûresmên olî de şîr vexwariye, her weha ji bo tevaya miletan ev diyarde derbasdar e, ku em vegerin Sirûd û Aştên zeredeşt û qewlên Êzîdiyan û çîrokên Tewratê û Incîlê û ayetên Quranê, şêwazê wêjeyî û rewanbêjî ji hêla ziman û watenasî û beyannasiyê ve çavkanî û jêderên weke gençîneyan e, ji bo wêjenasiyê ku bi giştî di serdemên navîn de piraniya kesayetên navdar di cîhana wêjeyê de kesayetên oldar bûn.

## Çavkanî

-Pirtûka pîroz ya ola zerdeştyan, dektor Xelîl Ebdrhman

- Êzîdayetî, Tosinê Reşîd.

-Eleşkal Elewelîy lilheyt Elşuib elqedîme,David Êmil Durkhîm.

-Pirtûka pîroz û wêje, Nothrob Fray 1912-1991

-Fedaih Ebatinîye, D.Ebduruhman Bedewî- Dar elkutub elseqafîye Kwêt

-Qurana pîroz

ola Êzîdiyan û qewl û regezên wan di sînga şêx û pîran de hate veşartin û rêbazên wan yên olî yên nivskî nehatin parastin, bêtir ji ber vê çewisandinê bû. Di baweriya misilmanên Sunî de her ola ku ne xwedan pirtûkek asîmanî be mîna Cuhû û Xiristiyanan yek ser weke kafir tên nasîn, ya ku bandorên neyênî û reşkirinê li vê olê hatine barkirin xwe dispêre vê xalê ku tavaya lêkolînên ji bal cîhana misilmanan hatine kirin û di bin siya vê sîwanê de ne, ta dîroknasê kurd Şerfxanê Bedlîsî ketiye heman helwestê de.

Di der barê Ola Êzîdiyan de pir dîtane û lêkolîn hatine kirin, mixabin ku heya roja îro lêkolînên sipartî regezên akademîk û zanistî li ser vê olê baş hatine kirin kêm in. weke hêmanê rastiyeke dîrokî ji hêla efsaneyî û etîmolojî û kevn e, şopî ku ev ola bi gelemperî ji hêla naveroka xwe ve pêdiviyeke civakî ye mîna her olê, di bersivdayîna hestyariyên nediyar ên em nikarin wan bixin bin ezmûneya reyalîteyî de.

Di vê der barê de hinek lêkolîn wê dispêrin felesfeya dualîzmê, hin jî vê olê weke oleke ji hemû olên heyî pêkhatî dibînin, hinek jî weke ji Şêx Adî û pê de weke terîqeteke batinî sofî dinirxînin. Lê Basîl Nîkîtîn Kurdnasê Rûsî, Vê olê, oleke serbixwe û dervî van dîtaneyan dibîne, ku ola kurdan ya beriya Islamê bû.

"Ji bo têgihiştina dîrok û çanda gelên Kurdistanê yek ji girîngtirîn pirs ew e; lêkolîna dîroka olên bi bingeha xwe kurdistanî ne". di pêvajoya kêferata di teşeyê oldarî de, olên kurdan ên ji bingeha xwe ve civaka kurdan pê bawer bûne mertalekî pêkwer di parastina regez û fakterên kurdweriyê de.

Dema kurdên devera Başûrê Zagrosê ola xwe Yarasanî guhertin û bûne Misilmanê mezheba Şî'a pê re zimanê wan jî hate guhertin. Mayîna bawremendên Ola Êzîdiyan li gel ku ji serdema Umer Bin Xetab, ferman li ser fermanê bi taybet di qonaxa Osmaniyan de heya fermana dawî ya bi destê Daîşê, berxwedaneke efsanewî ye ku parîk mezin ji vê ola kevnar hilgirtine heya roja îro, pir tiştên bi nirx ji bo miletê kurd di kûrahiya Qewl û rêûrism û folklor û zargotinên resn de parastine. Çendî ku qewlên Êzîdiyan ji hêla hin têgeh û hizran ve bi olên derdora xwe ve bandor bûye jî, lê kûrahiya reseniya xwe parastiye. Ji hêla ziman û teknîka avkirina deqên xwe ve, heman rêbaz û şêwazê sirûd û yaştê Avestayê tê de diyar in. ku di heman ritim û kîtekişandinê de hatine hûnandin. Deqên Ola Êzîdiyan ên ji bal Şêx, Pîr û Feqîran di veşara sîngê de hatine ezberkirin, ew jî bi saya ku ev deq bi rewanbêjî û rêzbendî hatine ristin, li gel ku ne li ser yek kêşeyê jî hatine kişandin, beyt û malikên li pey hev di hêla ritmê de ji hev nedageriyayî ne. Di dengbêjiyê de herikbar in û zû têne ezberkirinê. Her wiha ji hêla tore, cilûberg û rêûresmên olî ve jî bi çêj û zargotina kurdwerî barkirî ne, tekez dibe ev ol, bêguman nasnameya neteweya kurdî di naveroka xwe de hilgirtiye û yek ji hêman û regezên wê ne, Nîkîtîn gotiye " Ev ol, ola kurdan ya

li çarçiyan li wan binerin. Ew hez dikin ku li baştirîn dever rûnên û di civat û 'ezîmeyan de li rêzên pêşî bin. Dema mesîh nêzîkî qutîka danê bû bala wî li ser xelkên ku çawa pere dixistin qutiyê de. Maldaran baş dirav dixistin qutiya danê, jineke bî û hejar du fils xisti qutiyê de. Mesîh gazî şagirtên xwe kir "Evê jinbiya hejar ji van tevan bêhtir da" ji ber ku wan tevan tişta zêdeyî xwe dan, lê wê zêdetirî şiyana xwe da, her tiştên li gel wê hebû da). Mirqis 12:38-44

## -Çîrokên di Quranê de:

Peyva quranê bi du sê nerînan ji bal şîrovekeran hatiye şîrovekirin, hin dibêjin ku ji lêkera fermanî hatiye darîştin bi wateya:"Hîn bibe û têbighêje û bihzire û biponije". Û hinekan bi wateya "Merdî û mêvanperwerî" pênase kirine.. Quran weke di baweriya misilmanan de ku ji gotinên Yezdan in, bi rêça milyaket Cibrîl daketiye ser Pêxember Mûhemed ê Qureyşî.

Çîrokên di Quranê de hatine gotin 142 çîrok in:

-Çîrokên Pêxemberan ji Adem, Nûh, Birahîm, Salih, Yûsiv...hwd.

- Çîroka Qabîl û Habîl

-Çîroka Ehil elkefif

-Çîroka tofanê...

**Çîroka Izêr û mirin û rabûna wî di quranê de**

(An mîna wî kesê di gundekî re debas bû, himerî wêranî û hestiyên ji goran derketî bûn, niqutî dilê wî ji xwe re got wê çawa careke din ev ê bican bibin piştî vê mirina xwe. Xwedê ew sed salî mirand û ew rakir, jê re hate gotin: Tu çiqasî mayî, got: Qe rojekê an çend rojan mame, jê re hate gotin: lê tu sed salî mayî, li xwarin û vexwarina xwe binere hîn nehatiye guhertinê û li kerê xwe binere, em ê te bikin ayetek ji xelkê re û binere em ê çawa hestyên kerê te li hev siwarkin û bi goşt bikin û can pêdin, dema ev jê diyar bû got: Ez zanim ku xweda li ser her tiştî pêker û bi şiyan e) sûret Elbeqera

## - Qewlên Êzîdiyan:

Di lêvkirina navê vê olê ji bal bawermendên wê kesekî bi tîpa (y) yê nav lê nekiriye ango "Yezîdî" ya ku ji hêla deng û teşe ve ber bi Yezîd kurê Mûawiya ve diçe, hin alî bi daxwaza ku vê olê ji resenî û koka wê ya kurdwerî dagerînin, ev hewldan kirin. Her wiha ji bilî vî navî hin navên mîna: Êzidî, Êzîda, Yezda, Êzî, Ezda, Ezdahî..bi tevayî ev nav sipartî wateya "Ez Dam" û navê Yazdan xwe lê digire. Ji ber pêvajoya serdema islamê ku ne tenê Ola Êzîdiyan hin terîqe û baweriyên ku ji bal misilmanên Suna ve "weke ji rê derketî dihatin hesibandin" bawermendên wan ji neçarî di veşarê de perestin û rêûresmên xwe bikartanîn. Ola Êzîdiyan weke Terîqeteke Sofî dihate hesibandin li gel Mu'etezîla û rêbazên Şîyan ku Îmamê Xezalî û yên mîna wî dihizirîn di baweriya wan de ji bo van rêgeh û terîqetên batinî "têkilî û hevjiyana bi wan re heram dikirin û heya bi kuştina wan jî hala dikirin"..yek ji sedemên ku

Bi sedhezaran ji wan gernejînê di pejirînin,

Şahiyê pêşkêş dikin, dilxweşiyê dibexşînin

ji xakê û ji bilindahiya rastiyê re dibexşînin.

Dema ro hiltê,

Dema xaka berhemdêr ji bal Mazda ronî dibe

Û her av ronî dibin û her tiştên mîna **wê:**

Çavkaniyên avê û ava deryayan

Her afrendêr ronî dibin û tevaya canên pîroz.

## -Çîrok û efsaneyên di Tewratê de:

wateya navê Tewratê bi zimanê ibrî yasa an jî hînkirin û rêşanîkirin e, bi navê "Ehdê kevin" di pirtûka pîroz de cih digre weke ayetên xwedê ku li ser Mûsa pêxember hatine, li gorî baweriya cûh û xiristyanan, Pirtûka Tewratê piştî vegera cûhyan ji Babilê hatiye nivîsandin ji hêla Ezra ve. li gorî şîrovekar û lêkolîneran, di tewratê de 101 çîrok hene, hin ji wan:

Efseneyên ku Misra kevn û Sumeriyan qala wan kiriye, mîna efsaneya afrandinê û Adem û Hewa û efsaneya Tofana Nûh.

çîrokên pêxemberan.

- çîroka afrandina gerdûnê.

-çiroka Brahîm Xelîl û çûna wî ya Misrê.

-çîroka Nebî Yûsiv û birayên wî û Ferewin.

-Çîrokên Kiralê benî Israîl...

**Çîroka darê Harûn çawa dibe mar**

(xwedan bi Mûsa û Harûn re axivî weha got:"Heger Ferewin bi wer peyvî û got kanî susirmeta we çiye, ji Harûn re bibêje: Darê xwe bibe û bavêje ber Ferewnî wê bibe marek"Mûsa û Harûn derbasî cem Ferewnî bûn û weke xwedan ferman dabû, pêkanîn" Harûn darê xwe avête ber Ferwein û ber kolên wî, ew dar bû marek. Ferewn jî gazî li efsûnerên xwe kir pêzanê Miserê jî bi efsûneyên xwe weha kirin. Her yekî ji wan darê xwe avêt ew jî bû mar lê darê Harûn darên wan tevan daqurtand. Dilê Ferewnî bi vê ziwa bû û nema li herdiwan guhdar kir weke xwedan axivîbû).

## -Çîrokên di Incîlê de:

Incîl gotineke yûnaniye bi wateya mizgîn, mizgîniya rehakirinê ya ku pêximber Îsa daye, di vê pirtûkê da jiyan û perspektîfê û susurmetên Mesîh û mirin û rabûna wî vedibêje. Incil piştî mirina Mesîh di nav bera salên 70-100 z ji bal şagrtên wî hatiye tomarkirin bi "ehdê nû tê naskirin" Meta-Mrqis-Loqa-Yûhina.di Incîlê de 22 çîrok hene.yek ji wan çîrokan

**Çîroka jinbiyê**

(Rojekê ji rojan, Îsa pêxember şagirtên xwe hîn dikirin "Hayên we ji mamosteyên şerîetê û serkêşên oledarî hebin, ji ber ew hezkiriyê ger û geştan e bi cubeyên fireh in da ku xelk

Di der barê têkiliya olan bi hunerê re weke zanyar Êmil Durkheim (1858-1917) civaknas û olnasê ferensawî di ((şêweyên pêşîn di olan de)) dibêje:

*"Huner ji nêz ve bi olê ve bestiye ev jî li gel xelkên pêşîn di rêûresmên olî de, dirûvên xwe boyax dikirin û quloç û perîk bi serê xwe ve dikirin. Li gel baweriyên pêşiyan pir cureyên pûtan di wêneyên xwedawendan de lêdikirin, her wiha ristina hizrên efsûnî di der barê afrandina gerdûnê de..."* weke hatiye çesipandin ku hest û çêjeya civakan ji bedewiya huner û wêjeyê ji çavkaniya wê olê ye.

Di tevaya ol û baweriyan de çi devokî çi nivîskî, sirûd, pend, yasa, hoşî û çêkirina peyker û sembolan di der barê çawaniya afrendêriyan de û xwedawend û heyber û têkiliya mirovan bi wan re wek rêûresim hene. Ev sirûd û gotinên di pêvajoya dîroka mirovan de kom bûne, weke dîroka ol û xwedawendan jî hatiye morkirin, ji baweriyên serdema kevirî de wek tewtem heya serdema Olên Esamanî. Û pêxemberên xwedan pirtûkên pîroz di ol û baweriyên wan de qala beşeke mezin ji çîrok û efsaneyên nifş û serdmên borî de girtine dest li gel resim, sembol û peykerên di teşeyê xwedawendan de ku hîn şopên wan heya roja îro şipya ne, weke helbest û pexşanê li gorî qonaxên zimanî hatine vegotin.

Li gorî nerîna Entropologan, olê wiha pênase dikin:

*"komek e ji hizrên dermadî û ezmûn û nirxên çandan kom bûne"*

Di van ezmûn û hizran de Ensklopêdiyayek ji hunera wêjeyî berfireh heye, dagirtî ji çîrokên deraqilî û efsaneyan, ya ku bingeha wêjeyê bi xwe li ser hatiye avakirin, ji ber vê regezê, negengaz e ku meriv karibe ol û wêjeyê di şîrovekirin û pênaseya civakan de ji hev cuda bike.

## Hin deq ji pirtûkên pîroz:

## -Avesta, pirtûka ola Zerdeştiyan:

Temenê wê nêzîkî 3000 sal in, Bi wateya "avaniya tebût" mîna ensklopêdiya şaristaniya gelê arî tê nasîn, bi zengîniya xwe yî çandî, sincwerî, yasa û qanûnî û hizrên felsefî weke ola surîştê xwe şîrove dike di pîrozbûna heyberên surîştê de wek, av,ax,agir û ba. Avesta, bi mijarên xwe yên nirxedar tîn û bandora xwe li pir bîr û baweriyên derdora xwe û qonaxên li pey hatine kiriye, bi taybet li felsefeya Yûnanê û li baweriyên hersê olan, (Cuhû- Xiristyan- Misliman) ku hin alî Zerdeşt wek pêxember ji bal xwedan dibînin û hin jî mîna Yûnaniyan wî wek Kahinekî efsûner û bijîşk û xwedanê hunera sirûdên efsûneyî dibînin.

**Sirûda tavê(Xorşîd Yaşt)**

Em ji rokê re nimêj dikin
Ji ronahiya bê mirin re
Hespên wê lezgîn in
Dema ro hiltê
Dema ro diçe ava
Hemû xwedawend radiwistin,

# Ol û Wêje



Beşîrê Mele Newaf *

**Deqên Ola Êzîdiyan ên ji bal Şêx, Pîr û Feqîran di veşara sîngê de hatine ezberkirin, ew jî bi saya ku ev deq bi rewanbêjî û rêzbendî hatine ristin..**

Pirsa Huner, wêje û civakê du pirs in, di gençîneyeke du derî de ne û li hev vedayî ne. Her wiha pirsa ol û wêjeyê jî di hev re derbasbûyî ye ku dîroka olan xwe dikişîne serdema kevirî ya pêşîn, li gorî zanista olan û tişta hatiye tekezkirin jimara ol û baweriyan di ser 10,000 an re ye.

*Di sala 1972'an de li bajarê Amûdê hatiye dunyayê. Li Zanîngeha Rojava di beşa ziman û wêjeya Kurdî de Mamostayê waneya Şano ye. Helbest û Şanoyan dinivîse, beşdarî mihrîcanan dibe û çend xelat di warê şano de wergirtine.

Tosinê Reşîd di heman rûpelê de berdewam dike û dibêje: * Çawa ku me dît, ola Êzîdiyan ji kûrahiya hezar salan tê û bi hezar salan beriya hatina Şêx Adî, êdî weke olek baş damezirandî hebû. Lê zanyarên dîroknûsên Îslamê dibêjin ku, heta sedsala dozdehan mîladî, piraniya kurdan ne misilman bûn, heta dema Şêx Adî jî, Êzîdî li deverê xwediyê bandoreke mezin bûn.* lewre, (73) fermanên qirkirinê der bare Êzîdiyan de pêk hatin da ku dev ji baweriya xwe berdin.

Li gor baweriya ola Êzîdiyan, Xweda hem xêrê û hem jî şer dide, ango, dema civakek dev ji rêya qenciyê berde û xirabiyê pêk bîne, Xweda peyxemberekî an zêdetir dişîne, lê eger ew civak nehat ser riya rastiyê, hingê Xweda wê civakê ber bi karestên mezin ve dibe. Ev tê wê wateyê ku mîna olên din, Êzîdiyatî çi hêzek şer li dijî Xweda nasnake, ango; mijara şeytan li gor hizir û sebqeyên Êzîdiyan nehatiye ziman. Lê ev nayê wê wateyê ku Êzîdî perestinê bo Xweda nakin, na Êzîdî bi tenê perestinê bo Xweda dikin û hezar û yek navî li Xweda dikin.

## Paqijî di Êzîdiyatiyê de:

Pîr Xidir Silêman (Êzîdiyatî, Duhok,1996) dinivîse:

Yê qedrê day û baban bigirit, qedrê Xwedê girt.

Gerok û zanyarên biyanî, ku di sedsala (20-21)an de, serdana Êzîdiyan kirine (A,H,Layard, Rêv. G,P.Badger, E.S.Drower, C.Sandreczkî) dinivîsin, wekî gundên Êzîdiyan, malên Êzîdiyan, cil û bergên Êzîdiyan gelekî ji yên cîranên wan paqijtir in. Lê ji talebextan re dîsa jî di nava cîranên wan, ew baweriya şaş heye, wekî Êzîdî guh nadin paqijiyê!

Her weha, eger mirov peyva (henefî) vegerîne darîştina wê ya di dema Peyxember Brahîm, dê mirov koka vê peyvê bi paqijiyê ve girêde. Ango, peyv ji koka (Enepî), ango paqijiya Enî û Pî ye.

Tiştê herî balkêş ew e ku ta niha jin û mêrên kurdên Êzîdî, çênabe cilên rengereng ji bilî spî di bin cilan de, li xwe bikin.

Navê Firêşteyan (melaîkeyan) di Êzîdiyatiyê de:

Heft melaîkeyên karbidest ku Xweda dewrana gerdûnê daye dest wan hene, ew jî (li gor sebeqeyên Êzîdiyatiyê û di pirtûka Tosinê Reşîd, Êzîdiyatî, rû.71) ev in:

Şêx Adî- Şêx Şems – Şêx Hesen – Şêxubekir- Êzîdînê Mîr- Şêx Ferxedîn – Şêx Sicadîn.

Di baweriya Êzîdiyan de, Xweda heft melek ji nûra xwe afirandine, gava ku mirov li qewlên Êzîdiyan hûr dibe, mirov dinase ku peyva (Êzî-Êzîd) cuda ne, Êzî navekî Xweda ye, lê ji bo Siltan Êzîd, Êzîdê sor, di qewlan de tê gotin ku wekî ciyê wî Hekarî bû, paşê jî dibêjin, wekî Mîrê Êzîdiyan niha li dewsa Siltan Êzîd rûniştiye.



■ Pirtûka Cilwea



kevneşopiyek resen di nav civaka Kurdan de. Bo nimûne: Heya niha Kurd bi heft pirtûkan sond dixwin! Lê gelên din dibêjin bi tenê çar pirtûkên pîroz hene. Gelo ew heft pirtûk çi ne? Em ê bersiva vê pirsê li jêr bidin. Mixabin, ev ol bibû armanca êrîşên curbecur piştî hilweşandina Împeratoriya Medan.

## Êzîdî kî ne?

Gelek nivîsên bêserûber yên nivîskarên serdestan dibêjin ku Êzîdî ne kurd in, helbet ev nivîsên weha bê nirx û bingeh in, ji ber ku heya niha ola Êzîdiyan bi zimanê kurdî, zaravayê Kurmancî hatiye nivîsîn û ezberkirin.

## Pirtûkên Ola Êzîdiyan:

Li gor ayîna Êzîdiyan, pirtûka Zend Avesta, pirtûka Êzîdiyan a yekemîn e ku sê peyxember bi navê Zeredeşt derketine û her sê jî Êzîdî bûn. Lê ji ber zêdebûna gendeliyê di hundir çîna pîr û şêxan de piîtê hezar salan, Şêx Adî neçar maye ku ji nû ve ola Êzîdî şirov bike.

Nivîskar Tosinê Reşîd (Êzîdiyatî Oleke Hê jî Nenaskirî) rûpel,215,dibêje:*Îro ji aliyê dîroknûs û zanayên olan ve, du pirtûkên ola Êzîdiyan têne naskirin û pejirandin: (Meshefa Reş û Cilwe) Ew herdu pirtûk bi destê Melek Fexiredîn hatine nivîsîn, lê Şêşims ji bo Şêx Adî gotiye.

# Êzîdiyatî

**Li gor ayîna Êzîdiyan, pirtûka Zend Avesta, pirtûka Êzîdiyan a yekemîn e ku sê peyxember bi navê Zeredeşt derketine û her sê jî Êzîdî bûn.**

Menan Cafer*



Ola Êzîdî rahendeke dîrokî mezin standiye û bandora xwe li hemû gelên Rojhilata Navîn kiriye. Mirov nikare ola Êzîdî paşguh bike di jiyana gelê Kurd de, ji ber ku êdî ew rênima û ramana vê olê, bûne rêûresim û

*Di sala 1968'an de li Efrînê hatiye dunyayê. Di sala 1997an de ji Zanîngeha Helebê ji beşa Wêje û Zimanê Ingilîzî derçûye. Ji 2015an ve li zanîngeha Efrînê û Rojava Mamostayê Ingilîzî û Kurdî ye.

xebateke netewîbûyînê ya bi vî rengî, eger tê de rêbazên cihêxwazî û şîdetê nebin, wê karibe netewîbûyîneke demokrat pêk bîne. Ev rêbaz a herî têkûz e.

Netewbûyîna Kurd a bi vê rêbazê bimeşe, li cihekî mîna Rojhilata Navîn ku netewparêztî, mezhebtî, etnîk û dîndarî ketine qirika hevdu, dikare li herêmê bibe mînakekî payeberz ê çareseriyê. Nexasim di mînaka Îsraîl-Filîstînê de neçariyeke mezin a rêbaza netewparêziyê heye, ji lewra rêbazên nû şert in. Dem hatiye were fêmkirin ku pirsgirêk bi şîdet û cihêbûnê çareser nabin. Dîsa divê baş were fêmkirin ku bi terora dewletê rastiyên millî nayên tinekirin. Ya hînê girîngtir ew e ku divê baş were fêmkirin ku bi netew, etnîk, dîn û çandên cuda re jiyan nabe sedema fikar û wendakirinê, berovajî, dikare bibe rêya jiyaneke dewlemend û zindî. Ji bo çand û netewên cuda dewlet hewce nake, berovajî, demokrasiyeke tam pêdiviyek e ku dest jê nabe. Kengî ev baş hat fêmkirin, wê were dîtin ku pirsgirêkeke netewî ya neyê çareserkirin nîne.

Di roja me ya îro de netewîbûyîna Kurd her du rêbazan jî di zikhev de diceribîne. Ya yekemîn, sîstema Rojava destekê didê, hînê bernameya wê ya berçav nîne, tenê wek Dewleta Federe ya Kurd tê bi navkirin, xwediyên vê rê tebeqe serdest a Kurd a netewparêzên paşverû ya feodal-bûrjûwazîn e; ya duyemîn, hêza xwe ya cewherî esas dibîne, hedefa xwe afirandina neteweyekî azadîxwaz û demokratîk e, ev rê ya gelê Kurd ê kedkar e. Ya yekemîn paşverû ye, xwe dispêre berjewendiyê, tayên feodal, dîndar û eşîrtiyê bi kar tîne, ya duyemîn eşîrtiya teng li dawiyê hiştiye, xwe li ekolên dîndar û feodal ranagire, tayên demokratîk, wekhev û azadîxwaz esas dibîne. Ya yekemîn bi giranî di şert û mercên dagirkeriyê yên DYE de hewl dide li Kurdistana Iraqê pêşengiyê bike, ya duyemîn xwe dispêre hêza xwe ya cewherî û hewl dide di demokratîkbûyîna Tirkiyê de Kurdistanê ne wek çoyekî, lê wek destekekî bixe rola pêşengiyê. Ev her du rê yan jî her du rêbaz wê di dema pêş me de rola wan a çareseriyê li Rojhilata Navîn di pirsgirêkên demokratîk-neteweyî de ku wê girantir bibin, hînê baştir diyar bibin û girîngiya wan were fêmkirin. Li gorî giraniya van rêbazan wê diyar bibe ka Kurdistanê bibe Îsraîl-Filîstîneke nû yan jî wê bibe welatê çareserî û aştiyê. Çendîn ji rêbazên etnîka teng, qewmiyetparêz, dînî û netewparêziyê dûr were sekinandin û îtîbar bi rêbazên eskerî neyê kirin, pirsgirêkên civakî yên pir tevlihev ên li Kurdistanê wê çareseriya wan bi awayekî azad û wekhev bibe û ew çend jî rêya netewîbûyîneke demokratîk wê vebe.

hilweşîna împaratoriya Osmaniyan hevkarên Kurd jî xistiye rewşeke tengav. Di destpêkê de fêm nakin ku şerê rizgariya netewî ji bo xilaskirina xelîfetiyê nîne, kengî fêm dikin ji bo avakirina komarê ye, hevkartiya xwe ya di destpêkê de werdigerînin serhildanan. Bi têkçûna xwe re rê li ber pêşketina statuyeke hevkar û înkarwarî vekirin. Çendîn taybetiyên xwe yên Kurdayetiyê wenda kirine di nava dewletan de mîna klîkeke ajan û sîxur tevgeriyane. Ji bo xwe wek komên hindikayiyan bidin qebûlkirin li ser navê netewê serdest bûne netewparêzin herî dijwar. Dîndariya wan û netewparêziya wan jî ji bo her gel û netewî tehlûke ye.

Netewbûyîna Kurd di cihokeke nakok û cuda re diherike. Li dora bazareke hevpar derfet û îmkanên pêşdebirina ziman û çanda xwe nedîtiye. Serhildan û tepisandinên dijwar ev şens ji holê rakiriye. Ji ber ku berxwedan hatin şikandin û tevgerên netewî yên hemdem nehatin afirandin, rê li ber netewbûyîneke asta wê pir li paş vekirin. Nekarîne xwe bikin tevger û partiyên netewî yên hemdem. Nekarîne di rohnîbûna Kurd de jî alîkariyeke bi kêr bikin. Tevî ku komar bi Tirkan re hat avakirin, ji ber lêgerînên wan yên kevin, ji ber nas nekirina wan ya komarê, vî şensî jî ji destên xwe direvînin û dikin ku serhildanên nû li dijî Kurdan bigihîjin encamê. Ji asîmîlasyona pişt re were meşandin, serî radizînin û di siyaseta netewê serdest de bi awayekî bêpîvan û xayînane dimeşin û di sedsala 20. de ku serdema rizgariyên netewî bû, kirin ku ji bo Kurdan sedsal bibe ya herî xirab. Di vê de xwedî rola bingehîn bûn. Çendîn netewiyeta xwe qirêj kirine, ew çend jî netew an jî netewên di navê de xwestine rol bilîzin, qirêjî kirine.

Pir muhtemel nîne ku netewîbûyîna Kurd li dora bazarekê û bi tevgerên netewî yên bûrjûwaziyê pêş bikeve. Di pêngava nû ya Rojhilata Navîn a DYE de diyar nîne ku wê Kurdên hevkar û netewiyeta bûrjûwaziyê di çi astê de bi kêr werin. Ji muttefîkekî bipîvan zêdetir, wek tevgerek heta dawiyê bi berjewendiyê xwe ve girêdayî xuya dikin.

Ji bilî van, li dawiyê şêwazê Kurmancî û xebatên civakî yên komîn ên demokratîk hene. Li dora civaka sivîl, komîn û demokratîk, dikare netewîbûyîneke Kurd a têkûz bi rêbazên hemdem pêk were. Divê ji tevgerên netewî yên navend dewlet cuda bin, ji bo demeke dirêj li şûna xwe bispêre rêbazên şerekî rizgariya netewî, pêşî bi xebatên demokratîkbûyîn û civakeke sivîl a fonksiyonel, dikare şêwegirtineke netewî pêk bîne. Nemaze tevlîbûna jinê li ser hîmekî azad girîngiya wê pir zêde dike. Xebata were meşandin, divê xwe ji netewparêziyê kiribe, ji radîkalîzma dîn dûr xistibe, îfadeya azad a çanda herêmî be, azadiya cinsî ya civakê û parastina hawîrdorê bike,

sînor be jî Kurdan di warê siyasî, wêjeyî, entelektuelî û gelek pêşketinan de hebûna xwe nîşan dane. Mirov di vî warî de dikare Şerefname (1596) Mem û Zînê (di salên 1690î de) wek mînakên pêşketina taybetiyên qewmî yên Kurd nîşan bide.

Em yekem car dibînin ku kom ji eşîran vediqetin. Komên ji eşîran vediqetin ji wan re Kurmanc tê gotin û girseyek li derveyî eşîrê îfade dike. Bi hejîna nîzama eşîrê re û bi veqetînan re ev girse timî mezin dibe. Taxên li keviyên bajaran yekem car kurmanc pêk tînin. Em dibînin ku ev pêvajo di sedsala 19. de bi leztir dibe. Em dikarin bişibînin pêvajoya kapîtalîzmê ya karker pirkirinê. Kurmanc tam hemtayê Kurdîtiyê ye. Di navbera Kurdê eşîrê û Kurmanc de cudahî nîne. Eşîr bêyî hîyarerşî nabe, lê Kurmanc bi malbata xwe heye. Mîna karkerekî Kurd be. Çîneke karkeran e. Gotina koma karker vê rastiyê baş îfade dike.

Serf, Kurdê xulam bendeyê axa ye. Axatiya di serdema navîn de pêş ket di arîstokrasiya Kurd de xwedî cihekî xweser e. Karîbûye ji eşîrê serfan biafirîne. Axatî nemaze di dema Osmaniyan de pêş dikeve. Zêdetir li gund derfetê wê yên cotkariyê pêş ketine. Eger etnîsîte li gundekî cotkariyê bi cih bûye, hiyarerşî jî bi şêweyekî axatiyê xwe pêk tîne. Axa bi tundîtiya xwe tê naskirin. Ji serekê eşîrê cuda ye. Zêdetir bi darê zorê tevdigere. Serekê eşîrê jî bi têkiliyên xizimtiyê rê ve dibe. Saziya şêxtiyê wek kevneşopiyeke Ereb hatiye pejirandin. Saziyeke bi bandora dînî pêk hatiye. Tevî ku bingehekî wê yê ekonomîk heye, hînê zêdetir entelektueliya serdema navîn temsîl dike. Hinekî dişibe şefê terîqetê. Mirov dikare serekê eşîrê, axayê gund û şêxtiya dînî-terîqê wek çînên serdest ên serdema navîn ên Kurd bi nav bike. Di çînîbûyînê de hin pêşketin bûne.

Ji hevkariya Şerefxanî û Osmaniyan (Emîrê Bedlîsê Îdrîs-î Bedlîsî serokê wan ê fexriye) ev tebeqeya serdest sûd werdigire, lê piştî sedsala 19. berjewendiyên xwe wenda dikin pêvajoya serhildanê didin destpêkirin. Kengî daxwazên ji bo bacên giran û esker ên dewleta navendî ji statuya berê derbas dibin, tevahiya sedsala 19. bi serhildan û îsyanan derbas dibe. Lê van serhildanan nekarîne xwe bigihînin qonaxa netewparêziya Kurd, nekarîne xwe bigihînin netewparêziya Rojava û heta nikarîne xwe bigihînin qonaxa netewparêziya Ermenî û Suryaniyên li ber serê xwe. Têkçûna wan bandoreke neyînî li ser gel kiriye. Hiştiye ku asta azadiyê ya gel bikeve. Nekarîne qewmê Kurd bigihînin tevgereke netewî. Mirov nikare bibêje ku karîne rola kevneşopiyê li dawiyê hîştine.

Em dikarin vê pêvajoya serberjêrçûyî ji bo Kurdan bi serhildanên di sedsala 19. de bidin destpêkirin. Di dîrokê de yekem statuya Kurd tine dibe, ti roleke wê ya siyasî ya xweser namîne. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn

û Pers di civaka Kurd de dernakeve pêş. Zêdetir di nav arîstokrasiyên serdest de dilê xwe dibijîne wan û şikil werdigire. Vegotina 'ji qral hînê zêdetir qral e' ji bo hevkarên Kurd li cih e. Eger arîstokrasiyek mîna ya Roma, heta ya Sumer û Misrê çîneke dewletê derketibûya, bêguman wê pêşketinên civakî yên li Kurdistanê cuda bûna. Bajarên wan nînin. Bajarên hatine avakirin beden in. Em wexta li bajarên Helenan ava kirine dinerin cudabûneke mezin heye.

Di tevahiya van hemû deman de cudabûna di navbera gund û bajaran de li ser cudabûna di navbera civakê de jî bandorê dike. Ji serweriya Persan ve bajar rola navendên biyanî dilîzin, kom û koçerî jî ji çanda herêmî re xizmetê dikin. Ev rastî demeke dirêj wer dewam dike. Bajar berê mora Sumer û paşê jî li gorî rêzê mora Babîl, Asûr, Pers, Helen, Roma, Bîzans, Osmanî û herî dawî jî mora netew-dewletan dixwin. Li hemberî vê yekê gund û kom Kurdîtiyê hildigirin û temsîl dikin. Kurd ji kêfa xwe kom û gund nemane, dagirkerî û bajarên biyanîbûyî di vê yekê de roleke diyar dilîzin. Bajar ji bo Kurdan tê maneya xerîbbûyînê, koletiyê û hevkartiyê.

Bandora Îslamiyetê li ser etnîsîteya Kurd û arîstokrasiya wê piralî bûye. Beşên yekemîn stû xwar dikin, hevkarên etnîk û arîstokratên bajaran e. Teslîmiyet bi kok e. Rola wan a di çînîbûyîna serdema navîn de bingehê îxanetê ye ku digihîje heta roja me ya îro. Dikarin xwe ji Kurdîtiya li derveyî bajaran nehesibînin di nava komên îqtîdarê yên serdest de xwe bi rêxistin bikin.

Em wexta vê mijarê objektîf digirin dest û li ser radiwestin, em dikarin hînê baştir çareser bikin. Hawîrdor beriya hezar salan xwe bi rêxistin kiriye. Bajar bi tevahî xerîb in. Keys û firsend nayê dayîn ji bo bajarên xwe ava bikin. Mîna fatihekî ji çiyê danakevin. Ji zû ve hevkaran rê vekirine. Yên piştre tenê dikarin wê rê bişopînin. Ji Sumerbûyînê em bigirin heta Helenbûyînê, Persbûyînê û Erebbûyînê di nav her nijada serdest de nikarîne xwe xilas bikin ji nehelînê. Tê fêmkirin ku etnîsîteyeke bi vî rengî bijî û li ser vî hîmî hiyarerşiya xwe wenda bike, wê nikaribe ziman û çanda xwe pêş de bibe.

Di serdema navîn de her çend hin xanedaniyên Kurd pêk hatine jî nekarîne bandora Erebî û Farisî li dawiyê bihêlin û xwe bigihînin qonaxa xanedaniyeke netewî. Xanedaniyên navdar ên Kurd Merwanî û Eyyûbî (PZ 990-1090, 1775-1250) di dema serweriya xwe de ji xanedaniyên Ereb pir cuda nebûne. Di warê Kurdî de xebat û hewldaneke ciddî nîşan nedane. Li ser xeta klasîk meşiyane. Ji ber ku gel Îslam bi rêya mezheb û terîqetan jiyaye di parastina cewherê Kurdî de roleke erênî lîstine. Feodalîzma serdema navîn tevî hemû aliyên xwe yên neyînî nekarî taybetiya Kurdan a qewmî tine bike, berovajî bi

yê şêwazê jiyana eşîrî ew e, îmkanê wê kêm in ji bo wergere civakeke berfirehtir û pêşketîtir.

Civaka çînî bajêr pêk tîne. Bi bajêr re nivîs, huner û zanist hînê zû pêş dikeve. Damezrandina dewletê kapasîteya raman û çalakiyê pir zêde pêş de dibe. Bi hatin û bereketa ekonomîk re şêniyên zêde, dikarin bi hev re bijîn. Kurd ne ku bê qabîleyet bûn, berovajî ji ber ku bi qabîliyet bûn li welatê xwe di jiyana azad de israr kirin. Belkî jî vê yekê ew ji pêşxistina sîstema şaristaniya koledar kirine. Lê bi saya berxwedana azadiyê hebûna xwe parastine.

Eger em pîvanên pêşketinê wek azadî destnîşan bikin, belkî jî Kurd di dîrokê de gel û koma etnîk a herî pêşketiye. Di şaristaniyên navenda wan Mezopotamya de ku BZ heta salên 330 tên, statuya eşîrên Kurd li herêmê xwedî cihekî payberz e, xwedî taybetiyên welê ye, li têkiliyên pêre tê gerîn. Ji bo vê yekê, çavkaniya herî baş Dîroka Heredot e. Wexta Heredot tim û tim behsa Medan dike, îşaret bi hin meylan dike ku wê demê civaka pêşketî ya Grek bi hevkariya Medan gunehbar dikin. Kurdên wê demê Med van taybetiyên xwe deyndarê nasnameya xwe ya azad in.

Dînê Zerduşt ji aliyê exlaqê azad ve dînê herî xurt e. Di warê têkiliyên jin-mêran de nêzî sîstema wekhevî û azadiyê ye. Nîzameke wekheviyê ya îdeal salix dike. Jin û mêrtiyeke baş wek fazîleteke neqane dihesibîne. Qîmetê dide mezinkirina zarokan û rastî wek pîvana yekemîn a perwerdê ye. Pir girînge ku mirov derewan neke. Di nav dînan de yê herî zêde balê dikişîne ser parastina heywan û hawîrdorê. Di xurtbûna malbata Kurd de bandora Zerduştiyê eşkere ye. Hînê jî ev kevneşopiyên mîna yên Zerduştiyê li cem Êzîdî û Elewiyên Kurd geş û zindî ne.

Çendîn dikevin bin bandora şaristaniyan, nîzamê wan ê eşîrê û exlaqên wan xira dibin. Piştî dagirkeriya Helenîzmê, bi senteza Rojava-Rojhilat li ser rêya şaristaniyê qonaxeke nû ya girîng pêk tê. Kîtabeyên li xirbe-bermahiyên Nemrûd ku peykerên qraliyeta Komagene'ne, vê rastiyê baş nîşan didin. Heta derketina Îslamiyetê çiya di jiyana civakî ya Kurd de rola xwe diparêze. Tevî vê yekê, mirov dikare texmîn bike ku berê di nav persan de paşê di nav împaratoriya Part û Sasaniyan de çîneke arîstokrat a Kurd cih çêkiriye. Arîstokrasiyeke ji etnîsîteyê qutbûyî jî bi serê xwe ji çînîbûnê dûr e. Belkî beriya persan ev qabîliyeta wê hebû. Lê piştî ku bi împaratoriyê re hevkarî kirin, dibe ku girêdaneke bende û ebd ji wan were hêvîkirin. Agahiyên di dest de vê taybetiya çîna arîstokrat nîşan didin. Etnîsîteya Kurd çiqas azad e, arîstokrasiya wê jî ew çend hebûn û tinebûna wê diyar nîne û hevkar e. Li ser vî hîmî çînîbûyîn belovajî ye û bi înkara nijadê re di zikhev de ye. Çîneke arîstokrat a mîna Grek, Roma

Şertên nîv-koçeriyê, parastin, têkiliyên deşt-çiyê, şertên demsalî ji bo jiyana etnîsîteyê peyda nedibûn. Jixwe şoreşa neolîtîk jî encamên van şert û mercan e. Zêdebûna hejmara şêniyan, pir zû rê li ber têkoşîna li ser cihûwar û qadên hilberandinê vedike. Ji lewra rêxistinbûyînên tîpa eşîrê dibin deverên bingehîn ên hilberandin, parastin û bicihbûnê.

Şêwazê dewletê yê rêxistinbûyînê, taybetiyên wê hene ku her kêlî ji ber êrîşên ji der ve hilweşe. Şert û merc ji bo dewletbûyînê zû xuya dikin. Eşîr, gundên hîn piçûktir û qebîle şensê wê yê jiyanê bi sînor in. Yan tevli eşîreke bi tesîr bibe, yan koç bike, yan jî heta dawiyê li ber xwe bide, alternatîfên bi vî rengî hene. Kesên xwe diavêjin bextê şertên zehmet bi giranî komên têkoşer û çarçoveya wan teng e. Cihûwarên li deştê jî ji wan derdor û beşan e, ku herî zû dikevin bin bandora dewletê. Em wexta çav li eşîrên deştê û çiya didêrînin, em dibînin eşîrên li çiyê saf in, û tevlihev nebûne; eşîrên li deştê dijîn asîmîlasyoneke pir dijwar derbas dikin. Ji ber vê yekê ye, cudahiyeke ciddî di navbera Kurdîtiya çiyê û deştê de heye.

Prototîpa koma zimanê Kurdî texmînî diçe 12.000 sal berê. Ji ber ku zimanê cotkarî û heywan xwedîkirinê ye, li ser nîzama jiyanên wek xwe û kokên wan jî bi tesîr dibe. Bi cudabûyînê re di derketina Hûriyan de roleke bingehîn dilîze. Komên zimanên Hînd-Ewrûpî xurt in, ji ber bingehê wan xwe dispêre şoreşa cotkariyê ya hezar sal berê. Eger bi vî rengî kokên ziman nebûna, wê li ser cografyayeke berfireh îzaha peyvan mumkin nebûya.

Divê mirov belavbûna li Kurdistanê ne fizîkî, bi awayekî çandî bifikire. Texmînî 6000 sal berê rengê avabûna eşîrê xuya dike. Hin eşîrên Kurd ên li çiyê dimînin peyvên bi kar tînin li cem Hûriyan peyda dibin. Heta gelek peyvên di koma zimanê Hînd-Ewrûpayî de wek mûrd=mirin, jin=jiyan, ra=ro, star=stêrk û hwd. vê rastiyê nîşan didin. Wekheviya di navbera nîzamê xwedayî û mîtolojîk de jî balkêş e.

Rewşa derbasbûnê ya di navbera şaristaniyên Sumer-Hîtît de, hêmanekî din e, hebûna eşîrî ya proto Kurdan xurt dike. Ji ber ku dewletbûneke zû wê tasfiya wan hêsan bike, jiyaneke nîv-koçerî, yanî şêwazeke jiyanê ya mîna gerîlla tercîh dikin. Li hawîrdora wan çiqas dewlet ava dibin, ew çend hewce dibînin ku eşîra xwe xurt bikin. Li cem Kurdan eşîr nîv-gerîlla ye. Em wexta ji nêz ve li rêxistinbûyîna eşîrê dinerin, em dibînin erkê dayikê û azadî derdikevin pêş. Jin gelek bi tesîr û xweser e. Encama em dikarin ji vê derxînin ew e ku berxwedana eşîrê di asta nîv-gerîllatiyê de pêş ketiye. Em careke din dibînin ku asta azadiyê ya jinê di vir de jî asta azadiya civakê diyar dike. Hêz, jêhatîbûn û wêrekiya kevneşopî ya jina Kurd çavkaniyekî wê yê kevin ê dîrokî heye. Aliyê neyênî

Sîstemên ne kapîtalîst, nîzamên komîn, demokratîk û sosyalîst jî dikarin derkevin holê. Eger di nava neteweyê de tehekumkariya çîna kapîtalîst hebe, wê wextê binavkirina netewbûrjûwa yan jî kapîtalîst dikare bibe xwedî mane. Lê di vir de rast nîne ku mirov kapîtalîzm û netewe hemcewher bibîne. Eger tayên wê bi kedxwariyê re qels bin û têkiliyên wê yên komîn sereke bin, mirov dikare ji van netewan re bibêje neteweyên sosyalîst û demokratîk.

Di nava neteweyan de tevlîheviya tayên çîn, cins û etnîsîteyê zêde dibe. Tevî ku çînên bingehîn bûrjûwa û karker in, gelek tebeqe û çîna gundîtiyê xwe nû dike. Mirov dikare gelek qewm, çîn û cinsê bindest di nava neteweyê de bibîne. Wê wextê têgînên cins, çîn û neteweya serdest zelaltir bibin, wê zimanê fermî, cihêwaziyê neteweyî, etnîkên bindest û komên çandê pêk werin. Netew-dewlet her çend derketina dewletê ji nav hebûna neteweyî îfade dike jî zêdetir îşaretê bi têgîna mîlliyetparêziyê dike. Eger îdeolojiya dewletê milliyetparêzî be, ji ber milliyeta serdest jê re netew-dewlet tê gotin. Dewletên pir netewe jî hene. Di vê rewşê de divê mirov di şûna têgîna netew-dewlet de tiştekî din bîne ziman. Yek ji aliyê xeter ê netewparêziyê ew e ku her neteweyekê bi dewletê, her dewletekê jî bi netewekê dinirxîne. Bêyî ku mirov kategoriyên netewe û dewletê zêde tevlihev bike, divê dewlet wek amûreke rêxistiniya hevpar were nirxandin û ev yek jî ji bo azadî-wekhevî û demokratîkbûyîna neteweyan jî hîn pirtir xizmetê bike.

Ji neteweyê wêdetir, mirov senteza koma neteweyan li ser berjewendiyên havpar û nêz fêm bike rastir e. Eger mirov li ser sentezên neteweyan ên hevdu înkarnakin û hevdu dewlemend dikin biponije wê gelek mijarê çareser bike û rê li ber encamên bi xêrûber veke. Ne nîhîlîzma netew – înkarkirin – ne fanatîzma netewe; berevajî senteza nirxên neteweyên cuda, dikare bibe rêyeke herî baş û rast ji bo xilasbûna tevlîheviya neteweparêziyên roja me ya îro.

Di çarçoveya van têgînên bingehîn de em dikarin rastiya netewe, çîn û etnîsîteyê hîn baştir lê bikolin. Em dikarin Kurdistanê wek make û çavkaniya bingehîn a etnîsîsteyê binirxînin. Ji ber ku Kurdistan yek ji navendên herî kevin ê şoreşa neolîtîk e û hîn komên etnîk bi tesîr lê dijîn, dikare îzaha mirov rave bike. Civaka Kurd di dîrokê de mozaîkeke etnîk e, herî zêde kevin û pirtêkel e. Li herêmê, ji çûnûhatina ji bakur-başûr, rojhilat-rojava re bi hezarsalan navendî kiriye û di vê yekê de hilberîneriya şoreşa cotkariyê roleke bingehîn dilîze. Li Mezopotamyaya Jêr û li Misrê derfet û îmkan ji bo şaristaniyeke bingehê wê çînî zêdetir amade bû, lê li Mezopotamyaya Jor û hawîrdora wê jiyaneke etnîk hîn zêdetir dest dide.

e eşîrtî li çînîbûyînê biqeweme. Di xwezaya xwe de naxwaze têkiliyên çînî nas bike. Di cewherên eşîran de timî berxwedanek li dijî çînîbûyînê heye. Ji ber vê yekê ye, bi navê 'barbaran' timî gef li sîstemên koledar xwarine. Belavbûna çînîbûyînê bi hilberîna aborî re yekser bi hev re pêş dikevin. Çendîn keda kole bi qîmet dibe, çînîbûyîna li ser şêwazê koletiyê jî xurt dibe. Bi dewletbûyînê re ev pêvajo hînê bi lez dibe. Di bingehê xwe de dewlet, rêveberiya sîstema koledar a xwe bi rêxistinkirî ye. Tewş e, mirov cewherê wê di fikra îlahî, berjewendiyên neteweyî û ewlekariyê de bigere. Di çarçoveya vê maneyê de têkiliya di navbera dewlet û çînîbûyînê de eşkere ye.

Kengî eşîra make yan jî sereke parçe dibe, komên xwedî çand û zimanê hevpar ku em ji wan re dibêjin gel an jî 'qewm' derdikevin holê. Wexta em dibêjin gel an jî qewm, em komên civakî yên têkiliyeke sist di navbera wan de heye û xwe dispêrin ziman û çandeke hevpar, îşaret dikin. Di vê çarçoveyê de rast e ku mirov têkiliyê di navbera enîsîte=gel=qewm de deyne. Demên pêşketî yê serdema seretayî û yek ji îfadeyên sereke yên kategorîk ên civakî yê serdema navîn teşkîl dike. Wek yekîtiya komên nijad di derketina serdema navîn de roleke bingehîn dilîzin. Nifşên Cermen Romayê, nifşên Ereb Bîzans û Sasanî, nifşên Moxol û Tirk cîhana Îslamê îstîla kirin ku ev yek ji nêz ve bi taybetiyên qewmî ve têkildar e.

Di qewman de bicihbûyîna li ser axê û jihevbûna çandan hînê bûyereke berçav e. Arîstokrasiya çîna serdest û gundîtiya serf e. Tevî ku bajarîtî di vê kategoriya giştî de cih digire, serxwebûneke qismî û kozmopolîtîzmê temsîl dike. Bajar hinekî jî ji tayên qewm û etnîsîteyan dûr maye, zêdetir têkiliyên çînî li pêş in û divê wek unîteyeke xweser were dîtin. Di feodalîzmê de çîna hakim û mehkûm ji heman etnîsîteyê ne û di navbera wan de biyanîbûn û ji hev re xerîbketin pir pêşketî ye. Di sîstema koletiyê de pir nadîdeye ku efendî-kole ji yek eşîrê bin.

Netewe û netewebûyîn bi têkiliya zêde ya qewmî re derdikeve holê. Yek ji şêweyê hebûna netewebûyînê ew e, ku ji bo bazareke hevpar a berfireh derkeve holê, ekonomiya dora wê bi bendên feodalîzmê hatine lêkirin, xira dibe. Bazara hevpar her çend kapîtalîzmê bîne bîra mirov jî, rastiyek bi kapîtalîzmê re hemcewher nîne. Sîstemên civakî yên berî û piştî kapîtalîzmê jî dikarin bibin xwedî bazarên hevpar. Bazar kategoriyeke giştî ya pêşketina civakê ye. Di nîzamên sosyalîst de jî wê hebûna xwe dewam bike xwezayî ye û wê bi kêr be. Li dora bazarên pêşketî çand û zimanê hevpar, tayên netewe pêş dikevin. Ya rastirîn, bi pêşketina çand û zimanê hevpar re bi tayê bingehîn ê neteweyê re têkilî çêdibe. Li ser vê zemînê kapîtalîzm jî dikare pêş bikeve.

taybetiyên etnîk, çînî û neteweyî tên. Kengî avahiyên mîna etnîsîte, klan û qebîle li dawiyê têne hîştin, cudahiya nijadan xwe eşkere dike û têgihîştina berjewendiyên koman pêk tê, rastî berçav dibe. Jiyana mirovan bi klanî û jê berfirehtir bi awayekî qebîleyî, demeke dirêj a demê di jiyana cureyê mirov de werdigire. Li cem komên timî gerok têgihîştina nijadê qels e. Ji bo rê li ber nijadê vebe hînê nakokî nestewiyane. Tê texmînkirin ku beriya serdema neolîtîk di serdema paleolîtîk de şêweyê jiyanê ji şêwazê klan wêdetir pêş neketiye. Ji bo qebîle bibin avahiyeke etnîk diviyabû bi tayê berjewendiyê bi hev ve bihatan girêdan li ser cihûwarekî xwe bi rêxistin bikira û xwe ji wir bihesibanda. Hilberandina hevpar û ziman, her ku diçe koman hîn nêzî hevdu dike û wan bi hev ve girê dide. Êrîşên ji der ve û rewşên mîna xelayê hewcebûn û girîngiya bi yekîtiyê eşkere dike. Rewşên di vî warî de hewcebûna bi rêveberî û parastinê zêde dike. Hiyarerşiya civakî û serdestiya cinsî nîzama bavikanî derdixe holê.

Ev pêşketin û bûyer hemû rengê nijad ê em jê re dibêjin etnîsîte zelal dike. Di nav dem û herêman de hemû destketiyên em jê re dibêjin çand cuda dibin û neçarî xweparastineke beramber û sentezan dibin. Ji ber ku nijad derdikevin pêş, di nav wan de rê li ber avabûna hiyarerşiyê vedibe. Ji vê jî etnîk an jî eşîrên federasyon ava dibin. Pêvajo bi lez ber bi konfederasyonê ve diçe û eger şertan dest bida û bi paşve çûyîn nebûya pêşketin ber bi dewletbûn û çînîbûyînê ve diçe. Di şêweyê hilberandina neolîtîk de pêvajoyên bi vî rengî bi hêsanî têne dîtin, hem jî bi rasyonalîteyeke maqûl têne texmînkirin. Ji bo pêşketin û avabûna eşîran serdema zêrîn dema neolîtîk e. Yekemîn şoreşa cotkariyê, kedîkirina heywanan û pêkhatina nîzama gundan bi nîzama eşîriyê re di zikhev de pêk tên. Nîzama bavikanî di qonaxên pêş ên vê serdemê de pêş dikeve. Gelek delîl û belgeyên xurt hene ku di destpêkê de nîzama malbat-dayikê giraniya wê heye. Pêvajoya bi malbat-dayikê dest pê dike, bi hiyarerşiyê re nîzama bavikanî digihîje dema xwe ya herî bi heybet.

Dînamîka çînîbûyînê tevî ku têkiliya xwe bi hiyarerşiyê re heye, ya esas, bi komên cihêwaz ên zumreyên eskerî pêk anîn dest pê kir. Di nav vê komê de ji têkiliyên xizim û mervantiyê zêdetir hunerên ferdî diyarker in. Kesên qabîliyetên wan yên nêçîrvantî û parastinê xurt in bi pêşengiya zilamekî xurt dicivin û di demên destpêkê de ev yek cihêwazekî nehatiye dîtin, dide û diafirîne. Hukmê bi hêzê derdikeve holê. Kombûna di bin hukmê şefê xurt de, rê li ber têkiliyên ji yên eşîriyê wêdetir vedike. Ev têkiliyên nû çînîbûyînê îfade dike. Çîn dikare ji kesên ji eşîran reviyane, kesên nebûne eşîr hînê komên piçûk an jî pîşeyî pêk tê. Eşîret jî ji ber têkiliyên xizimtiyê li dijî çînîbûyînê li ber xwe dide. Zehmet

# Li Kurdistanê Etnîsîte, Çînîbûyîn û Netewebûyîn

**Di xurtbûna malbata Kurd de bandora Zerduştiyê eşkere ye. Hînê jî ev kevneşopiyên mîna yên Zerduştiyê li cem Êzîdî û Elewiyên Kurd geş û zindî ne.**



**Abdullah Ocelan***



Dişêweyêhebûnacivakandetarîfekdi asta etnîk, çînî û neteweyî de ji bo dîtina mijarê bi awayekî yekpare girîng e. Civak di cewherê xwe de yek in. Cudabûn di şêwe û şikilgirtinê de derdikeve holê. Di serê van de

*Ramanwer û rêberê siyasî, di sala 1949an de li Orfayê - Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye, li zanîngeha Enqerê beşa zanistên siyasî wergirtiye, Damezrîner û rêberê Tevgera Azadiya Kurdistanê ji dawiya salên heftêyî yên sedsala borî de, ji sala 1999ê ve li Tirkiyê di zindanê de ye. xwediyê felsefeya "neteweya demokratîk" e ku di pirtûka xwe ya bi navê "Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk" de li pênc beşên wê weşandiye.

baweriya êzîdîtî nedihatin danpêdan, ji aliyekî din ve kurdîtiya wan, mafên wan ên çandî û neteweyî û...hwd dihatin redkirin, êdî karvedana civakî di navbera Êzîdiyan û kesên din bi yekcarê re tunebû, di encama rewşa jinavbirin, dorpêçkirin û kirêtkirinê ya li ser civaka Êzîdî sepandî bû. Lê sala 2012'an bi lidarketina şoreşa gel û pêkhateyên Bakur û Rojhilatî Sûriyeyê; ev rewş hemû hate guhertin, êdî Êzîdiyan hêz û azadiya xwe di danava vê şoreşê de dîtin, hingê tê de beşdar bûn, xwe bi rêxistin kirin û sazî û rêxistinên xwe yên çandî û civakî yên taybet damezrandin, daku bi hemwelatiyên xwe -kurdan- re û bi gelên cîran -ereb, suryan, şerkes, ermen û turkman- re beşdar bibin di damezrandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk li Bakur û Rojhilatî Sûriyeyê. Peymana civakî ya Rêveberiya Xweser tekezî li taybetiya pêkhateya êzidî kir, ku ew rêûresmên xwe yên civakî û olî bi serbestî bidin meşandin.

Divê em tekeziyê li lêkolînên kûr ên bêalî û akademîk bikin ên der barê dîrok, rabirdû û kultûra Êzîdiyan de, daku şayeseke sexbêrî ji pêşveçûna ola Êzîdî, kevinbûna wê, xweserî, kok, karvedan û têkiliyên wê bi baweriyên din re, bi taybet bi olên destpêkî yên yekxwedayî weke ibrahîmî, zeredeştî û mîtrayî re werin destnîşankirin. Di vî warî de serok û ramyar Abdullah Ocelan dibêje: "Heger kurdên Êzîdî û yên elewî ji nêz ve werin şopandin; dê bi hêsanî taybetiyên demokrasî, azadî û wekheviyê yên di çanda zeredeştî de ku bi taybet li jinên wan bi gewde dibin werin xuyandin". Tevî hemû kiryarên zordariyê yên li ser wan sepandî ne, lê aliyên girêdana wan bi xwezayê re û wêrekî û gotina rast tê de hêjayî lêkolînê ne".

Giringiya wergirtina mijara "Êzîdiyatî û êzîdiyan", ew e ku em rasteqîna vê pêkhateya ku li ser dirêjahiya sedsalên berê toşî paşguhkirin û dorpêçkirina rêbazkirî bûye eşkere bikin, hem jî em tekeziyê li resenî û kevinahiya ola Êzîdî û pê re gel, milet û baweriyên deverê bikin. Li ser vê bingehê desteya sernivîskar a kovarê xwest vê mijarê weke dosyaya hejmara nû (çardehem) bigere dest, her weha hejmar mijar û berhemên wêjeyî yên nirxdar dihewîne, bi hêviya ku cihê sûd û mifagirtineke hêja be ji xwînerên me yên birêz re.

cîhanê eger xwe nespêrin civakbûn û sirûştiyê; bêguman ew dê toşî tunebûn û belavbûnê bibin, weke ku bi serê gellek miletên deverê de hat.

Gireva qirkirinê ya dawî ya ku Êzîdî rastî wê hatin; ew di sala 2014'an de li Şengalê (bakurî rojavayê Mûsilê) bû ji aliyê rêxistina Daiş ya terorîst ve, her weha sala 2018'an li Efrînê (bakurî rojavayê Sûriyeyê) ji aliyê dewleta tirk û milîsên wê ve bû.

Li Şengalê endamên Daişê yên êrîş dibirin ser gund û navçeyên Êzîdiyan, zilam û ciwanên wan dikuştin, zarok direvandin daku mejiyên wan bişon û wan tevlî rêxistinê û kiryarên wê yên kujerî bikin û destdirêjiya cinsî li keç û jinan dikirin, ew li bazaran difirotin û weke cêriyan serederiya wan dikirin.Yên ku ji vê hovîtiyê qurtal bûbûn, karîbûn xwe bigihînin çiyayên Şengalê û berî Daiş bigihine wan jî, Tevgera Azadiya Kurdistanê ji bo parastina hemwelatiyên xwe bazda û bi hawara wan ve çû, karîbû rêyên ewle ji çiyayên Şengalê û heta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê veke, her weha bi hezaran Êzîdî baz dabû Herêma Kurdistana Îraqê.Hingê ji bo xwe biparêzin; Êzîdiyan Yekîneyên Berxwedana Şengalê ava kirin û jina Êzîdî jî di wan yekîneyan de beşdar bû, daku erda xwe û gelê xwe biparêze û tolê ji kiryarên Daişî hilîne, yên bi awakî taybet ew jin armanc girtibûn. Piştî terorîstên Daişê tune kirin û berdane wan ji erda xwe ya pîroz (Şengal), Êzîdîyan rêveberiya xweser li Şengalê ragihand. Vê yekê hişt ku ew bibin armanca dewleta tirk û doza wan ji aliyê hikûmeta Îraqî ve were redkirin.Li Efrîna ku ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wê ve sala 2018'an hate dagirkirin, Êzîdî li wir toşî koçberkirina bizorê ji gund û erdên xwe bûn, di encama şer û topbarandina Tirkiyayê, dagirker jî dageriyan wêrankirina kultûra olî û dîrokî ya Êzîdî ji Mezaran û Nîşangehan û hwd.

Êzîdiyan li Sûriyeyê zordarîyeke hevedûdanî radikêşa -weke me berê anî ziman- ji gava damezrandina dewleta Sûrî di salên bîstî ji sedsala 20'an de, ji aliyekî kiryarên wan, rêûresmên wan ên olî û şûbûna wan di belgeyên sivîlî yên fermî de li gor

afrîner (Xweda) diperestin; afrînerê gerdûn û mirovan, yê ku wî xwe bi xwe afirandiye, (Êzîd, navek ji navên Xweda ye, navê Êzîdîyan jî jê hatiye), lê ew ji aliyê qewm û olên derdorê bi gawirî û pûtperestiyê hatin tawankirin, ev jî di encama berxwedanî û redkirina wan ji wan olan re bû, vê yekê hişte ku ew têkevin ber êrîş, girevên qirkirinê û kiryarên koçberkirina bizorê, bi vî awayî hejmara wan bi berdewamî kêm dibû, hin çavkaniyên kurdî hevyaz dikin ku hejmara wan nêzî 1 milyon kes in, niha di çend deverên Mezopotamyayê (Kevana Zêrîn) de bi cih dibin, bi taybet deverên ku bi pirraniya xwe kurd in "Kurdistan".

Hewlên berdewm û programkirî hebûn ji aliyê rêjîmên hakim ve ku Êzîdîyan ji civak û reseniya wan biyanî bikin, bi angaştên ji aliyê dewleta tirk ve ku ew bi koka xwe tirk in û ji aliyê dewleta îraqî ve ku ew bi koka xwe ereb in, gihişte asta ku Îraqê ji bo vê yekê sazî û desteyên taybet damezrandin, daku pirtûkên sexte û kirêtkirî der barê dîrok û rasteqîna Êzîdiyan û ola wan danerînin, êdî bi dehan pirtûk hatin weşandin, angaşt dikin ku Êzîdî bi koka xwe ereb in û ew bi (yezîdî - yezîdîtî) navandin, angaşt dikirin ku dola wan vedigere (Yezîd kurê Mûawiye) yê umewî û ew perestina agir û şeytên dikin, bi vî awayî rê vekirin ku bi hêsanî wan bi gawirî û pûtperestîyê tawan bikin. Îcar zordariya li ser Êzîdiyên di bin hukmê rêjîmên herêmî de hevedûdanî bû; ji aliyekî bawerî, ol û taybetiya wan a çandî dihate redkirin û ji aliyê din ve netewetiya wan a kurdî dihate redkirin.Êdî dewletên ku kurd li hev parve kiribûn; siyaseta veqetandin û selixandina êzidiyan ji netewetîya wan a kurdî didan meşandin, her weha ew ji hev dûr dixistin û gelacî di navbera kurdên misilman û kurdên Êzîdî de dikirin, daku wan berdin hevûdin, di encamê de armanc bi temamî ji vê yekê ew bû ku miletê kurd ji koka wî, çanda wî û dîroka wî ya resen dûr bixin.

Tevî wan girev û êrîşên tund tevan, Êzîdiyan karîbû xwe, civaka xwe û ola xwe ji tunekirina giştî biparêzin, bi rêya ku xwe bi kultûra xwe, gerdişên xwe yên civakî û xwezaya xwe ve girtin, ev jî raza mayîna wan heta roja me ya îro ye, lê belê çi miletên

## Pêşekî

# Êzîdî û Êzîdiyatî..

## oleke yekxwedayî û pêkhateyeke resen e

Desteya sernivîskariyê

Devera Rojhilata Navîn û bi taybet Kevana Zêrîn (navbera çemên Dîcle û Feratê) tabloyeke rengîn ji milet, netewe, ol, ayîn û baweriyan saz dike, ku ew bingeha avabûna şaristaniyên destpêkê yên mirovahîyê bûn. Yek ji wan "Ola Êzîdî" ye, ku ji kevintirîn olên yekxwedayî li cîhanê ye û heta niha hê jî zindî maye, tevî hemû girevên kirêtkirinê û qirkirinên rêbazkirî yên ku toşî wan bû.

Êzîdî parçeyeke sereke û resen ji miletê kurd tê dîtin, di maweyên dîrokî yên berê de; gelek êl û malbatên kurd -hin ji wan Êzîdî bûn- rastî helandin û bişaftina di nav miletên din de bûn, yan jî guherîn olên din. Tevî ku Êzîdî yekxwedayî bûn û Xwedayê

- **Jin û çand**
- Jinên Êzîdî.. hêmaneke girîng in di vejandina çanda xwe ya resen de.. (Şînda Ekrem)..... 61
- Şengal; Birîna ku nayê pêçandin.. (Hêvîdar Xalid)..... 67
- Rol û mîsyona jinê ya di qada wêjeyê de.. (Roza Metîna)..... 70

- **Pirtûkên Derketî**
- Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê) ..... 73

- **Çîrok**
- Navê min Hovanês e.. (Salihê Heydo) ..... 77
- Gulfiroş.. (Merwan Berekat) ..... 80
- KÊL.. (Abbas Abbas) ..... 87
- Verger.. (Vejîna Kurd) ..... 89
- Xemrevîna min.. (Mufîde Koto) ..... 93

- **Helbest**
- Welat.. (Ednan Dogan) ..... 95
- Bihar Hatiye.. (Karîna Osêyan) ..... 97
- Xîret.. (Ednan Îbrahîm) ..... 98
- Axîna Axînê.. (Rûken Hisên) ..... 101
- Dara Evînê.. (Ofê Reşîd) ..... 102
- Lehiya Işqê.. (Aras Qasim) ..... 103

- **Serbest**
- Sê Gundên Êzîdiyan li Cizîrê (Otelce_ Ala Reş_ Şekeriyê).. (Şerîf Mihemed)..... 105

# Naveroka Beşa Kurdî


- **Pêşekî**
  - Êzîdî û Êzîdiyatî.. oleke yekxwedayî û pêkhateyeke resen e.. (Desteya Sernivîskarîyê) ..... 5

- **Analîzên hizrî**
  - Li Kurdistanê Etnîsîte, Çînîbûyîn û Netewebûyîn.. (Abdullah Ocelan) ..... 9

- **Dosyaya Hejmarê**
  - Êzîdiyatî.. (Menan Cafer)..... 19
  - Ol û Wêje.. (Beşîrê Mele Newaf)..... 22
  - Êzîdiyên Sûriyeyê û Guhertinên Siyasî (Fawaz Ayo)..... 28
  - Qewlê Çarşemê.. (Komkirin: Şemo Qasim Dinanî, Tîpguhêzî: Nesîm Şemo û Rojda Silo)..... 32

- **Lêkolîn**
  - Melayê Cizîrî û Pênaseya Evînê -1-.. (Diyar Bohtî) ..... 38
  - Dengên Zimanê Kurdî (Kurmancî) di Proseyên Dengsaziyê de... (Berzo Mehmûd) ..... 47

- **Hevpeyvîna Hejmarê**
  - Li Gel Nivîskar Silêman Cafer e (Aram Hesen) ..... 54

## Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.

-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.

-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.

-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.

-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin: Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.

-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên giştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

# Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

# Şermola

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Demsalî ye Hejmar: 14 Buhara 2022

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Demsalî û Serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.

-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.

-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn, girtîye.

---

Rêveber û Sernivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv

- Navenda kovarê:
Qamişlo, Taxa Xerbî, beramberî Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê.

-Malpera kovarê:
www.shermola.net

-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com

-Telefon û whatsappa Sernivîskarê giştî:
00963-994712053

---

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.

-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.

-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.

- Nirxê kovarê (3000 L.S).

Wêneya- Sebah Semîr Cozêl

# Şermola

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Demsalî ye Hejmar: 14 Buharа 2022

# Êzîdî û Êzîdiyatî

*Hevpeyvîna Hejmarê Li Gel Nivîskar Silêman Cafer e
*Melayê Cizîrî û Pênaseya Evînê *Ol û Wêje
*Dengên Zimanê Kurdî(Kurmancî) di Proseyên Dengsaziyê de
*Jinên Êzdî.. hêmaneke girîng in di vejandina çanda xwe ya resen de

Wêneya Qapê - Sebah Semir Cozêl